



K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

FONEMÊN KURDÎ YÊN KURDZAN Û GEROKÊN EWRÛPÎ Û AMERÎKÎ (1787-1887)

Raif YAMAN

12711003

Şêwirmend

Mustafa Aslan

Mêrdin 2016

K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**FONEMÊN KURDÎ YÊN KURDZAN Û
GEROKÊN EWRÛPÎ Û AMERÎKÎ (1787-1887)**

Raif YAMAN

12711003

Şêwirmend

Mustafa Aslan

Mêrdin 2016

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**AVRUPALI VE AMERİKALI KÜRDOLOG VE
SEYYAHLARIN KÜRTÇE FONEMLERİ
(1787-1887)**

Raif Yaman

12711003

Danışman

Mustafa Aslan

Mardin - 2016

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Avrupalı ve Amerikalı Kürdolog ve Seyyahların Kürtçe Fonemleri (1787-1887)” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin 3 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

23/12/2016

Raif YAMAN

KABUL VE ONAY

Raif Yaman tarafından hazırlanan Avrupalı ve Amerikalı Kürdolog ve Seyyahların Kürtçe Fonemleri (1787-1887) adındaki çalışma, 23.12.2016 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

PÊŞGOTIN

Kurdzanî sala 1787an bi weşandina *Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda* (Gramer û vajnameya zimanê kurdan) ya Maurizio Garzoni, li Romayê dest pê dike. Kurdzan, kesên bi pîvanên îlmî yên dema xwe, li ser ziman, edebiyat, kultur, folklor, tarîx, dîn, muzîk, coğrafya, rêzanî û warên din ên îlmên sosyal ên li ser kurdan û welatê wan xebitîne û xwedî berhem in. Ji van kesan hinek rojhilatzan in, hinek mîsyonerên dînê xirîstiyaniyê ne, hinek zanyar in, wate ne rojhilatzan ne jî mîsyoner in. Hinek zimanzan û filologên ziman û edebiyatên welatên xwe yan jî welatên lê ne. Hinekên van rêzan, dîplomat an jî fermanarên leşkerî ne. Aliyê wan ê hempar ev e: ev meriv hemî rojavayî (ewrûpî û amerîkî) ne û bi pîvanên filolojiya dema xwe di warê kurdzaniyê de xwedî berhem in.

Di warê nivîsandina fonemên kurdî de, kurdzan di nav xwe de dibin du par:

Yek: kurdzanên bi temamî yan jî bi giranî li ser etîmolojiya peyvên kurdî xebitîne. Van kurdzan peyvên kurdzanên berî xwe bêyî ku li ser nivîsîna wan guherîneke fonemîk pêk bînin girtine berhemên xwe û li ser wan karên xwe yên etîmolojîk kirine. Meriv dikare gotara Emil Rödiger (1801-1874) û August Friedrich Pott (1802-1887) a bi navê *Kurdische Studien. I. Allgemeine Ansicht der Kurdischen Sprache, Statistik und Litterature. II. Lautlehre* û berhemên Ferdinand Justi (1837-1907), *Über die Kurdische Spiranten, Les noms d'animaux en kurde* û *Kurdische Grammatik* di çarçova xebatên etîmolojîyê de helbisengîne. Çimkî van kesan di berhemên xwe yên li ser kurdî de bi giranî bala xwe dane ser etîmolojiya kurdî¹. Ji ber ku di nivîsandina kurdî de guherînek fonemîk pêk neanîne me berhemên etîmologên sedsala pêşîn a kurdzaniyê di çarçova vê xebatê de helnesegandin.

Du: kurdzanên li ser gramer, leksîkografî (lexicographie), edebiyat, folklor û muzîka kurdan xebitîne, di berhemên xwe de cih dane tekstên bi zimanê kurdî û li

¹Ji bo zanîneke berfirehtir bn. E. Rödiger und A.F. Pott, "Kurdische Studien. I. Allgemeine Ansicht der kurdischen Sprache, Statistik und Litterature. II. Lautlehre", *Zeitschrift für die Kunde des Morgenlandes herausgegeben*, Dritter Band, Göttingen 1840, pp. 1-25. Ferdinand Justi, *Über die Kurdische Spiranten*, Marburg 1873; Ferdinand Justi, "Les Noms d'Animaux en Kurde", *Revue de Linguistique et de Philologie Comparée*, Tome: 11, Paris 1878, pp. 1-32; Ferdinand Justi, *Kurdische Grammatik*, St. Petersburg 1880.

gor pîvanên zanîna zimanzanî û filolojiya dema xwe ji bo bi hemî dengên sereke yê kurdî, heta bi tonên van dengên jî binivîsin ji kurdî re alfabeyên xwedî fonemên pêwîst amade kirine, û bi van foneman xwastine tekstên kurdî yê bi ebceda kurdî an jî ebceda farisî ya bi herfên ereban hatine nivîsandin jî ji nivîsa wan a resen çêtir bi fonolojiya kurdî ji nû ve binivîsin. Sedsala pêşîn a kurdzaniyê, ji 1787an heta 1887an, yanzdeh filologên ewrûpî û amerîkî yê sereke yê bala xwe dane ser fonolojiya (phonologie) kurdî ev in: Maurizio Garzoni, Peter Simon Pallas, Giuseppe Campanile, Îlya Nikolayevîç Berezîn, Peter Lerch, Aleksander Borejko Chodzko, Alexandre Auguste Jaba, Samuel A. Rhea, Albert Houtum-Schindler, Eugen Prym, Albert Socin.

Ji xeynî kurdzan hinek gerokan jî di gernamên xwe de cih dane vajname û tekstek an jî çend tekstên kurdî. Bi giranî ev tekstên gerokan helbest an jî stranên ji folklorê kurdan in. Di warê nivîsandina bi zimanê kurdî de ferqa kurdzan û gerokan ev e: kurdzan her dem xwastine bi kurdî rasttir binivîsin, gelek dengên kurdî di nivîs û transkrîpsiyonên xwe de nîşan bidin û ji bo bigihên vê armanca xwe jî tenê bi fonemên zimanê xwe yê maderî qîma xwe neanîne, fonemên nû peyda kirine. Piraniya gerokan bi fonemên zimanê xwe yê maderî peyv, cumle, nav û têgihên din ên kurdî nivîsîne. Ji gerokên wê demê Claudius James Rich, Austen Henry Layard û Moritz Wagner ji bo nivîsên xwe yê bi kurdî çend fonem li fonemên zimanê xwe yê maderî zêde kirine.

Gerokên rojavayî yê li ser kurdan û warê wan nivîsîne di awayê nivîsandina kurdî de di nav xwe de dibin du par:

Yek: gerokên ku bê navên coxrafî, navên kesan û çend navên hebûnên din di gernamên xwe de cih nedane peyvên zimanê kurdî. Di gernamên van de meriv rastî vajname an jî tekstekî kurdî nayê. Ji ber vê yekê berhemên van kesan di warê fonolojiya kurdî de, di çarçova vê xebatê de xwedî hêjahiya li ser lêgerînê û lêkolînê ninin.

Du: Gerokên rojavayî yê ji 1787an heta 1887an di gernamên xwe de behsa folklor, dîn, tarîx, ziman û welatê kurdan kirine. Gernamên van xwedî vajnameyên bi kurdî û zimanên wan ên maderî, vajnameyên pirzimanî yan jî hevok û tekstên bi kurdî ne. Ji van hinekan berhemek folklorîk a kurdan ji nav gel danehev; ev berhem bi kurdî nivîsîne û tercûmeyî zimanê xwe kirine. Di çarçova vê xebatê de fonemên

wan ên pê bi kurdî nivîsîne hatine helsegandin. Aliyê van gerokan ê hempar ew e ku bi temamî yan jî bi giranî peyv, hevok û tekstên bi kurdî yê di kitêb û gotarên xwe de bi fonemên zimanên xwe yê maderî nivîsîne. Gerokên sereke yê sedsala pêşîn a kurdzaniyê ev in: Johann Anton Gùldenstàdt, Julius Heinrich Klaproth, Claudius James Rich, Karl Heinrich Emil Ludwig Koch, Austin Henry Layard, Moritz Wagner.

Raif YAMAN

Mêrdîn 2016

KURTE

Di vê xebatê de em fonemên kurdî yê filologên (kurdzanên) ewrûpî û amerîkî yê sedsala pêşîn a kurdzaniyê (ji 1787an heta 1887an Maurizio Garzoni, Peter Simon Pallas, Giuseppe Campanile, Îlya Nîkolayevîç Berezîn), Peter Lerch, Aleksander Borejko Chodzko, Alexandre Auguste Jaba, Samuel A. Rhea, Albert Houtum-Schindler, Eugen Prym, Albert Socin dibînin. Ji bo peyv û hevokên kurdî yê di kitêb û gotarên xwe de rast binivîsin alfabeya roman û krîl li kurdî anîne. Hinekên van bi herfên roman li ser bingeha ebceda farisî nivîsîne. Hinekên van herfên roman ên xwedî hêjahiya fonetîk a herfên ebceda kurdî bijartine. Paşê em gerokên ewrûpî û amerîkî yê heman sedsalê û di derbarê nivîsandina bi fonemên xwe yê kurdî de ferqa wan a ji filologan dibînin: wan bi piranî bi fonemên zimanên xwe yê maderî bi kurdî nivîsîne; pir kêma ji bo nivîsandina kurdî fonem peyda kirine. Gerokên sereke yê vê sedsalê yê ku di gernamên xwe de bi kurdî jî nivîsîne ev in: Johann Anton Gùldenstädt, Julius Heinrich Klaproth, Claudius James Rich, Karl Heinrich Emil Ludwig Koch, Austin Henry Layard û Moritz Wagner. Di encamê de em analîzên berfireh ên di derbarê fonemên kurdî yê van filolog û gerokên jorîn de dikin.

Peyvên Sereke:

Kurdî, Kurdzan, Gerok, Alfabe, Fonem, Dengdar, Dengder

ABSTRACT

In this thesis we study you will find the main European and American philologists (kurdologists) who had written in Kurdish language and its dialects using a lot of different letters of Roman, Cyrillic and linguistic alphabets in the first century of kurdology, from 1787 to 1887. These philologists were Maurizio Garzoni, Peter Simon Pallas, Giuseppe Campanile, Ilya Nikolaevich Berezin, Peter Lerch, Aleksander Borejko Chodzko, Alexandre Auguste Jaba, Samuel A. Rhea, Albert Houtum-Schindler, Eugen Prym, Albert Socin. They had created several special phonemes to write Kurdish voices. They had adapted Roman alphabet, Cyrillic alphabet and linguistic alphabet (standard phonetic alphabet) to write Kurdish words and sentences in their books or articles. Some of them had used an alphabet of transcription based on Perso-Arabic abjad. Some of them had preferred an alphabet of transcription based on Kurdo-Arabic abjad. Then we study the European and American travellers of the same century, from 1787 to 1887, and their main difference from European and American philologists about writing Kurdish phonemes: they had usually written their Kurdish words or sentences using their mother tongues' phonemes; they had rarely created some phonemes to write in Kurdish. These travellers were Johann Anton Gldenstdt, Julius Heinrich Klaproth, Claudius James Rich, Karl Heinrich Emil Ludwig Koch, Austin Henry Layard and Moritz Wagner. In conclusion we make detailed analyses about the mentioned philologists and travellers' Kurdish phonemes.

Key words

Kurdish, Kurdologist, Traveller, Alphabet, Phoneme, Consonant, Vowel

NAVEROK

Rûpel

PÊŞGOTIN	I
KURTE	VI
ABSTRACT	VII
NAVEROK	VIII
LÎSTEYA TABLOYAN	X
LÎSTEYA NÎŞANÊN DENGÊN KURDÎ	XI
PEYVÊN KURT	XV
DESTPÊK	1
BEŞ YEK	15
FONEMÊN KURDZANAN	15
1. FONEMÊN KURDZANÊN EWRÛPÎ Û AMERÎKÎ	15
1.1. FONEMÊN KURDÎ YÊN MAURIZIO GARZONI	15
1.2. FONEMÊN KURDÎ YÊN PETER SIMON PALLAS	23
1.3. FONEMÊN KURDÎ YÊN GIUSSEPPE CAMPANILE	31
1.4. FONEMÊN KURDÎ YÊN ÎLYA NÎKOLAYEVÎÇ BEREZÎN	35
1.5. FONEMÊN KURDÎ YÊN PETER LERCH	38
1.6. FONEMÊN KURDÎ YÊN ALEXANDER BOREJKO CHODZKO	48
1.7. FONEMÊN KURDÎ YÊN ALEXANDRE AUGUSTE JABA	54
1.8. FONEMÊN KURDÎ YÊN SAMUEL AUDLEY RHEA	61
1.9. FONEMÊN KURDÎ YÊN ALBERT HOUTUM-SCHINDLER	65
1.10. FONEMÊN KURDÎ YÊN EUGEN PRYM Û ALBERT SOCIN	67
BEŞ DU	74
FONEMÊN GEROKAN	74
2. FONEMÊN GEROKÊN EWRÛPÎ Û AMERÎKÎ	74

2.1. FONEMÊN KURDÎ YÊN J. ANTON GULDENSTADT	74
2.2. FONEMÊN KURDÎ YÊN J. HEINRICH KLAPROTH	76
2.3. FONEMÊN KURDÎ YÊN C. JAMES RICH	77
2.4. FONEMÊN KURDÎ YÊN KARL KOCH	78
2.5. FONEMÊN KURDÎ YÊN A. HENRY LAYARD	79
2.6. FONEMÊN KURDÎ YÊN MORITZ WAGNER	80
ENCAM	82
ÇAVKANÎ	88
PÊVEK	93

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1 Bi Maurizio Garzoni Fonemên Kurdî.....	22
Tablo 2 Nimûnên Fonemên bi Nîşana Telafûza Hişk.....	24
Tablo 3 Nimûnên Fonemên bi Nîşana Telafûza Nerm.....	25
Tablo 4 Peyvên bi Fonemên Şaş Hatine Nivîsandin.....	26
Tablo 5 Peyvên Farisî û Kurdî yên di Dewsa Hev de Hatine Nivîsandin.....	28
Tablo 6 Translîterasyon, Transkrîpsiyon û Tercûma Çend Peyvên Rûsî-Kurdî.....	29
Tablo 7 Bi Peter Simon Pallas Fonemên Kurdî.....	30
Tablo 8 Bi Giuseppe Campanile Fonemên Kurdî.....	34
Tablo 9 Bi Îlya Nîkolayevîç Berezîn Fonemên Kurdî.....	37
Tablo 10 Bi Peter Lerch Fonemên Kurdî.....	47
Tablo 11 Bi Alexander Chodzko Fonemên Kurdî.....	53
Tablo 12 Bi Alexandre Jaba Fonemên Kurdî.....	60
Tablo 13 Bi Samuel A. Rhea Fonemên Kurdî.....	64
Tablo 14 Bi Albert Houtum-Schindler Fonemên Kurdî.....	66
Tablo 15 Bi Eugen Prym û Albert Socin Fonemên Kurdî.....	73
Tablo 16 Nimûnên Fonemên Johann Anton Gûldenstädt.....	75
Tablo 17 Bi Almanî, Farisî, Kurdî, Kazaxî Çend Peyvên Gûldenstädt.....	75
Tablo 18 Nimûnên Peyvên Gûldenstädt Rast Tercûmeyî Kurdî nekirine.....	76
Tablo 19 Nimûnên Fonemên Julius Heinrich Klaproth.....	76
Tablo 20 Nimûnên Fonemên Claudius James Rich.....	77
Tablo 21 Çend peyvên ji Vajnameya Gernama Rich.....	78
Tablo 22 Nimûnên Fonemên Karl Heinrich Emil Ludwig Koch.....	78
Tablo 23 Nimûnên Fonemên Moritz Wagner.....	80

LÎSTA FONEMÊN KURDÎ BI NÎŞANÊN ALFABEYA FONETÎK A NAVNETEWÎ

Dengder

Dengderên kurt

/a/ : mîna a ya bang, bask, cam, dak tê xwendin.

/ε/ : mîna e ya deng, em, ev, ez tê xwendin.

/i/ : mîna î ya îsot, havîn, kûvî, nîsk tê xwendin.

/o/ : mîna o ya gog, kejo, pepo, şekrok tê xwendin.

/u/ : mîna û ya mûmdank, parzûn, şêlû, rû tê xwendin.

/ø/ : mîna i ya dist, sisê, kin, rind tê xwendin.

/ɪ/ : mîna ê ya êdî, êsta, êş, êzing

/θ/ : mîna u ya du, gund, kund, tu tê xwendin

/ʎ/ : li Hekariyê di şûna dengê /u/ de ev deng heye: mîna u ya *usine* a fransizî û ü ya *über* a almanî tê xwendin.

Dengderên dirêj

/ɑ:/ : mîna a ya dar, havîn, mar, zanîn tê xwendin.

/ε:/ : mîna e ya bend, dem, gel, zer tê xwendin.

/i:/ : mîna î ya bîr, dîn, şîr, tîn tê xwehdin.

/o:/ : mîna o ya bost, don, ko, sor tê xwendin.

/u:/ : mîna û ya bûn, dûr, kûr, nû tê xwendin.

/ʎ:/ : mîna u ya *une* a fransizî tê xwendin, li Hekariyê ev deng şûna dengê /u:/ digire.

Dengdar

Lêvî

/b/ : mîna b ya baz, bend, bîr, bûn tê xwendin.

/m/ : mîna m ya mar, meş, mî, morî tê xwendin.

/p/ : mîna p ya paş, pênc, ponijîn, pûng tê xwendin.

/p^ʔ/ : mîna p ya part, pencere, por, pûk tê xwendin.

/w/ : mîna w ya war, we, wê, wî tê xwendin.

Lêvîdanî

/f/ : mîna f ya far, fetilîn, firotin, fîstan tê xwendin.

/v/ : mîna v ya vala, vekirin, vê, vira tê xwendin.

Didanî

/d/ : mîna d ya dayîk, dew, dêw, didan tê xwendin.

/d^ʕ/ : ev deng di kurdî de tune, di erebî de bi herfa ض tê nivîsandin.

/dʒ/ : mîna c ya can, ceng, cot, cûtin tê xwendin.

/ʒ/ : mîna j ya jan, jenîn, jin, jor tê xwendin

/l/ : mîna l ya alî, kal, belek, xelek tê xwendin

/l̥/ : mîna l ya law, lez, lîs, lor tê xwendin.

/n/ : mîna n ya na, ne, nêzîk, nîsk tê xwendin.

/ŋ/ : mîna ng ya deng, mang, reng, teng tê xwendin.

/r/ : mîna r ya baran, derî, goranî, sor tê xwendin.

/r̥/ : mîna r ya raman, rez, roj, rûn tê xwendin.

/s/ : mîna s ya sar, ser, sor, sûr tê xwendin.

/θ/ : mîna s ya hejmarên sê, sî, sed tê xwendin; di kirmanckiya dêrsimê de pir caran

cihê dengê /ʃ/ digirî: mîna s ya sekir, sivan, sima, ez sona tê xwendin.

/sˤ/ : ev deng di kurdî de tune, di erebî de bi herfa ص tê nivîsandin.

/ʃ/ : mîna ş ya şal, şeh, şîr, şûştin tê xwendin.

/t/ : mîna t ya tarî, tenik, tîrêj, tûj tê xwendin.

/tˤ/ : mîna t ya tî, teşt, tore, tûm tê xwendin.

/z/ : mîna z ya zaza, zengîn, zêr, zîrek tê xwendin.

/ð/ : mîna z ya zerdelî, zerîf, zirav, zîz tê xwendin.

/zˤ/ : ev deng di kurdî de tune, di erebî de bi herfa ظ tê nivîsandin.

Qirikî

/g/ : mîna g ya gavan, gelî, gir, gog tê xwendin.

/k/ : mîna k ya kadîn, kelem, kon, kurt tê xwendin.

/kˤ/ : mîna k ya kanê, kes, kînga, kom tê xwendin.

/q/ : mîna q ya qantir, qelem, qunc, qût tê xwendin.

/x/ : mîna x ya xanî, xet, xox, xunav tê xwendin.

/xw/ : mîna xwe ya xwarzê, xweş, xwê, xwî tê xwendin.

/ʁ/ : mîna x ya axa, mexel, tax, xar tê xwendin.

Fokal

/h/ : mîna h ya havîn, heval, hêk, huner tê xwendin.

/ħ/ : mîna h ya hecî, heram, helal, hût tê xwendin.

/ħˤ/ : ev deng di kurdî de tune, di erebî de bi herfa ح tê nivîsandin.

/ʔ/ : mîna h ya çehv, jehr, mehr, tehl tê xwendin.

/ʔˤ/ : mîna a ya alem, e ya erd, î ya îlm, u ya urîn tê xwendin.

Palatal

/ts/ : mîna ç ya çav, çem, çinîn, çiya tê xwendin; di kirmanckiya dêrsimê de bi dîftongî wekî ts /tθ/ ya tsiko, tsay tê xwendin.

/tʃ/ : mîna ç ya çar, çend, çortan, çûyîn tê xwendin.

/j/ : mîna y ya yanzdeh, yar, yek, yom tê xwendin.

Pozî

/m/ : mîna m ya gum, kom, rom, tûm tê xwendin.

/n/ : mîna n ya baran, can, ken, didan tê xwendin.

/ŋ/ : mîna ng ya deng, kereng, ning, sîng tê xwendin.

Dîftong

/ɑj/ : mîna ay û ah a axayo, dayê, sayî, şahî, tayê, wayê tê xwendin.

/ɛj/ : mîna ey û eh bereyê, ewlehî, şehê por, keyê gund tê xwendin.

/ij/ : mîna iy a diyar, jiyan, hatiye, rindiyê, siyî tê xwendin.

/oj/ : mîna oy a goya, koyî, doyîn, toyê tê xwendin

/uj/ : mîna ûy a dûyî, rûyê, mûyîn, tûyîn tê xwendin.

/ɤj/ : mîna ûy a dûyî, rûyê, tûyê, mûyîn, tûyîn a Hekariyan tê xwendin.

/ɑw/ : mîna aw û ah a axawo, dahol, mawo, sawûn, şawo tê xwendin.

/ɛw/ : mîna ew a ew, kew, dew, newq, stewr tê xwendin.

/iw/ : mîna îw a dîw, gîw, kîwî, şîw, û dema li pey herfa î herfa û were mîna *sî û yek* tê xwendin.

/ow/ : mîna ow a gowar, kowan, şow tê xwendin.

/Iw/ : mîna êw a dêw, mêw, sêwî; dem ali pey herfa ê herfa û were mîna *rê û rêwanî* tê xwendin.

/øw/ : mîna uw û uh a çuwar, duwem, guhar, buha, suwar tê xwendin.

PEYVÊN KURT

AFN	Alfabeya Fonetîk a Navnetewî
alf.	Alfabe
bn.	Binihêrin
dîft.	Dîftong
dîg.	dîgraf
Far.	Farisî
hd.	Hinekên din ên wisan
Ku.	Kurdî
No	Nimro
rp.	Rûpel
Terc.	Tercûme
Transkrîp.	Transkrîpsiyon
Translît.	Translîterasyon
Trîg.	Trîgraf

DESTPÊK

Fonem gotineke fransizî ya zimanzaniyê ye. Ji dengên ku bi kêrî ji hev û din derxistina peyvan tên re *fonem* tê gotin. (Grevisse, 1993: 28) Bi gotinek din fonem parçê herî piçûk ê peyvê yê xwedî deng e. Fonem herî kêr ji grafekê pêk tê. Nimûne, di peyva *berf* de çar fonem hene: b, e, r, f. Fonemên zimanên bi alfabeyên fonetîk tên nivîsandin bi piranî her yek ji herfekê pêk tî. Ji fonema ji du herfan pêk tê re dîgraf tê gotin, wate xwedî du grafan e. Nimûne *sc* ya Maurizio Garzoni fonemek dîgraf e, pê dengê /ʃ/ hatiye nivîsandin. Fonema *tch* ya Alexandre Jaba pê dengê /tʃ/ nivîsiye fonemek trîgraf (sêgraf) e. Fonema *tsch* ya E. Bérésine pê dengê /tʃ/ nivîsiye fonemek katrîgraf (çargraf). Herçiqas di van nimûnên me de her grafek bi herfekê hatibe nivîsîn jî, ev nayê wê manê ku graf her dem ji herfan pêk tê. Yekcaran grafên foneman dikarin ji nîşanên din ên nivîsê jî pêk bên. Nimûne, Albert Houtum-Schindler bi fonema ' dengê /ʔ/ nivîsiye. Di nav fonemên kurdzanên sedsala pêşîn a kurdzaniyê de bi qasî fonemên ji herfan pêk tî nebe jî yek caran em rastî fonemên wisan jî tî.

FONEMÊN KURDAN PÊ NIVÎSÎNE

Fîlolog û zimanzan ji sala 856an bi vir de li ser fonemên kurdî dixebitin. Ehmed îbn Ebûbekir îbn Wehşiyê el Nebatî el Keldanî, Baba Tahirê Hemedanî, Paul Anastase-Marie de Saint Elie, Xelîl Xeyalî, Hakob Xazaryan (Lazo), Erebe Şemo, I. Marogulov, Celadet Alî Bedirxan, Heciyê Cindî û Îbrahîm Emîn Baldar di warê fonemên kurdî yê kurdan pê nivîsîne de kesên sereke ne. Kurdan bi fonemên van kesan tesbît kirine, deşîfre kirine, pê dest bi edebiyata kurdî ya nivîskî kirine, peyda kirine, çêkirine, li kurdî anîne, li gor şert û mercên cihêreng demeke kurt yan jî dirêj bi zar û zimanê kurdî nivîsîne. Bi fonemên kurdî yê her sê kesên dawîn, C. A. Bedirxan, H. Cindî û Î. E. Baldar, nivîsandin û xwendina kurdî berdewam e. Niha embi kurdî taybetiyên bingehîn û hejmeta fonemên kurdî yê kurdan ji 856an bi vir de pê nivîsîne ji nêzîk ve nas bikin.

Ehmed îbn Ebûbekir îbn Wehşîye el Nebatî el Keldanî di kitêba xwe ya bi navê *Şewq-ul Musteham fî M'erîfetî Rumûz el-Eqlam* de 37 fonemên kurdî tesbît kirine. Ev ebced¹ bi navê ebceda keyên² kurdan bi nav kiriye. Îbnî Wehşîye karibûye ji van 37 foneman tenê hêjahiya (value) fonetîk a 30î bi fonemên zimanê erebî û farisî nîşan bide. Îbnî Wehşîye du kitêbên bi vê ebcedê hatine nivîsandin li Şamê ji kurdî tercûmeyî erebî kirine. (Îbnî Wehşîye, 856: 134) Bi qasî ku em dizanin ji xeynî Îbnî Wehşîye kesî tekstekî kurdî yan jî zimanekî din ê bi vê ebcedê hatibe nivîsandin heta niha nedîtiye.

Baba Tahirê Hemedanî kesê pêşîn e ku bi ebceda farisî ya bi herfên ereban bi kurdî û farisî helbest nivîsîne. Meriv dikare bibêje ku edebiyata nivîskî ya kurdî bi helbestên Baba Tahir dest pê dike. Helbestvanên kurdan heta derketina helbesta kurmancî, bi herfên ebceda farisî bi kurdî nivîsîne. Di ebceda farisî de li ser hev 32 herf hene.

Di zimanê farisî de fonema /w/ tune, ji ber vê yekê bi ebceda farisî nivîsandina vê fonemê ne mimkûn bû. Helbestvanên kurmanç ji bo dengê /v/ û /w/ ji hev cihê binivîsin fonema ف li ebceda farisî zêde kirine û bi vî awayî ebceda kurdî ya bi herfên ereban (ji niha pê ve ebceda kurdî) ji ya farisî cihê kirine. Hinek kurdên êzidî ne tê de helbestvanên kurmanç û kirmancan ji Eliyê Herîrî bi vir de heta çaryeka pêşîn a sedsala bîstan tenê bi ebceda kurdî nivîsîne. Di vê ebceda kurdî de 34 fonem hene. Meriv dikare bibêje ku kurdan di tarîxa xwe de bi sedsalan bi awayekî bi pergal bi ebceda kurdî nivîsîne û xwendine.

Xelîl Xeyalî kitêba xwe ya bi navê *Elîfbayê Kurmancî* sala 1909an li Stenbolê nivîsiye û weşandiye. Bi qasî ku tê zanîn, kesê cara pêşîn fonemên ebceda kurdî bi kitêbekê pêşkêşî mamoste û xwendekarên kurdan kirî Xelîl Xeyalî ye. Di vê kitêba Xeyalî de 34 fonem hene. Hêjayî gotinê ye nivîskar hemze û elîf wekî du herfên bi

¹ Ji alfabeyên dengdarî re ebced tê gotin. Di van alfabeyan da tenê dengdar hene, dengder tunene. (The World Writing Systems, Edited by Peter T. Daniels, William Bright, Oxford University Press, New York, Oxford, 1996, rp. 4) Me jî di vê xebatê da alfabeyên dengdar bi navê ebced û alfabeyên xwedî dengdar û dengder bi navê alfabe binavkirin.

² Medan serekên dewleta xwe gişt bi navê key bi nav kirine. Nimûne: Key Diyako, Key Kavûs, Key Xusrev, Key Kûbad. Bi baweriya me peyva *key* a îro hîna li gelek gundên kurdan di şûna peyva mixtar a ji erebî ketiye kurdî da tê gotin jî ji dema medan maye. Ji bo farisan şah, ji bo ereban melîk, ji bo îngilîzan king, ji bo latînan rey, ji bo sirban kral, ji bo rûsan çar çi be, ji bo kurdan jî key ew e.

serê xwe di lîsta herfan de nîşan nedane. Ji ber vê yekê herfa pêşîn a *Elîfbayê Kurmancî* ya Xelîl Xeyalî ne elîf e, hemz-elîf e. (Bayrak, 1994: 462-505)

Kurdên êzidî bi sed salan bi ebcetek xwedî fonemên cihê bi kurdî nivîsîne. Ev ebceta îro bi navê ebceta êzidiyan tê binavkirin kînga ji aliyê kê ve hatiye çêkirin nayê zanîn. Paul Anastase-Marie de Saint Elie sala 1911an di kovara *Anthropos* de bi weşandina gotara xwe ya bi navê *La Découverte Récente des Deux Livres Sacrés des Yézidis* ebceta êzidiyan deşîfre kiriye, hêjahiya fonetîk a fonemên wê bi herfên erebî û roman nîşan dane. Di ebceta êzidiyan de 36 fonem hene. Her du kitêbên pîroz ên êzidiyan, *Kitêbê Cilwe û Mishefê Reş*³ bi kurdiya mukrî bi vê ebcedê hatine nivîsandin. Bi Joseph Isya, R.H.W. Empton, Giuseppe Furlani û Qanadê Kurdo *Kitêbê Cilwe* di sedsala 12an de hatiye nivîsandin. Hinek helbest û qewlên êzidiyan bi fonemên vê ebcedê bi kurmancî hatine nivîsandin.⁴

Hakob Xazaryan (Lazo) sala 1921ê li ser xwestina Komîseriya Rewşenbîriya Ermenîstanê alfabeya ermenî li zimanê kurdî aniye û di kewçêra heman salê de ev alfabe di kitêba xwe ya bi navê *Şems* de li bajarê Ecmiadzînê weşandiye. Di vê alfabeya kurdî ya li ser bingeha herfên alfabeya ermeniyan de 40 herf, çar dîgraf û 6 dîftong hene.⁵ Ji 1921an heta 1929an zarên kurdên Gurcistan û Ermenîstanê li dibistanan bi 46 fonemên vê alfabeyê xwendine û nivîsîne. (Boyîk, 2012: 41-42)

Erebê Şemo û I. Marogulov sala 1929an alfabeya roman⁶ li zimanê kurdî anîne. Di vê alfabeya kurdî ya bi herfên roman de 39 fonem hene. Şemo û Marogulov di rûpelên dawîn ên kitêba xwe ya alfabeyê ya bi navê *Xə Xə Hinbuna Xəndbna Nvisara Kyrmançî*⁷ de bi alfabeya rûsî û ermenî re dane ber hev û bi vî

³ Ev her du kitêbên pîrozên êzidiyan di nav xwendeyên kurmancan da bi navê Kitêba Cilwe û Mishefa Reş tên zanîn. Lê ev binavkirin rast nîne. Çimkî ev her du kitêb bi mukrî hatine nivîsandin. Mukrî şêwezarekî zarê kurmanciya jêr (soronî) e.

⁴ Min sala 1997an li Enqerê li kitêbxana Abdullah Varli 3 qewlên êzidiyan yên bi ebceta êzidiyan dîtî. Her sê jî bi kurmancî bûn.

⁵ Ji bo zanînek berfireh binihêrin: Lazo. 1921. *Şems*, Ecmiadzin

⁶ Ji bo alfabeyên li ser bingeha herfên alfabeya roman çêbûne di zimanzaniyê da alfabeyên roman tê gotin; bi vî awayî alfabeyên bi herfên roman û alfabeya zimanê latînî ji hev tên cihê kirin. Alfabeyên ji alfabeya krîlî û alfabeya zimanê rûsî jî xwedî heman rastiye ne.

⁷ Bi alfabeya kurdî ya roman a Celadet Ali Bedîrxan navê vê kitêbê wisa tê nivîsandin: *Xwe Xwe Hînbûna Xwendina Nivîsara Kurmancî*

awayî du fonemên di ermenî û rûsî de tune ne, ne tê de, hêjahiya fonetîk a 37 foneman diyar kirine. (Marogulov û Şemo, 1929: 57, 58). I. Marogulov û R. Drambjan sala 1931ê kitêbek din a alfabeya kurdî ya bi herfên roman weşandine. Navê vê kitêbê *Ronai Kîteba Elfbaja Kyrmançi* ye. Di vê kitêbê de 38 fonem hene. (Marogulov, Drambjan, 1931: 54) Fonema \emptyset di vê kitêba alfabeyê de tune, ji aliyê nivîskaran ve hatiye derxistin. Kurdên li Yekitiya Komarên Sosyalîstên Sovyeta berê ji 1929an heta sala 1944an di dibistanan de bi fonemên vê alfabeyê nivîsîne û xwendine. Erebe Şemo romana xwe ya bi navê *Şevane Kyrmança*⁸ bi vê alfabê nivîsiye. Hêjayî gotinê ye, ev kitêba Erebe Şemo ji aliyê piraniya zimanzan û edîbên kurdan ve wekî romana pêşîn a kurdî tê qebûl kirin.

Celadet Alî Bedirxan sala 1932an alfabeya xwe ya kurdî ya bi herfên alfabeya roman di kovara *Hawar* de li Şamê weşandiye. Ev alfabe bi navê Alfabeya Hawarê jî tê binavkirin. Li ser vê alfabeyê bandora alfabeya tirkî ya bi herfên roman û alfabeya fransîzî berbiçav e. C.A. Bedirxan sebebên bandora alfabeya tirkî bi zelalî anîne zimên. Di vê alfabeyê de 32 fonem hene. Hêjahiya fonetîk a van 32 foneman bi fonemên ebceda kurdî û bi peyvên nimûne hatine diyarkirin. (Bedir-xan, 1932)

Heciyê Cindî sala 1944an li ser qedexekirina alfabeya kurdî ya bi herfên roman alfabeya krîlî li zimanê kurdî aniye. Di vê alfabeyê de 40 fonem hene. Kurdên li Yekitiya Komarên Sosyalîstên Sovyetê dijîn ji 1944an ta 1989an bi vê alfabeyê gelek kitêb û gotar nivîsîne. Piştî jihevda ketina sîstema sosyalîst a Sovyetê kurdên komarên Sovyeta berê 8 fonem li alfaba roman a Celadet Alî Bedirxan zêde kirine û pê dinivîsin.

Îbrahîm Emîn Baldar sala 1951ê bi revîzyona li ser fonemên ebceda kurdî û bi sûdwegirtina ji fonemên alfabeya kurdî ya roman a Celadet Alî Bedirxan dawî li pergala ebceda kurdî aniye û bi pîvanên alfabên xwedî dengder û dengdar li ser bingeha herfên ereban alfabeyek nû çêkiriye. Ev alfabe di kitêba xwe ya bi navê *Elfûbêy Niwê* de aniye zimên û li Bexdadê weşandiye. Ev Alfabeya kurdî ya ji aliyê Îbrahîm Emîn Baldar ve hatiye amadekirin heman salê jî aliye wezareta perwerdehiya Îraqê ve hatiye qebûl kirin. Di vê alfabeyê de 34 fonem hene. Xwendin û nivîsandina bi vê alfabeyê li başûr û rojhilatê welatê kurdan berdewam e.

⁸ Bi alfabeya kurdî ya Celadet Alî Bedirxan: Şivanê Kurmanca

KURDZANÊN LI SER FONEMÊN KURDÎ XEBITÎNE

Bi sed salan e kurdzan û gerokên ewrûpî û amerîkî bala xwe dane ser ziman, folklor û ebediyata kurdî. Pir kêma zimanzanên kurdan di xebatên xwe yên li ser alfabe û fonemên kurdî de ji xebatên van kurdzan û gerokan yekî yan jî dudiyan sûd wergirtine. Heta niha di nav kurdên bakurî de kesî xebatek fonolojîk a bi pîvanên zimanzaniyê li ser fonemên kurdî yên van kesan pêk neaniye. Ev ji bo me kêmasiyek mezin bû. Me xwest em bi vê xebatê riya nasandina fonemên kurdî yên kurdzan, zimanzan û gerokên ewrûpî û amerîkî vebikin. Ji bo em bikaribin bi berfirehî li ser vî karî bisekinin, me ev xebat bi sedsala pêşîn a kurdzaniyê (1787-1887) bi sînora kir. Kurdzan û gerokên ewrûpî û amerîkî yên di vê sedsalê de bala xwe dane ser ziman, edebiyat û folklorê kurdan kî ne? Karê wan ê eslî çi ye? Li kîjan bajarên welatên kurdan xebitîne yan jî geriyane? Li ser kurdan çi nivîsîne? Berî ku em dest bi analîz û hînbûna fonemên wan bikin me pêwîstî pê dît ku bi kurtî be jî em van 11 kurdzan û 6 gerokan bi berhemên wan ên li ser kurdan ji nêzîk ve nas bikin.

Maurizio Garzoni (1734-1804) keşîşekî mîsyonerê terîqeta domînîkan e. Basile Nikitine di gotara xwe ya bi navê “Où en est la Kurdologie?” (Kurdzaniya di kîjan astê de ye) de Maurizio Garzoni bi navê “bavê kurdzaniyê” bi nav dîke. (Nikitin, 1936) L. O. Fossum jî wî bi navê “pêşengê gramernûsiya” kurdî bi nav dîke. (Fossum, 1919: 272). Kitêba wî ya bi navê *Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda* ya ku di 1787an de li Romayê hatiye weşandin di warê gramernûsî û kurdzaniya rojavayî de berhema pêşîn e. Garzoni di vê berhema xwe de bi berfirehî li ser gramera kurdî nivîsiye. Wekî ji navê kitêbê jî tê têgihîştin kitêb ji du beşên sereke pêk tê: gramer û vajnameya kurdî. Beşa dawîn a kitêbê vajnameya îtalyanî-kurdî ye. Nivîskar nêzîkî 4600 peyvên îtalyanî û tercûma wan a kurdî di vî beşê de bi cih kirine. Heke meriv vajnameya pirzimanî ya Peter Simon Pallas û vajnameya pirzimanîya di gernama Anton Johann Gùldenstàdt de du berhemên di warê kurdzaniyê de helnesengîne *Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda* ya Maurizio Garzoni berhema pêşîn û yekane ya kurdzaniya rojavayî ya sedsala 18an e.

Peter Simon Pallas (1741-1811) naturalîst û kaşîfekî alman e. Mîna hemdemên xwe Buffon û Linné di warê zoolojî û botanîkê de bi nav û deng e. Gerên

wî yên li ser axa bê serî û bê dawî ya Împaratoriya Ūris jê re asoyên nû yên zanînên din ên wekî paleontolojî, jeolojî, etnografî û zimanzaniyê vekirine. Ji sala 1768an heta 1810an gerên wî yên zanyarî (scientific) berdewam bûne. Di vê demê de li ser hev bi qasî sed û heftê gotar nivîsîne. Ji van berhemên wî yek *Vajnameya*⁹ *Komparatîv a Zimanên Dinyayê* (Vocabulaire compérative des langues du monde) ye. Di nav 200 zimanên *Vajnameya Pallas* de kurdî di rêza 77an de ye. Peyvên vê vajnameyê bi zarê kurmancî ne. Cara pêşîn Pallas peyvên kurdî bi alfabeya krîlî nivîsîne. Bi gotinek din bi alfabeya krîlî nivîsandina kurdî bi vê berhema Pallas dest pê kiriye. Ji gelek şaşitiyê nivîsandin û tercûmekirina peyvên kurdî em têdigihên ku Pallas jî mîna kurdzanê berî xwe Maurizio Garzoni û gelekên din ên piştî xwe bi kurdî nizanibûye. Alîyekî hemparê gelek kurdzanên ewrûpî yên sedsala 18an û 19an nezaniya wan a kurdî ye. Pirraniya kurdzanên sedsala pêşîn a kurdzaniyê ji bo zimanê kurdan û zarên wî hîn bibin ewqas serê xwe pê re neêşandine.

Giuseppe Campanile (1762-1835) sala 1762an li gundê Sant Antimoyê nêzdîkî bajarê Napoliyê hatiye dinê. Dema bûye dîndarekî terîqeta domînîkan saziya Propaganda dêra katolîk a roman sala 1802an ew bi mîsyonerî şandiye Mûsilê. Keşîşekî terîqeta domînîkan a mezheba katolîk a dêra Romayê ye. Di 1809an de bi navê Serapostolê (Apostolic Prefect) Mezopotamya û Kurdistanê hatiye binavkirin. Sala 1809an nasandinek nivîskî ya li ser Kurdistanê daye General Gardan ê ku ji bo mîsyonekê vegeyariyê Persiyayê, û li ser kurdan malûmat dane konsolosê Fransê yê Bexdayê, Joseph Rousseau. Di vê demê de kitêba xwe ya bi navê *Storia della Regione del Kurdistan e delle Sette di Religione ivi Esistenti* nivîsiye. Herçiqa navê kitêba wî tarîx be jî, ji tarîxê pirtir li ser nasandina coxrafya Kurdistanê ya di berbanga sedsala 19an de, li ser jiyana dînî, aborî û sosyal a kurdistanîyên wê demê nivîsiye. Campanile evîndarekî edebiyatê ye. Ev aliyê xwe di berhevkerin, tercûme û şîrovekirina helbestî ya strana şîna cuwana kurd a dawiya kitêba xwe de daye xwiyakirin.

⁹ Me peyva vajname ji zimanê parthî girtiye û di mana *vocabulary* ya îngilîzî da nivîsiye. Di zarê kurdî yê kirmancî û zimanê parthî da *vaj* tê mana *bêj* yan jî *peyv* a kurmancî. *Vajname* bi mana xwe ya lîteral tê mana kitêba peyvan.

Îlya Nîkolayevîç Berezîn (1818-1896) bi navê xwe yê wî bi xwe li ser kitêba xwe *Recherches Sur Les Dialectes Persans* nivîsiye, E. Berésine, mamostê zimanê tirkî yê unîversîta Kazanê ye. Berezin bi xebatên xwe yên li ser filolojî û zarzaniya (dialectology) îranî, erebî, tirkî û tarîxa moxolan tê naskirin. Berezine¹⁰ li ser van ziman û zarên wan du kitêb nivîsîne: *Recherches Sur Les Dialectes Musulmans (1848)*, *Recherches Sur Les Dialectes Persans (1853)*. *Recherches Sur Les Dialectes Musulmans (1848)* li ser zarên zimanê tirkî ye. *Recherches Sur Les Dialectes Persans (1853)* li ser zimanên îranî û zarên wan e. Nivîskar li ser du zarên kurdî nivîsiye: “Zarê kurdî yê rojhilat” û “Zarê kurdî yê rojava”. Berezin gelek peyvên van zarên kurdî dane ber peyvên farisî û erebî. (Berésine, 1853: 118-158)

Peter Lerch an jî Peter von Lerch (1827-1874), kurdzan, arkeolog û rojhilatzanekî alman e. Peter Lerch pisporê zimanên rojhilatî ye. Li Împaratoriya Êris di Akademia Emperyal a Zanînan de xebitiye. Bi xebatên xwe yên li ser kurdzaniyê bi nav û deng e. Lerch sala 1857an cîldê pêşîn ê kitêba xwe ya bi navê *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaläer. Erste Abtheilung*, sala 1858an cîldê dawîn ê vê kitêba xwe li St. Petersburgê weşandiye. Kurdzanê cara pêşîn bi pîvanên akademîk ên hemdem li ser du zarên kurdî kirmancî (kirdkî, dimilî, zazakî) û kurmancî xebitiye Peter Lerch e. Di vê berhema xwe de bi berfirehî li ser deng û fonemên van her du zarên kurdî zanînen zanyarî dide. Taybetiyeke din a Peter Lerch jî ew e ku bi berhevkirinên xwe yên folklorîk ên ji nav kurdên hêsîr ên li Roslowê qîma xwe neaniye; hema hema li ser hemî berhemên kurdzan û gernamên gerokên berî xwe yên li ser kurd û Kurdistanê karekî zanyarî yê hêja pêk aniye. Nivîskar di cîldê dudiyar ê kitêba xwe de bi giranî li ser berhemên kurdzan, gernamên gerokan û dokumanên kurdî yên bi ebcada farisî û kurdî hatine nivîsandin bi berfirehî xebitiye, gelekên wan bi alfabeya zimanzanî ya R. Lepsius a wî bi xwe li kurdî aniye transkrîpsiyon kirine û tercûmeyî almanî kirine. (Lerch, 1858: 1-46) Heman kitêba xwe sala 1856an berî ku were weşandin tercûmeyî rûsî jî kiriye. Hinek tekstên sereke yên helbestavanên farisî û tercûma wan a kurdî jî di sa di cîldê 2an ê kitêba xwe de bi cih kirine. Tercûma parçeyekî ji *Gulistan* a Sa'diyê Şîrazî ji van yek e. Tercûma bi kurdî ya vî tekstî bi ebcada farisî ye. (Lerch, 1857: 98-103) Seyîdxan Kurij bi zarê

¹⁰ Navê nivîskar ê li ser vê kitêbê E. Berezine e. Di 1853an da dema kitêba xwe ya *Recherches sur les Dialectes Persans* daye weşandin navê xwe rindtir li rastnivîsa fransîzî aniye û E. Berésine nivîsiye.

kirmançî li ser xebatên zanyarî yê Peter Lerch bi navê *Xebatê Peter J. A. Lerch Derheqî Kurdolojî de* gotareke zanyarî ya berfireh nivîsiye¹¹.

Alexander Borejko Chodzko (1804-1891), dîplomat, helbestvan, folklorîst, îranolog, tirkolog û kurdzanekî polonî ye. Ji 1824an heta 1830î li St. Petersburgê li Enstîtuya Rojhilat li ser zimanên erebî, farisî û tirkî perwerde bûye. Li Persiya û Fransê tercûmanî, dîplomatî û akademîsyenî kiriye. Berhema wî ya pêşîn a li ser edet (tradition) û edebiyata folklorîk a Persiyayê, *Specimens of the Popular Poetry of Persia as Found in the Adventures and Improvisations of Kurroglu* sala 1842an li Londonê hatiye weşandin. Chodzko gelek berhemên folklorîk ên farisî, tirkî û kurdî berhev kirine û tercûme kirine. Ji 1852an heta 1883an piraniya berhemên xwe yê li ser folklor û zimanên gelên Persiyayê, û bîranînên xwe yê dema dîplomatiya xwe ya li Persiya û Fransê di kovarên fransîzî de weşandine. Alexander Chodzko Sala 1857an gotara xwe ya bi navê *Études Philologique sur la Langue Kurde (Dialecte de Soléimanié)* bi zimanê fransîzî di hejmara Avrêl-Gulan a *Journal Asiatique* de weşandiye. Chodzko di vê xebata xwe de li ser kurmançiya jêr (sorani) xebitiye. Mixabin wî jî mîna gelek kurdzanên dema xwe bi kurdî nizanibûye. Kurdiya di nivîsa wî de ji aliyê Ahmed Khanê Baban ve di ber çavan re hatiye derbaskirin û şaşitiyên wî hatine rastkirin.

Alexandre Auguste Jaba (1803-1894) an jî August Dementieviç Jaba sala 1801ê li Kraslavê hatiye dinyayê. Ji 1824an heta 1828an li unîversîta Vilenskiyê di beşa zimanên rojhilatî de xwendiyê. Li konsolosxanên ûris ên li Yafa, Selanîk û Îzmîrê xebitiye. Ji 1848an heta 1866an li Erzeromê konsolostiya Rûsyayê kiriye. Salên 1853-1856 çûye şerê Kirimê, paşê dîsan vegehiyaye Erzeromê. Li ser xwestina mudûrê muzeya Asyayê Borîs Andreyeviç Dorna dest bi hînbûna zimanê kurdî kiriye. Wê demê Mele Mehmûdê Bazîdî, Ehmed Xan û gelek zanayên kurdan nas kirine û bi wan re bûye heval. Wî gelek sûd ji van zanayên kurdan girtiye. Jaba Mele Mehmûdê Bazîdî bi navê mamostê xwe yê kurdî bi nav kiriye. Li gor ên din bi Bazîdî re pirtir û xurttir li ser folklor û edebiyata kurdan xebitiye. Sala 1859an berhevoka xwe ya ji folklorê kurdan *Ballade kurde* berhev kiriye, ji kurdî tercûmeyî fransîzî kiriye û di kovara *Journal Asiatique* de weşandiye. Sala 1860î kitêba xwe ya

¹¹ S. Kurij. (2014). “*Xebatê Peter J. A. Lerch Derheqî Kurdolojî*”, Nûbihar Akademî: 93-108

bi navê *Recueil de Notices et Récits Kourdes Servant à La Connaissance de la Langue, de La Littérature et Des Tribus du Kourdistan* li St. Petersburgê weşandiyê. Ferhengeke destnivîs a Jaba ya bi kurdî-fransizî û fransizî kurdî hîna nehatiye weşandin. Sala 1879an Jaba ferhengek kurdî-fransizî amade kiriye. Ev ferheng ji aliyê filolog, etîmolog û kurdzanê alman Ferdinand Justi ve bi hinek lêzêdekirin û jêderxistinan bi ebceda kurdî û transkrîpsiyona wê ya bi alfabeya roman hatiye weşandin. Sala 1866an dema dawî li karê wî hatiye li Îzmirê bi cih bûye û di 1894an de li wê derê miriye.

Samuel Audley Rhea (1827-1865) misyonerekî protestan ê amerîkan e. Sala 1827an li Blountville a Tennesseeyê hatiye dinê. Rhea sala 1851ê bi mîsyonerî çûye li Geverê, li gundê Memikan di nav nestûriyan de bi cih bûye. Heta avrêla 1859an, heşt salî li wê derê maye. Ji ber ku nexweş ketiye vegeyriyaye Amerîkayê. Di 1860an de dîsa vegeyriyaye warê nestûriyan. Ji ber şert û mercan vê carê li Urumiyê bi cih bûye. Li gor nivîskar hema hema nestûriyan gişkan gelekî baş bi kurdî zanibûne (Rhea, 1880) Rhea gelek baş kurdî hîn bûye û bi kurdên Geverî re her dem bi kurdî peyiviye; bi vî awayî Rhea ji kurdzanên dema xwe û berî xwe çêtir ji kurdî û kurdan têgihîştîye. Rhea dibêje, min tu carî kurdî ji karê xwe yê dînî re nekir hacet. Suryaniya modern, Tîrkiye tatarî û farisî rind zanibûye. Heta avrêla 1859an, ji heşt salan zêdetir li wê derê maye. Wê salê ji ber nexweşiya xwe ya giran vegeyriyaye welatê xwe Amerîkayê. Di cotmeha 1860î de çûye li Urmiyê bi cih bûye û di 38 saliya xwe de, sala 1865an li wir miriye¹². Tê bawerkirin ku berî Samuel A. Rhea bi temamî ji Geverê derbikeve, zivistana li çiyayê Seir ê bi ser Urmiyê re derbas kiriye va berhema xwe ya bi navê *Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District* nivîsiye. Nivîskar bi baldarî bi zarê kurmanciya jor bi şeweya Hekariyê nivîsiye. Ev berhema Rhea 15 sal piştî mirina wî ji aliyê hevalên wî yê dîndar ve di ber çavan re hatiye derbaskirin, bêyî ku esasê wê biguherînin, tiştêkî lê zêde bikin an jî kêr bikin hinek guherîn di gramerê de kirine. Gramer û vajnameya Rhea bi duayek mesihîyan a bi navê *Lord's Prayer* (Dua Xwedê) û meseleyek bi

¹² Ji bo zanîneke berfirehtir binihêrin: Dwight W. Marsh. (1869). *The Tennessean in Persia and Koordistan*, Philadelphia

navê *Parable of the Prodigal Son (Part)* (Mesela lawê destberedayî (Part) bi dawî dibe. (Rhea, 1880: 118-119, 155)

Albert Houtum-Shindler (1846-1896), li universîta Leipzigê endazyarî (engineering) xwendiyê. Sala 1884 berhema xwe ya filolojîk a di warê folklor, vajname, gramer û etîmolojiya zarên kurdî de bi navê *Beiträge zum Kurdischen Wortschatze* di kovara *Zeitschrift der Deutschen Morgenländischen Gesellschaft* da weşandiyê. Beşa vê gotarê ya tê de etîmolojiya peyvên kurdî heye ji aliyê Ferdinand Justi ve hatiye nivîsandin. Houtum-Schindler di vê xebata xwe ya zimanzanî de bi giranî li ser zarên kurdî, goranî, mukrî û kurmancî xebitiye. Nivîskar di salên 1911an de gelek gotarên akademîk ji *Encyclopaedia Britannica* re nivîsîne.

Eugen Prym (1843-1913), orientalist, profesorê erebî û zimanên aramî û kurdzanekî alman e. Albert Socin (1844-1899) orientalist û kurdzanekî swîsrî ye. Ji 1868an heta 1870yê li Rojhilat jiyaye. Eugen Prym û Albert Socin sala 1868an bi hev re çûne 18 mehan li Rojhilat geriyane. Armanca vê gera wan lêgerînên zimanzanî û zarên modern e. Li Şamê mesîhîyekî berhevokek mezin a ji edebiyata folklorîk, helbest, çîrok û stranên bi aramiya nû û kurdî dane wan. Ev berhevok bûye bingeha du kîtabên wan ên her yek ji du cîldan pêk tên. Berhemên hempar ên Eugen Prym û Albert Socin ev in:

1. Eugen Prym, Albert Socin: *Der neuaramäische Dialekte des Tûr Âbdîn*; 2 Bände, Vandenhoeck & Ruprecht, Göttingen, 1881.
2. Eugen Prym, Albert Socin: *Kurdische Sammlungen, Erzählungen und Lieder im den Dialekten des Tûr Âbdîn und von Bohtan*; 2 Bände, St. Petersburg, 1887–1890.

Der Neuaramäische Dialekt des Tûr Âbdîn li ser zarên aramiya nû, bi gotinek din li ser zarên suryaniyan e. A dudiyar berhevokek ji folklorê kurdan e: *Kurdische Sammlungen, Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tûr Âbdîn und von Bohtan* berhevokek ji folklorê kurdan e. Nivîskaran berhemên folklorîk ên kurdî ji aliyê ziman û şeweyan herêmî ve analîz kirine bi tercûma wan a almanî re weşandine. Li ser cîldê 2an ê *Kurdische Sammlungen, Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tûr Âbdîn und von Bohtan, Zweite Abteilung a. Die*

Texte navê Eugen Prym tune. Em ji vê têdigihên ev cîldê kitêbê ji aliyê Albert Socin ve hatiye amadekirin. (Socin, 1890)

GEROKÊN LI SER FONEMÊN KURDÎ XEBITÎNE

Ji 1787an heta 1887an 6 gerokên ewrûpî û amerîkî di gernamên xwe de li gel zimanê xwe yê maderî yan jî zimanê resmî yê welatê lê dijîn pir kêmbê jî bi kurdî nivîsîne. Ji van hinekan di vajnameyên gernamên xwe de cih dane peyvên kurdî, hinekan bala xwe dane ser zarên kurdî, hinekan bi tesîra folklorê kurdan li stranek yan jî li helbestek kurdî guhdarî kirine, nivîsîne û tercûmeyî zimanê xwe kirine bi vî awayî xwestine xwendevanên xwe ne tenê ji coğrafya û awayê jiyana kurdan, xwestine wan ji zar û zimanê kurdî jî haydar bikin. Me pêwîstî pê dît em van kesan jî ji nêzîk ve nas bikin. Gerokên em behsa wan dikin ev in: Johann Anton Güldenstädt, Julius Heinrich Klaproth, Claudius James Rich, Karl Heinrich Emil Ludwig Koch, Austen Henry Layard û Moritz Wagner.

Johann Anton Güldenstädt (1745-1781) di salên 1770-1773an de li Împaratoriya Ûris derketiye gereke dût û dirêj; li herêma Astraxan a Ûkranyayê, li bakurê Kafkasan, li Ossetiya, Çeçenîstan, Inguşetiya û Gurcistanê geriyaye. Piştî mirina Güldenstädt, Peter Simon Pallas gernama wî ya bi navê *Reisen durch Russland und im Caucasischen* di salên 1787 û 1791ê de bi du cîldan li St. Petersburgê weşandiye. Güldenstädt di beşa vajnameya vê gernama xwe de 228 peyvên kurdî û manên wan ên bi almanî, farisî û kazaxî nivîsîne. (Güldenstädt, 1791: 545-552) Güldenstädt bi pîranî bi fonemên almanî ev peyvên kurdî nivîsîne.

Julius Heinrich Klaproth (1783-1835), zimanzan, tarîxzan, etnograf, nivîskar, rojhilatzan û kaşîfekî alman e. Di salên ciwantiya xwe de dêhna xwe daye ser zimanên asyayî û di 1802an de li Weimarê kovara xwe ya bi navê *Asiatisches Magazin* weşandiye. Akademia Împerial a Zanînan a li St. Petersburgê ji bo keşfên etnografîk û zimanzanî ew şandîye Kafkasan. Klaproth çînî, mançûyî, moxolî, sanskrît, tirkî, erebî û zimanên kafkasî hîn bûye. Wî îspat kiriye ku uygûrî zimanekî tirkî ye. Klaproth li ser zimanê efxanî jî xebitiye û tê derxistiye ku bi farisî, kurdî û

sanskrit re tēkiliya wî heye¹³. Li gor Peter Lerch radigihîne di kitêba wî ya bi navê *Kurdisches Wörterverzeichnis, mit dem Persischen und K.F. Andern ver Wandten Sprachen Verglichen Fundgruben Des Orients, Bd. IV* da 280 peyvên kurdî hene. (Lerch, 1858: 21-22) Klaproth ev peyvên kurdî bi giranî bi fonemên almanî nivîsîne.

Claudius James Rich (1787-1821), nûnerekî bazirganiya brîtanî, gerok û zanayekî antîk (antiquarian scholar) e. Rich latînî, grekî, farisî, erebî, tirkî, îbranî, kurdî û gelek zimanên din ên rojhilatî û zarên wan hîn bûye. Li gelek bajarên Misir, Persiya, Hîndîstan û Împaratoriya Osmaniyan geriyaye. Dema li Bexdadê maye li ser coxrafya, tarîx û antîkîteyên herêmê xebitiye. Cara pêşîn wî bermayên antîk ên Babîlonê dîtine. Ev du kitêbên wî li ser vê mijarê ne: 1. Rich, Claudius James (1818), *Memoir on the ruins of Babylon* (3 ed.), Longman, Hurst, Rees, Orme, and Brown. 2. Rich, Claudius James (1818), *Second Memoir On Babylon : Containing An Inquiry into The Correspondence Between The Ancient Descriptions Of Babylon And The Remains Still Visible On The Site*, Longman, Hurst, Rees. Piştî 1814an li ser zimanê suryanî, keldanî û êzidiyan xebitiye. Di 1810an de çûye gundên keldaniyan ên li başûrê Kurdistanê. Paşê çûye Bexdayê, Silêmaniyê, Sinê û rojavayê Nînovayê. Di 1820an de çûye Besra û Şîrazê, li wê derê bermayên Persepolîsê dîtine. Cîldê pêşîn ê gernama Rich, *Narrative of a Residence in Koordistan and on the Site of Ancient Nineveh with Journal of a Voyage Down to Tigris to Bagdad and an Account of a Visit to Shirauz and Persepolis*, sala 1836an ji aliyê jinebiya wî ve li Londonê hatiye weşandin. Rich di dawiya vê berhema xwe de vajnameyek piçûk amade kiriye, di vê vajnameyê de peyvên çar zarên kurdî dane ber hev û ew tercûmeyî îngilîzî kirine. Ji hejmara peyvên di vajnameyê de tê tēgihîştin ku zanîna wî ya feylî ji yên din gelekî kêmtir bûye. Rich 5 fonem li fonemên zimanê xwe yê maderî, îngilîzî, zêde kirine û pê peyv û cumleyên kurdî nivîsîne. (Rich, 1836: 394-398)

Karl Heinrich Emil Ludwig Koch¹⁴ (1809-1879), botanîstekî alman e. Bi keşfên xwe yên botanîk ên li Kafkasan û bakurê rojhilatê Tirkiyayê bi nav û deng e. Ji xeynî botanîkê di warên etnolojî, antropolojî, arkeolojî, kartografî, jeolojî, baxçevanî û

¹³ Ji bo zanîneke berfirehtir a li ser jiyana û berhemên Klaproth binihêrin: Walrawens, H. (1999). *Julius Klaproth (1783–1835). Leben und Werk*. Harrassowitz, Wiesbaden.

¹⁴ Peter Lerch navê nivîskar Karl Koch nivîsiye. Ji bo navê wî yê tam binihêrin: D.J. Mabberly, *Mabberley's Plant-book: A Portable Dictionary of Plants, Their Classifications, and Uses*, Cambridge University Press, 2008, rp. 992

guherbariya genetîk de xebitiye. Sala 1846an gernama xwe ya bi navê *Wanderungen im Oriente während der Jahre 1843 und 1844* a ji du cîldan pêk tê li Weimarê weşandiye. Nivîskar di vê bernama xwe de bi qasî 30 peyvên kurdî, ermenî û tirkî nivîsîne. Koch bi giranî bi fonemên almanî peyvên kurdî nivîsîne. (Lerch, 1858: 26)

Austen Henry Layard (1817-1894), gerok, arkeolog, kuneiformist (cuneiformist), tarîxçiyê hunerê, draftsman, berhevkar, nivîskar, rêzan (politician) û dîplomat e, bi kolanên xwe yên li çiyayê Nemrût û şarê Nînovayê bi nav û deng e. Sala 1851ê li wê derê kitêbxana Aşûrbanişîpîl keşf kiriye. Piraniya temenê wî yê zarîtiyê li Îtalyayê buhuriye. Di heman demê de li Îngilîstan, Frans û Swîsrê xwendiyê. Li wê derê tama hunerên delal girtiye û bûye evîndarê gerê. Ji bo xizmetguzariya sîvîl çûye Seylanê. Di 1839an de dest bi gera Asyayê kiriye. Li Stenbol, Mûsil, Madrîd, Venedîk, Kirim, Hîndîstan, Paris û gelek deverên din geriyaye. Sala 1848an vegeriyaye Îngilîstanê û kitêba xwe *Nineve Handits Remains: With An Account Of A Visit To The Assyrians, And The Yezidis, And An Inquiry Into The Manners And Arts Of The Ancient Assyrians* (2 vols., 1848–1849) weşandiye. Gotara xwe ya bi navê *A Description of the Province of Khuzistan* sala 1846an li Londonê di hejmara 8an a kovara *The Journal of the Royal Geographical Society of London* de weşandiye. Di vê nivîsa xwe de çarînek ji helbestek bi zarê kurdî yê bextiyarî nivîsiye û tercûmeyî îngilîzî kiriye. Layard bi giranî bi fonemên îngilîzî bi kurdî nivîsiye. Ji ber ku bi îtalyanî û fransîzî jî mîna zimanê xwe yê maderî rind zanibûye di nivîsandina kurdî de ji 5 dengderên bi bilindek (accent) ên van her du zimanan jî sûd girtiye. (Lerch, 1858: 27-28)

Moritz Wagner (1813-1887), kaşîf, berhevkar, coxrafyazan (geographer) û tarîxçiyekî siruştî (natural) yê alman e. Di 1843an de bi nivîskarê ermenî Khachatur Abovian re li Ermenîstanê li dora gola Sevanê geriyaye. Wagner gelek kitêb li ser coxrafya bakurê Afrîkayê, Rojhilata Navîn û Amerîka tropîkal nivîsîne. Moritz Wagner sala 1852an gernama xwe ya bi navê *Reise Nach Persien Und Dem Lande Der Kurden* li Leipzigê weşandiye. Wagner di vê berhema xwe de cih daye çarînek ji straneke kurdî û tercûma wê ya bi zimanê almanî. (Lerch, 1858: 29) Wagner li gel fonemên zimanê xwe yê maderî, almanî, bi afirandina 6 fonemên din ev çarîna bi kurmancî nivîsiye.

RÊBAZ

Me fonemên kurdzan û gerokên ji nivîsên wan ên kurdî yên di kitêb û gotarên wan de tesbît kirin. Ji bo ku xwendevan têbigihên kanê van filolog û gerokên wê demê çawa fonemên kurdî tesbît kirine, me di Destpêka vê xebatê de ew dan nasîn.

Di beşê pêşîn da hema li bin sernivîsê me kitêb û gotarên bûne mijara vê xebatê dan nasandin; çend rûpel e, ji çend beşan pêk tê û ev beşên kitêbê li ser çî ne. Ji bo lêkolîner û lêgerînerên ku dixwazin li ser beşên cihê yên kurdzaniyê bixebitin bi vî awayî dikarin ji mijarên di berhemên van kurdzan û gerokan haydar bibin û jê sûde werbigirin.

Bi analîza foneman me xwest em şaşitiyên van kurdzan û sebebên şaşitiyên wan bînin zimên. Kîjan fonemên kurdî bi awayekî bi pergala nehatine nivîsandin di bin sernavê Analîza Foneman de cih digirin. Dîsa di bin vî sernavê de me bala xwe de alfabeyên kurdzan. Di nivîsa xwe ya kurdî de bi fonemên di alfabên xwe de çiqas rast nivîsîne û çiqas şaş nivîsîne.

Ji bo em bikaribin wekhevî û cihêtiyên demkî û herêmkî yên fonemên kurdî yên ji 230 sal heta 130 sal berê têbigihên me ji her kurdzanekî tekstekî resen bijart, ew tekst bi herfên alfabeya kurdî ya Celadet Alî Bedirxan ji nû ve nivîsîn û tekstê resen jî di pêvekan de bi cih kirin de ku xwendevan bikaribin wan bidin ber hev. Paşê me heman tekst bi kurdiya îro nivîsî da ku cûdahiyên fonemên zimanê wê demê û yê îro were dîtîn û kesên bixwazin di vî warê de bixebitin jê sûde werbigirin.

Ji bo ji hêjahiya fonetîk a fonemên kurdî yên kurdzan û gerokan qenc bê têgihîştin me bi tabloyan hêjahiya fonetîk a her fonemî bi nîşanek Alfabeya Fonetîk a navenetewî nîşan de.

BEŞ 1

FONEMÊN KURDZANAN

1 FONEMÊN KURDZANÊN EWRÛPÎ Û AMERÎKÎ

Ji sala 1787an ta 1887an yanzdeh kesên ewrûpî bi pîvanên filolojiya rojavayî li ser kurdzaniyê xebitîne. Ji van yanzdeh kesan Giuseppe Campanile yê ku kitêba xwe li ser tarîx, dîn û folklorê kurdan nivîsiye ne tê de, yê dîn gişkan gelekî bala xwe dane ser nivîsandina zimanê kurdî û li gor têgihîştina xwe ji bo rasttir nivîsandina dengên vî zimanê jê re fonemên pêwîst peyda kirine. Ji ber ku Campanile di kitêba xwe de cih daye stranek kurdî ya dema xwe me pêwîstî pê dît ku em fonemên wî yê kurdî jî bidin nasandin. Bi rêza kronolojîk kurdzanên sedsala pêşîn a kurdzaniyê ev in: Maurizio Garzoni, Peter Simon Pallas, Giuseppe Campanile, Îlya Nîkolayevîç Berezîn, Peter Lerch, Alexander Borejko Chodzko, August Alexandre Jaba, Samuel Audley Rhea, Albert Houtum-Schindler, Eugen Prym û Albert Socin.

1.1 FONEMÊN KURDÎ YÊN MAURIZIO GARZONI

Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda

Maurizio Garzoni sala 1762an çûye Mûsilê. Du sal şûnda li paytextê mîrekiya Behdînan li Amediyê li bakurê rojhilatê Mûsilê bi cih bûye. Li wê derê ji bo kitêba xwe *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda* (Gramer û Vajnameya Zimanê Kurdan) materiyal danehev. Maurizio Garzoni sala 1787an li Romayê ev kitêba xwe weşandiye. Bi tarîxa li ser beşa *Decretum*, kitêb di 27ê sermaweza 1786an da (Garzoni, 1787: 285) qediyaye. Lê tarîxa weşandina wê 1787 e. Tarîxa kurdzaniyê û nivîsîna kurdî ya bi herfên roman bi vê berhema Maurizio Garzoni dest pê dike.

Di *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda* de du beşên bingehin hene: Yek: *Grammatica Kurda* (Gramera Kurdan). Du: *Vocabolario Italiano, e Kurdo* (Vajnameya Îtalyanî û Kurdî). Beşa *Gramera Kurdan* bi 7 rûpelên pêşgotinê re ji 74 rûpelî pêk tê. Beşa *Vajnameya Îtalyanî-Kurdî* 214 rûpel e. Li destpêka kitêbê 5 li dawiya kitêbê 5, li ser hev 10 rûpelên vala hene. Tevî van rûpelên vala kitêb li ser hev ji 298 rûpelî pêk tê.

Analîza Foneman

Di rûpelên 14 û 15 ên kitêbê de 32 herfên ebceda farsî di bin navê *Persicum* (Farisî) û beramberên wan ên roman di bin navê *Latinum* (Latînî) de hatine nîşandayîn. Di rastiya xwe de ji wan herfan gelek di alfabeya zimanê latînî de tune ne. Ji ber ku herfên alfabeya latînî di destpêkê de 21 in, paşê ji bo nivîsandina peyvên ji girekî ketine latînî herfên *y* û *z* lê hatine zêdekirin û bi vî awayî hejmara herfan gihîştîye 23an. Maurizio Garzoni 9 herf li alfabeya zimanê latînî zêde kirine. Di vê alfabeyê de dengê /w/ ya kurdî bi herfek bi serê xwe nehatiye nîşandayîn. (Garzoni, 1787: 14-16) Ji ber ku ew deng di ebceda farisî de tune ye. Faris bi و (waw) a erebî dengê /v/ dinivîsin û wê bi navê *vav* bi nav dikin. Ji vê alfabeyê em têdigihên ku haya Garzoni ji ebceda kurdî tune bûye.

Maurizio Garzoni di vajnameya xwe de dengê /xw/ ya peyva *xwar* bi dîftonga dengdar *κν* “κvar” nivîsiye. Lê di nivîsandina peyvên din de em rastî vê dîftonga dendarîn nayên. Dengê /ʔ/ û dengê /x/ her yek bi du herfan nivîsîne. Cihêtiya dengê /t'/ nîşan daye, lê kêm peyvên xwedî vî dengî bi herfa ~~ϑ~~ nivîsîne. (Garzoni, 1787: 60, 65, 106) Piraniya peyvên xwedî vî dengî û dengê /t/ mîna hev bi herfa T/t nivîsîne. Di peyvên *b,la, k,nàrek, b,déi* (Garzoni, 1787: 71) û hd. de bi bêhnokê (,) dengê /ø/ nivîsiye. Maurizio Garzoni, bi awayekî sistematîk nebe jî 39 dengên kurdî yên ji hev cihê di nivîsa xwe de nîşan dane. Bêpergaliya wî jî ew e ku heman deng di heman peyvên de bi heman herfan nenivîsîne, bi herfên nêzîkî hev nivîsîne. Ev 39 deng her yek bi herfekê bi alfabeyeke fonetîk nehatine nivîsandin. Carna bi herfekê 3 deng nivîsîne, carna jî bi çar herfan dengê nivîsiye. Dengê /tʃ/, /dʒ/ û /ʃ/ di gelek peyvên de bi awayê zimanê xwe yê maderî, bi awayê îtalyanî,

nivîsîne. Di hinek peyvan de jî eynî deng bi herfên xwe yên taybet ên ji bo kurdî amadekirî nivîsîne.

Garzoni di nivîsandina gelek peyvan de nikanibûye dengê /x/, /ɸ/, /q/, /ħ/ ji hev derbixîne. Dengê /ħ/ ya serê peyvan şaş nivîsiye. Di nivîsandina hejmarên *heft*, *heşt*, *heftê*, *heştê û hezar* de ev şaşitî bala meriv dikişîne. Nivîskar ev hejmar wisa nivîsîne: *Ahft*, *Ahst*, *Ahfté*, *Ahsté*, *ahzár* (Garzoni, 1787: 17) Di hinek peyvan de jî dengê /x/ û /ɸ/ bi herfa dengê /k'/ an jî dengê /q/ re li nav hev xistiye. Di gotina *Az koláme tá*¹⁵ (Garzoni, 1787: 23) de di şûna dengê /x/ de dengê /k'/ bi kar aniye. Dengê /h/ li serê peyvan nîşan nedaye. Di şûna *Az hatum*, *Au hat* de *Az atum*, *Au at* nivîsiye. (Garzoni, 1787: 38) Li dawiya peyvan bi piranî dengê /h/ rast nivîsiye. Di navên hejmarên kurdî û gelekên din de li dawiya peyvan ev deng rast nivîsiye. (Garzoni, 1787: 17)

Garzoni dengê /k/ ya nava peyvê û dawiya peyvê di gelek peyvan de bi herfa κ nîşan daye. Di hinek peyvan de jî ev deng û dengê /k'/ li nav hev xistine; yek caran dengê /k'/ bi herfa dengê /k/, yek caran jî dengê /k/ bi herfa dengê /k'/ nivîsiye. Pir caran heman peyvên kurdî hem di heman rûpelî de hem jî di rûpelên cihê yên kitêba xwe de bi herfên ji hev cihê nivîsîne. Ji van peyvan yek peyva *qodé* ye. Ev şaşitî di nivîsandina peyvên xwedî dengên di îtalyanî de tune ne, lê di kurdî de hene pirtir xwe dide xwiyakirin. Di gelek peyvî de dengê /ʃ/ bi herfa dengê /s/ bi *s* nivîsiye. Giuseppe Campanile li ser vê şaşitiya Garzoni wisa nivîsiye: “em dibînin ku hema hema hemî *Scin*¹⁶ bi *Sinê* nivîsîne. (Campanile, 1818: 117) Di kitêba Garzoni de gelek şaşitiyên gramerî jî bi awayekî berbiçav xwiya dibin. Di beşa gramerê de li gor dem, kes û awayê aktîf û pasîf fêlên kurdî dane nasandin de jî zaf şaşitî kirine. Di sentaks û hêmanên din ên gramerî de jî gelek xeletiyên wî bala meriv dikişînin. (Garzoni, 1787: 41-48)

¹⁵ Bi alfabeya roman a Celadet Alî Bedîrxan: Ez xulamê te

¹⁶ Şîn ش û Sîn س navên du herfên ebceda kurdî ne.

Transkrîpsiyona Tekstê Resen

AXAFTINE BEYN DU AËA MUSULMAN¹⁷

Îsmâil û Mustefa

Îsm. Selam a'leik

Must. A'leik selam, û rahmet Ellah

Îsm. Sabañ'l Qer. Keifa te çava.

Must. Elhëmdellah (*oppure*)¹⁸ Şukir Xudê) Kence, tu çava

Îsm. Şukir Xudê.

Must. Atina te Enşallah Qêire.

Îsm. Enşallah Qêire. Iarî min ezîz. Ez atum nik te katir îek pişare; nîasum dilê te kence gel min; û pinavastum pêîdakim îek eks te amîntera.

Must. Ser sere min. Bo Kelmata te çu teksîr nakem.

Îsm. Xudê t'avêz kit. Te 'ecis neke, eger bu te bêjum çe ser min at.

Must. Teklîf biele Kinarek, eu bêîn me betal.

Îsm. Goh bidêi bu men. Bu te emmu eskera bêjum. Par Mîr mi vererkîrê ser çahr gund katir draf bistînum. Min bavêrkîrê (1) ki kes eşîar nabit. Min stand ehzar qruş zêîde bu min; mirovik gund (nezanum kîfe) skayat de nik Mîr. Eu ehzar eks min Kerbe (2) vekîrê, mi derekast, pasi ki talankîrê male min, û stand emmu pez û estir; nuk tu fikir bike çava ez şapirze, azkim ki tu nîsan dêi bu min, çe lazim çibikim.

Must. Dil Xu Qereb neke (3). A'lac evî zehmet nîne. Eu reng çibke. Binêvîse îek mektûb bu malqoî (4), û gel mektûb virerbike du kîsa (5), û Krar bike, eger

¹⁷ Ji bo tekstê otantîk li Pêvek 1.2. Maurizio Garzoni binihêrin.

¹⁸ Bi îtalyanî tê mana *an jî*.

şugolête pêk înît seh kîse k'îdî; emme eu besse nîne, em lazim vîrerkeî îek dîarî bu Mîre eks reng evî, katir gel Mîr axevît, ki çu car bi dil evî nekit (6).

Ism. Bu Mîr tiştikî tivêt?

Must. Malûm. Ew kifse.

Ism. Nizanum çe li dêm.

Must. Malqoî bu te binivîsît, çe lazim.

Ism. Kîva peidakim inde draf?

Must. Tu Mirovî şatir nîne. Tu çu car te nebîst, çava çikîrîe mami te de selî bir eîke? Çibke sîbî evî. Tu deîn bistîne çent eucebît, û pasî Kengî cari kidî Mîr dil xu (7) çêkirîa gel te; û geiştîe mal; tu aîa gelek fellaî (8), raîa te, ki frengî bû; Ti eu eîcet bugre, û wan bidey naf zencîr (eu erro erro emmu Patşa Romi çikêt) û bistîne eks wan zêide çi t'eucibû. Er fellaî ki dibit frengî lazim esab kir duşman eks Musulman. Çe tivêt senaîtere?

Ism. Eger bu te rast bejum; inde ez alozî bû (9) ser eu şugul, ki eks emmu min sbîr kirîe.

Must. Qemme ehdî na ilgire. Çibke çe min got bu te, û keîfa xwe îne.

Ism. Fikire te mi tenakîrîe; ez eks te biçûm kauvî rajî. Katira te.

Must. Veqara te bi qeîr.

Ism. Xudê şugulête daîmen rast înît. Ehzar salî bît. Xudê beehşt det bu te.

Nivîskar di bin vê axaftinê de ev cumleyên kurdî nivîsîne, tercûmeyî îtalyanî kirinê û ji bo xwendekar têbigihên malûmatên pêwîst bi berfirehî dane (Garzoni, 1787: 70-74):

Min bawerkirîa, ki kes eşîarnabit

Eks min kerba vekirîa

Dil xu Qerab neke.

Malqoî.

Du Kîsa.

Bi dil evî na kit.

Dil xu çêkirîa gel te.

Fallaî.

Allozî.

Bi Kurdiya Îro

AXAFTINA DI NAV DU AXAYÊN MISILMAN DE

Îsmail û Mistefa

Î. Salamun eleykum.

M. Eleykum selam û rehmaullah.

Î. Sibeha te bi xêr. Kêfa te çawa ye?

M. Şukur ji xwedê re, qenc e. Tu çawa yî?

Î. Şukur ji xwedê re.

M. Hatina te însallah xêr e.

Î. Însallah xêr e. Dostê min ê ezîz, ez ji bo pirsekê hatim nik te. Zanim tu ji dil li gel min î; û ez nikanim yekî ji te amintir peyda bikim.

M. Ser serê min. Ji bo xizmeta te tiştêkî texsîr nakim.

Î. Xwedê hefza te bike. Eger te eciz neke, çi hatiye serê min ji te re bibêjim.

M. Teklîfê li kinarekî bihêle, ew di nav me da betal e.

Î. Guh bide min. Ji bo te ez hemû eşkera bibêjim. Par Mîr ez bi qatirekê bi rê kirime ser çar gundan, ji bo dirav bistînim. Min bawer kiriye kes hişyar nabe. Min ji bo xwe hezar quruş zêde standiye. Ji gund merivekî (nizanim kî ye) li nik mîr şikayeta min kiriye. Ew hezar li min hatiye kerbê. Paşê min tê derxist

kê malê min talan kiriye, pez û hêstir standiye. Nuka tu fikir bike çawa ez şepirze bûme. Hez dikim, tu riyekê nîşanî min bidî. Lazim e çi bikim?

M. Dilê xwe xirab meke. Îlaca vê zehmet nine. Bi vî rengî bike: ji bo malxweyî mektûbekê binivîse li gel du kîsan bi rê bike û vî karî bike, eger şuxulê te pêk bîne sê kîsikên din... Hema ev bes nîne. Lazim e em ji bo Mîr diyariyekê bi rê bikin. Bi vî rengî li gel mîr biaxive û jê re bibêje ku tu çi car ji dil evê nakî.

Î. Ji bo Mîr tiştêk divêt.

M. Malûm. Ev kifş e.

Î. Nizanim çi bidimê.

M. Malxweyî'ê ji bo te binivîse, çi lazim e.

Î. Ezê li ku peyda bikim hinde diravî?

M. Tu mirovê şatir nîn e. Te ti carî nebihîst mamê te du sal berî hay bike çawa kiriye? Sibe vê bike: çend hewce be, tu deyn bistîne û paşê kengî careke din te dilê Mîr li gel xwe xweş kir; haya te jê hebe, gelek fellah, reiya ku bûn freng, tu wî hecetî biguhere û wan zencîr bike (ew hemû paşayên romî çi dikin), ji viyan zêdetir hewceyiya te bi çi hebû? Lazim e her fellahê dibe freng dijmin bihesibînî, ne misilman. Çi divêt senayîtir e?

Î. Eger ji bo te rast bibêjim, li ser vê şuxulê ez hinde alozî bûm ku eks hemû min sebir kiriye.

M. Êdî xeman hilmegire. Min ji bo te çi got wê bike, û kêfa xwe bîne.

Î. Min mitala fikrên te kiriye; ez qewî razî ji cem te diçim. Bi xatirê te.

M. Oxira te ya xêrê be.

Î. Xwedê şuxulê te daîma rast bike. Hezar salî bibînî. Xwedê buhuştê bike para te.

Tablo 1: Bi Maurizio Garzoni Fonemên Kurdî

No	Dengdar		AFN ¹⁹	No	Dengdar		AFN
1	B	b	/b/	1	A	a	/ɑ/, /ɑ:/, /ɛ/
2	C	c	/tʃ/, /ts/	2		ā	/ʔ/, /ɑ:/
3		Ċ	/dʒ/	3		à	/ɑ:/
4	D	d	/d/	4		á	/ɑ:/, /ɛ/
5	F	f	/f/, /v/	5	Ā	Ā	/ʔ/
6	G	g	/dʒ/	6	E	e	/ɪ/, /ø/, /ɛ/
7	H	h	/h/	7		é	/ø:/
8	J	j	/j/	8		è	/ø/, /ɛ/
9	K	k	/k/, /kʰ/, /q/, /χ/	9	I	i	/i/, /ø/
10	Ķ	Ķ	/k/, /kʰ/	10	O	o	/o/, /o:/, /ø/, /u/
11	Ķ	Ķ	/χ/, /q/	11		ó	/o:/
12	L	l	/l/, /l̥/	12	U	u	/ø/, /u/, /o/
13	M	m	/m/	13		ú	/u/
14	N	n	/n/	14		,	/ø/
15	P	p	/p/, /pʰ/	No	Diftong	AFN	
16	Q	q	/χ/	1	ai		/ai/, /ei/, /aj/, /ɛj/
17	Ķ	Ķ	/χ/	2	au, àu, aú		/ɛw/
18	R	r	/r/, /r̥/	3	ei, éi,		/ii/, /ɛj/, /ɪ/
19	S	s	/s/, /ʃ/	4	ia		/ja/, /ija/
20	T	t	/t/, /tʰ/	5	iā		/iʔɑ/
21	Ķ	Ķ	/tʰ/	6	ie		/jɛ/
22	V	v	/v/, /u/, /ø/	7	ie		/ijɛ/
23		Ķ	/ks/	8	io		/ijo/
24	Z	z	/z/	9	oa		/uwa/
25		Ķ	/ʒ/	10	oé		/oji/
No	Dîgraf		AFN	11	oi		/oi/, /oji/
1	gh		/ɣ/	12	ua		/uwa/, /œɑ/, /vi/, /wi/,
2	gh		/g/, /ɣ/	13	uā		/uʔɑ/
3	hh		/h/	14	uà		/wɑ/
4	sc		/ʃ/	15	ui		/øi/,
5	vv		/w/	16	ùi		/u:i/
6	zi		/ʒ/	17	uì		/ui:/
7	ue		/e/				
	Trîgraf		AFN		Dift.²⁰ dengdar		AFN
1	hhk		/χ/	1	kv		/χw/

¹⁹ AFN: Alfabeya Fonetîk a Navnetewî (IPA: International Phonetic Alphabet) ye.

²⁰ Dift: diftong

1.2 FONEMÊN KURDÎ YÊN PETER SIMON PALLAS

Linguarum Totius Orbis Vocabularia Comparativa Augustissimaecura Collecta, Sectionis Prima, Linguas Europae et Asiae Complexae

Peter Simon Pallas sala 1787an cîldê pêşîn ê vajnameya xwe ya pirzimanî (polyglottous) ya bi navê *Сравнительные словари всех языков и наречий, собранные десницею все высочайшей особы. Отделение первое, содержащее в себе европейские и азиатские языки Ч.1.* (Vajnameya komparatîva hemî zar û zimanan a destê rastê ya meriva hêjatirîn. Cara pêşîn ji hev derxistina zimanên ewrûpî û asyayî. Cîld 1) li St. Petersburgê weşandiye. Pêşgotina vî cîldî di 29ê Berfanbara 1786an de hatiye nivîsandin. Kitêb salekê şunda di 1787an de hatiye weşandin. Ev cîld ji 425 rûpelan pêk tê. Çar rûpelên dawîn vala ne.

P. S. Pallas cîldê 2an ê heman berhema xwe li gel navê wê yê bi rûsî bi latînî jî *Linguarum Totius Orbis Vocabularia Comparativa Augustissimaecura Collecta, Sectionis Prima, Linguas Europae Et Asiae Complexae* bi nav kirî sala 1789an li Petropoliyê weşandiye. Ev berg tevî 6 rûpelên xwe yên vala ji 568 rûpelî pêk tê.

Tercûma latînî ya peyvên rûsî yên di destpêka cîldê 2an de ne tê de, peyvên zimanên di vê vajnameya pirzimanî de gişk bi alfabeya krîlî hatine nivîsandin. Di nav 200 zimanên di vê vajnameyê de zimanê kurdî di rêza 77an de ye.

Di cîldê 2an de 143 peyvên rûsî, hejmarên rûsî û manên wan ên bi heman zimanên ewrûpî û asyayî hene. Di beşa dawîn a cîldê 2an de ji hejmara 174an heta 185an hejmarên rûsî û manên wan ên bi zimanên ewrûpî û asyayî heye. Di vê beşê de rêza zimanê kurdî 83 ye.

Analîza Foneman

Gelek peyvên di vajnameyê de bi du awayî, hinek bi sê awayên xwe hatine nivîsandin. Li ser hev 276 peyv bi kurdî hatine tercûmekirin.

Peter Simon Pallas dengdarên hewadar (aspirant) û nehewadar ên di peyvên kurdî de bi awayekî bi pergala rast nîşan nedane. Li dawiya her peyva bi dengdarekî

diqede nîşana dengdarên nerm (soft) Ь an jî nîşana dengdarên hişk (hard) Ъ danîye. Di cîldê pêşîn de nîşana dengdarên hişk bi şemala xwe ya girs nivîsiye. Peyvên ku bi nîşana dengdarên nerm daye bi şemala wê ya piçûk ь nivîsiye. Di cîldê dawîn de ev her du nîşan bi şemalên wan ên piçûk nivîsîne.

Di nav peyvên kurdî de çend îstîsna ne tê de piştî dengdaran ev nîşanên hişkî û nermiyê nîşan nedane. Peyva kurdî ферьядъ (feryad) jî van îstîsnan yek e. Dengdara *r* li vê derê bi nîşana Ъ hatiye nivîsandin. Heman peyv bi farisî ферьядъ nivîsiye, konsonata *r* nerm nîşan daye. Di nivîsandina 58 peyvên pêşîn ên cîldê pêşîn de piştî dengdarên kurdî meriv rastî nîşana dengê nerm nayê. Di cîldê 2an de jî çend îstîsna ne tê de, di nivîsandina dengdarên kurdî de nîşana dengê hişk nehatiye nivîsandin.

Tablo 2: Nimûnên Fonemên bi Nîşana Telafûza Hişk

No	Peyv	Translîterasyon	Transkrîpsion	Cîld	Rûpel
2	АсманЪ	Asman	Asman	1	5
3	БабЪ	Bab	Bab	1	8
8	ХушкЪ	Xuşk	Xuşk	1	24
12	ПисерЪ	Pîser	Piser	1	37
14	МуруфЪ	Muruf	Murof / Mirov	1	43
16	СерЪ	Ser	Ser	1	50
35	ДасмЪ ²¹	Dest	Dest	1	109
129	ОчагЪ	Oçag	Oçax	2	129
217	ХубЪ		Xub	2	278
222	ХрабЪ	Xrab	Xirab	2	296

²¹Ji ber ku Pallas di nivîsa xwe da herfa *r* ya piçûk a rûsî tim bi şemala wê ya destnivîskî **rr** nivîsiye, me jî peyvên tê da ev herf hene wekî nivîskar **m** nivîsîn.

Tablo 3: Nimûnên Fonemên bi Nîşana Telafûza Nerm

No	Peyv	Translîterasyon	Trankrîpsiyon	Cîld	Rûpel
61	Тертъ	Tert	Derd	1	191
63	Кіаръ	Kiar	Kar	1	197
65	Сербдестъ	Serbdest	Serbidest	1	203
72	Сааръ	Kaar	Kar	1	226
74	Курьэ	Kure	Kûre	1	232
76	Манкъ	Mank	Mang	1	238
82	Барень	Baren	Baran	1	257
85	Барфъ	Barf	Berf	1	267
89	Супъа	Supa	Sube	1	280
91	Саль ²²	Sal	Sal	1	286
97	Хаакъ	Xaak	Xak	1	305
140	Енгуръ	Engur	Engûr	2	29
145	Кырма	Kirm	Kurm	2	46
180	Шерапъ	Şerap	Şerab / Şeraw	2	154
182	Цокоръ	Şokor	Şukur / Şikir	2	161

Peter Simon Pallas di nivîsandina gelek peyvên kurdî de herfên б û п, в û ф, д û т, с û з, ж û ш, дж û ч, к û г, и û ы bi şaşitî di şûna hev de nivîsîne, an jî nikanibûye van denga ji hev û din derbixîne.

²²Nivîskar dengê // bi herfa л nenivîsîye, bi herfa destnivîskî л nivîsîye.

Tablo 4: Peyvên bi Fonemên Şaş Hatine Nivîsandin

No	Peyv	Translît.	Transkrîp.	Şaş	Rast	Cîld	Rûpel
4	Таике	Taîke	Daîkê	Т	Д	1	11
12	БичукЪ	Bîçûk	Biçûk	и	ы	1	37
20	Чаф	Çaf	Çav	ф	в	1	62
30	ОсманЪ	Osman	Azman	с	з	1	94
32	КерденЪ	Kerden	Gerden	К	Г	1	100
33	МилЪ	Mîl	Mil	и	ы	1	103
36	Тилли	Tîllî	Tilî	и	ы	1	112
38	СикЪ	Sîk	Zik	Си	Зы	1	118
46	ТилЪ	Tîl	Dil	Ти	Ды	1	143
55	БанкЪ	Bank	Bang	к	г	1	171
66	Сулмь	Sulm	Zulm	С	З	1	206
68	Сенде	Sende	Zende	С	З	1	213
70	Кîань	Kîan	Giyan	К	Г	1	219
75	РушЪ	Ruş	Roj	уш	ож	1	235
89	Супья	Supa	Suba	п	б	1	280
98	Афь	Af	Av	ф	в	1	308
142	Чау	Çeu	Ce	Ч	Дж	2	36
145	Кырмь	Kirm	Kurm	ы	у	2	46
147	Чанварь	Çanvar	Cenawer	Ч	дж	2	52
172	ОчагЪ	Oçag	Ocaħ	ч	дж	2	129

P.S Pallas pir caran nikanibûye peyvên farisî û kurdî ji hev derbixîne. Ji ber vê yekê jî gelek peyvên farisî di şûna yên kurdî de, gelek peyvên kurdî jî di şûna yên farisî de nivîsîne.

Tablo 5: Peyvên Farisî û Kurdî yên di Dewsa Hev de Hatine Nivîsandin

No	Farisî	Translît	Kurdî	Translît.	Transkrîp.	Cîld	Rûpel
11	Джован	Covan	ТухмерЪ ²³	Tuxter	Dot	1	34
12	ПсерЪ	Pser	ПисерЪ	Pîser	Pis	1	37
15	КесанЪ	Kesan	Калкага	Kalkaga	Xelqeha	1	47
19	Наибини	Naîbînî	Набини ²⁴	Nabînî	Nabînî	1	59
21	Абру	Abrû	Абру	Abrû	Ebrû, Brû	1	66
30	ЗубанЪ	Zuban	СебанЪ	Seban	Zeban	1	94
32	КарданЪ	Kardan	КерденЪ	Kerden	Gerden	1	100
43	ГошмЪ	Goşt	Гухшм	Gûşt	Goşt	1	134
46	ДилЪ	Dîl	ТилЪ	Tîl	Dil	1	143
55	БангЪ	Bang	БанкЪ	Bank	Bang	1	171
61	Дардъ	Dard	Тертъ	Tert	Derd	1	191
96	Заманъ	Zaman	Семанъ	Seman	Zeman	1	302
142	Джяу	Suau	Чау	Çau	Ce	2	36
147	Джанваръ	Canvar	Чанваръ	Çanvar	Cenawer	2	52

Pallas gelek caran di şûna peyvên kurdî de peyvên farisî nivîsîne. Di peyva 230î de di şûna Бунъ (bûn) a kurdî de Будень(bûden) a farisî; di peyva 232an de di şûna Ракетынь (raketin) a kurdî de Хуфмень (xuften) a farisî, di peyva 234an de di şûna Достми (dostî) ya kurdî de Тосташмен (tostaşten) a farisî û gelek peyvên din ên wisa di vajnameyê de hene. Çend peyvên îstîsna ne tê de di şûna dîgrafa ы de herfa и hatiye nivîsandin.

²³Ev peyv rast tercûmeyî kurdî nebûye. Rast bihata tercûmekirin diviyabû mîna ДжованЪ (cuwan) bihata nivîsandin.

²⁴Ji tercûma vê peyvê em têdigihên ku merivê peyvên rûsî tercûmeyî farisî û kurdî dike heman meriv e. Ji bo peyva rûsî ya di mana *firnik* a kurdî bi peyva *naîbînî* tercûmeyî farisî, bi peyva *nabînî* jî tercûmeyî kurdî kiriye.

Tablo 6: Translîterasyon, Transkrîpsiyon û Tercûma Çend Peyvên Rûsî-Kurdî

No	Русски Rûsî	Курдски Kurdsî	Translît.	Transkrîp.	Tercûme ²⁵
1	Б о г ъ	Худи, Кула.	Xudî, Kula (1)	Xudê, Xuda	xudê, xuda
2	Н е б о	Ваута, Асманъ	Vauta (2), Asman	Asman	asman
3	О ш е ц ъ	Бабъ	Bab	Bab	bab
4	М а ш ъ	Тайке, Де	Taîke, De	Daîkê, Dê	daîk, dê
5	С ы н ъ	Кураменъ	Kuramen (3)	Kurê min	kur, pis
6	Д о ч ъ	Кечаменъ	Keçamen (4)	Keça min	keç, qîz, dot
7	Б р а ш ъ	Бра, Буридеръ	Bra, burîder	Bra, Brader	bra, brader
8	С е с т р а	Хоръ, Хушкъ	Xor (5), Xuşk	Xuşk	xuşk
9	М у ж ъ	Жинаминъ	Jînamîn (6)	Jina min	mêr
10	Ж е н њ а	Меременъ, Сенне	Meremen, Senne (7)	Mêrê min	jin
11	Д ѣ в њ а	Тухшеръ	Tuxşer (8)		cuwan
12	М а л ь ч и к њ	Бичукъ, Писеръ	Bîçûk (9), Pîser (9)	Bîçûk, Pîser	pis
13	Д и ш њ а	Курру	kurru	Kuru	zarr
14	Ч е л о в ѣ к њ	Муруфъ, Адемъ	Muruf, Adem	Murûf, Adem	mirov
15	Л ю д и	Алемъ, Калкага, Калкича.	Alem, Kalkaga, Kalkîça	Alem, Geleke, Gelekcan	gel
16	Г о л о в а	Зеръ, Серъ	Zer (10), Ser	Ser	ser
17	Л и ц о	Рухъ	Rux	Rû	rû
18	Н о с ъ	Кепу, Капу	Кепу, Капу	Кепû, Карû	kepo, Poz
19	Н о з д р и	Набини	Nabînî (11)	Nabînî	fîrnîk
20	Г л а с ъ	Çафъ, Çуа	Çaf, Çua	Çav	çav
21	Б р о в и	Абру	Abru	Ebrû	brû

(1) Xwiyaye ev şaşitîyek nivîsê ye. Di şûna herfa **д** de herfa **л** hatiye nivîsandin. Peter Lerch jî gotiye ev tenê şaşitîyek nivîsê ye. (Lerch, 1858: гр. 17)

(2) Di ferhengên kurdî yên li Tirkîyayê hatine weşandin de ev peyv tune.

²⁵ Ji bo hinek peyvên ji aliyê Pallas ve ji rûsî şaş hatine tercûmekirin were dîtîn me pêwîstî pê dît em van peyvên ji nû ve ji rûsî tercûme bikin.

- (3) Pallas, peyva rûsî ya di mana *kur*, *law* an jî *pis* de bi cumleya *kuramen* tercûmeyî kurdî kiriye. Kur peyveke nêrza (masculin) ye, ne mêza (feminin). Diviya bû *kuremen* an jî *kure men* binivîsiya. Dibe ku ev şaşitiyek nivîsê be.
- (4) Peyva di rûsî de tê mana *dot*, *keç* an jî *qîz* bi cumleya *keçamen* tercûmeyî kurdî kiriye.
- (5) Nivîskar peyva di rûsî de tê mana *xuşk* bi du peyvan tercûmeyî kurdî kiriye. Ji van peyva *xor* a di ferhengên kurdî yên li Tirkiyayê hatine weşandin de vê manê nadin.
- (6) Peyva di rûsî de tê mana *mêr* (di mana mêrê jinekê de) bi awayê *jînamen* wate *jina min* hatiye tercûmekirin. Ev peyv bi awayê *jenamen* bihata nivîsandin ewê pirtir nêzîkî mana xwe bûya. Çimkî *jîn* û *jin* du peyvên bi manên xwe bi temamî ji hev cihê ne. Peyva bi rûsî tê mana *mêr* bi awayê *meremen* bihata tercûmekirin dîsa ewê jê bihata têgihîştin. Xwiya ye di vê peyvê de nivîskar rêza peyvan li nav hev xistiye.
- (7) Nivîskar peyva di rûsî de tê mana *jin* bi cumleya *meremen* û peyva *senne* wate *mêrê min* tercûmeyî kurdî kiriye. Peyva *zenne* ya farisî *senne* hatiye nivîsandin. Ev peyv di farisî de tê mana *jin* a kurdî. Xwiya ye ku nivîskar di tercûma kurdî de tenê mana vê peyvê û ya berî wê li nav hev nexistine, peyv jî tevlihev kirine.
- (8) Bi peyva *tuxşer* mana *dîva* rûsî hatiye dayîn. Nivîskar heman têgeh bi peyvên *тохшеръ, Джоанъ* (*toxşer, coan*) tercûmeyî farisî kiriye. Di kurdî de peyva *cuwan* vê manê dide. Dibe ku wê demê di nav kurdên li Împaratoriya Êris de peyva *tuxşer* hebe.
- (9) Peyva rûsî ya di kurdî de tê mana *law* û *kur* bi şaşitî bi peyvên *biçûk* û *piser* hatiye tercûmekirin.
- (10) Nivîskar peyva di rûsî de tê mana *ser* bi peyvên *zer* û *ser* tercûmeyî kurdî kirine. Dibe ku bi şaşitî *zer* nivîsibe.
- (11) Peyva di rûsî de tê mana *fîrnîkên poz* bi gotina *nabînî* bi awayekî şaş tercûmeyî kurdî kiriye.

Tablo 7: Bi Peter Simon Pallas Fonemên Kurdî

No	Dengdar		AFN	No	Dengder		AFN
1	Б	б	/b/	1	А	а	/ɑ/, /ʔ/, /ε/
2	В	в	/v/, /w/	2		á	/ɑ:/
3	Г	г	/g/, /ʁ/	3	Е	е	/ε/
4	Д	д	/d/	4		é	/i/
5	Ж	ж	/ʒ/	5	И	и	/i/
6	З	з	/z/	6		í	/i:/
7	Й	й	/j/	7		ï	/i/
8	К	к	/k/, /q/, /g/, /χ/	8	О	о	/o/
9	Л	л	/l/, /ʎ/	9		ó	/o:/
10	М	м	/m/	10	У	у	/u/, /ø/
11	Н	н	/n/	11		ú	/u:/
12	П	п	/p/, /b/	12	Ы	ы	/ø/
13	Р	р	/r/, /ɾ/	13	Э	э	/ε/
14	С	с	/s/		Diftong		
15	Т	т	/t/, /tʰ/	1	Ю	ю	/ju/
16	Ф	ф	/f/, /v/	2		íó	/ʏ/
17	Х	х	/χ/, /h/	3		íô	/øh/
18	Ч	ч	/ts/ /tʃ/, /dʒ/	4	Я	я	/ja/
19	Ш	ш	/ʃ/	No	Dígraf		
20	Щ	щ	/ʃ/	1		дж	/dʒ/
21	Ц	ц	/ʃ/	2		лл	/ʎ/
22	Ғ	ғ	/h/, /ħ/	3		вв	/w/
23	Ъ	ъ	Nîşana kons. hişk	4		гЪ	/ʁ/
24	Ь	ь	Nîşana kons.nerm	5		аа	/ɑ:/

1.3 FONEMÊN KURDÎ YÊN GIUSSEPPE CAMPANILE

Storia Della Regione Del Kurdistan e Delle Sette Di Religione Ìvi Esistenti

Giuseppe Campanile sala 1818an kitêba xwe, *Storia Della Regione Del Kurdistan e Delle Sette Di Religione Ìvi Esistenti* (Tarîxa herêma Kurdistanê û mezhebên dînî yên lê hene) li Îtalyayê li bajarê Napoliyê weşandiye. Pêşgotin 20 rûpel, nivîsa eslî 213 rûpel, naverok 3 rûpel, figur 4 rûpel, di nav her figurekî de rûpelekî vala 3 rûpel û çar rûpelên vala yên dawîn; kitêb li ser hev 247 rûpel e. *Storia Della Regione Del Kurdistan e Delle Sette Di Religione Ìvi Esistenti* ji neh beşan pêk tê:

1. Nasandina Kurdistanê, rewş, bilindahî, hukumat
2. Mîrekiyên Kurdistanê û warên wan
3. Ramanên kurdan ên li ser dînê wan
4. Şêniyên Kurdistanê
5. Kurdên koçer
6. Kurdên xristiyan
7. Tirkên koçer
8. Terîqetên din ên rojhilatî
9. Girîngiya leşkerî, siyasî û bazirganiya Kurdistanê

Li dawiya beşa 9an di rûpelên 212 û 213an de bi navê *Canzoncina Kurda* (Strana kurdan) stranek kurdî ya Mir Agari amade kirî bi tercûme û şîrova wê ya îtalyanî ya Campanile cih digire.

Nivîskar li ser alfabeya kurdî ya wê demê jî wisa nivîsiye: “Rojekê mîrê Akarê, Musà Bek, alfabeya kurdî ya baweriya piraniya kurdan bi hebûna wê tune anî pêş min kir. Ji min re digot, bi rastî meriv nikare qed kitêbeke bi herfên kurdan nivîsandî bibîne, lê dîsa jî meriv dikanibû çend rûpelên helbestên bi zimanê kurdî nivîsandî yên ketibûn ber bê bibîne, mîna yên ku wî begî pêş min kirin. Lêbelê, her çiqas min ji dil xwest jî ez bi ser neketim çend nusxeyên vê alfabeya kurdî ji xwe re bidim anîn. Ji xeynî çend herfan bi tamamî mîna farisî ye.” (Campanile, 1818: 116)

Analîza Foneman

Campanile, ji ber ku di nivîsandina kurdî de gelek şaşîfî kirine bi awayekî berbiçav kêmasiyên Maurizio Garzoni anîne zimên; gotiye wî gelek peyv di şûna *Şînê* de bi *Sînê* nivîsîne²⁶. Meriv dema li nivîsandina peyvên kurdî yên di kitêba Campanile de dinihêre, bi hêsanî dibîne ku di şaşnivîsandinê de qed ji hemkarê xwe bi şûn de nemaye.

Me herf, dîgraf û dîftongên alfabeya kurdî ya Giuseppe Campanile li gor peyvên kurdî yên li nav nivîsa wî ya îtalyanî û peyvên “Strana kurdan” a li dawiya kitêbê amade kirine.

Strana kurdan²⁷

Tabascen rescia rahana

Az nascem bekkam bejana

Jarkamen melaham delana

Ahh jarè pe mna scirini

Hale derde men tebini

Az cubkem ta na dit avini

Tabascen bia belava

Ta beskan ghertî konava

Jarkamen belek ciava

²⁶Campanile, rp. 117. Ji bo tekstê otantîk li Pêvek 3.1 Giuseppe Campanile binihêrin.

²⁷ Ev nav di tekstê resen da bi îtalyanî Canzoncina Kurda hatiye nivîsandin.

Transkrîpsiyona Tekstê Resen

Tebeşin reş a rehane

Ez naşê m bikem beyane

Yarkamin milehem dilane

Ax yarê pi mne şîrînî

Halê derdê min tibînî

Ez çubkim te ne dît avînî

Tebeşin bîa belave

Te biskan girtî kunave

Yarkamin belek çave

Bi Kurdiya Îro

Te bejin reş e rihan e

Ez naşê m bikim beyane

Yarka min melhema dilan e

Ax yarê bi min şîrîn î

Halê derdê min dibînî

Ez çi bikim te nedît havînî

Te bejin biya ber av e

Te biskan girtî xunav e

Yarka min belek çav e

Tablo 8: Bi Giuseppe Campanile Fonemên Kurdî

No	Dengdar	AFN	No	Dengder	AFN		
1	B	b	/b/, /p'/	1	A	a	/ɑ/, /ɛ/, /ʔ/
2	C	c	/ts/, /tʃ/, /k/, /k'/, /χ/	2		à	/ɑ:/
3	D	d	/d/	3	E	e	/i/, /ø/, /ɛ/
4	F	f	/f/	4		è	/i/
5	G	g	/g/, /dʒ/, /ʁ/	5	I	i	/i/, /i:/, /i/
6	H	h	/h/	6		ì	/i/
7	J	j	/j/, /i/	7	O	o	/o/, /ø/
8	K	k	/k/, /k'/, /χ/	8		ò	/o:/
9	L	l	/l/, /ʎ/, /r/	9	U	u	/u/, /u:/, /ø/
10	M	m	/m/	10		ù	/u/
11	N	n	/n/	No	Diftong		AFN
12	P	p	/p/, /p'/, /b/	1	ai		/ai/, /aji/
13	R	r	/r/, /r/	2	ao		/aw/
14	S	s	/s/	3	aù		/au/, /u:/
15	T	t	/t/, /t'/	4	ei		/ɛj/
16	V	v	/v/, /w/	5	ia		/ja/, /ija/, /jɛ/
17	Z	z	/z/	6	ie		/i/, /ij/
No	Dîgraf		AFN	7	io		/ijo/
1	aa		/ɑ:/	8	oi		/oi/, /oji/
2	gh		/g/				
3	hh		/χ/				
4	kk		/k/				
5	sc		/ʃ/				
6	zz		/z/				

1.4 FONEMÊN KURDÎ YÊN Î. NÎKOLAYEVÎÇ BEREZÎN

Recherches Sur Les Dialectes Persans

Îlya Nîkolayevîç Berezîn²⁸, profesore zimanê tirkî yê unîversîta Kazanê, sala 1853an kitêbek bi navê *Recherches Sur Les Dialectes Persans* (Lêgerînên li ser Zarên Farisan) nivîsiye. Kitêb bi sê rûpelên bê nimro û rûpelekî vala re li ser hev ji 162 rûpelî pêk tê. Beşa bingehîn a kitêbê ji xebata gramerî ya li ser 7 “Zarên farisan”²⁹ pêk tê:

1. Zarê tatî (rp. 4-24)
2. Zarê talişî (rp. 24-55)
3. Zarê gîlakî (rp. 55-75)
4. Zarê mazenderanî (rp. 75-99)
5. Zarê gebrî (rp. 100-118)
6. Zarê kurdiya rojhilatî³⁰ (rp. 118-138)
7. Zarê kurdiya rojavayî³¹ (rp. 138-158)

Analîza Foneman

Nivîskar ji bo dengên “zarên” persan binivîse û traskrîpt bike ji alfabeyên çar zimanên ewrûpî, almanî, îngilîzî, fransîzî, spanyolî, û rûsî sûd girtiye. Dengê /θ/ bi herfa *c* ya spanyolî ya li pêş dengderên *e*, *i* û *u* niv vokalên *y* ya ji bo eynî dengî; dengê /dʒ/ bi dîgrafa *dj* ya fransîzî ya ji bo peyvên ji zimanên biyanî; dengê /ʒ/ bi herfa *j* ya fransîzî ya ji eynî dengî, dengê /tʃ/ bi fonema *tsch* a almanî; dengê /h/ bi dîgrafa *ch* ya di zimanên almanî, fransîzî û îngilîzî de pê dengên ji hev cihê tîndir nivîsandin; dengê /x/ bi dîgrafa *kh* ya di fransîzî û îngilîzî de pê heman dengê zimanên biyanî tê nivîsandin, dengê /ʃ/ bi dîgrafa îngilîzî *sh* ya ji bo eynî dengî, dengê /ʒ/ bi dîgrafa *gh*

²⁸E. Bérésine, *Recherches sur les Dialectes Persans*, Université de Casan, Casan 1853. Nivîskar li ser kitêbê navê xwe li gor rastnivîsa fransîzî E. Bérésine nivîsiye.

²⁹Li gor Bérésine kurdî jî di nav da gelek zimanên îranî zarên farisî ne.

³⁰Bérésine, kurmanciya Xorasanê bi navê “Kurdiya Rojhilatî” bi nav kiriye.

³¹Bérésine, kurmanciya Mûsilê bi navê “Kurdiya Rojavayî” û “Kurmancî” bi nav kiriye. Nivîskar xebata Maurizio Garzoni ya li ser vî zarî referans nîşan daye.

ya di fransizî û îngilîzî de pê heman dengê zimanên biyanî, dengê /u:/ bi dîgrafa *ou* ya fransizî ya ji bo wî dengî nivîsiye. Ji bo nivîsandina dengên /ɑ:/, /ø/, /ɪ/, /u/ ji dengên rûsî û herfên roman îstîfade kiriye. Dengê /ø/ di gelek zimanî de heye, lê ji ber ku di wan zimanan da ne fonem e, di nivîsê da nayê nîşandayîn. Lêbelê di zimanê rûsî de fonem e. Rûs vê fonemê bi dîgrafa *ы* dinivîsin. E. Bérésine her çiqas di alfabe ya xwe ya transkrîpsiyonê de ev deng bi herfa *y* nîşanda be jî, di beşa kurdî de pê nenivîsiye. Ev deng bi herfên *e, i* û dîgrafa *ue* nivîsiye. (Bérésine, 1853: 118-158) Di beşên zarên kurdî de tenê peyva شور *shour* bi şaşitî bi trîgrafa *sch* nivîsiye. (Bérésine, 1853: 119)

Nivîskar ji ber nezaniya kurdî nikanibûye fêlên *bûn* û *hebûn* jî ji hev derbixîne. (Bérésine, 1853: 148) Di rewşên mesderî (infinitive), fermanî (imperative) û negatîv ên fêlan de gelek şaşitiyên wî bala meriv dikişînin. (Bérésine, 1853: 148-154) Li cihekî dibêje: “Divêt ez li xwe mikur bêm ku rewşa mesderî ji aliyê min ve hatiye peydakirin; ez dibêjim lazime di kurdî de mesder hebe.” (Bérésine, 1853: 155)

Transkrîpsiyona Tekstê Resen

1. xaniyê min ji kulî xaniyana çêtir e.
2. le şarê der xusûsê hûn gep pir dekin.
3. wextê ki nêzîk be şehrekî bûm espê min le gardêh ket.
4. tu tiştî nikaîm be hûn dehem.
5. ew kesê kî fikrê xe pere neke ehmaq e.
6. sevê her kesî tel’a her ro durust neh.
7. ev der xusûsê ve ez ji hûn depirsim kernevî muşkîl nineh.
8. her kes kî dexeze pirî bizane, beyd der pir bixwîneh³².

Bi Kurdiya Îro

1. xaniyê min ji kulî xaniyan çêtir e.
2. li şar der xusûsê we de pir gotinan dekin.
3. wexta ku nêzîkî şarekî bûm hespê min li erdê ket.

³² Ji bo tekstê otantik li Pêvek 4.2 binihêrin.

4. tu tişteki nikanim bidim we.
5. ew kesê ku fikra wî pere neke ehmaq e.
6. sewa her kesî her ro tali' tune.
7. eva ez ji we depirsim, kirina wê muşkiî nine.
8. her kesê ku dexwaze pir bizanibe divêt pir bixwîne.

Tablo 9: Bi Îlya Nîkolayevîç Berezîn Fonemên Kurdî

No	Dengdar	AFN	No	Dengder	AFN	
1	B	b	1	A	a	/a/, /ε/
2	D	d	2		a'	/ʔ/
3	F	f	3	E	e	/ø/, /ε/, /ɪ/
4	H	h	4		é	/ɪ/
5	J	j	5	I	i	/i/, /ɪ/, /ø/
6	K	k	6		ï	/i/
7	L	l	6	O	o	/o/, /ø/
8	M	m	7	U	u	/ø/
9	N	n	No	Diftong		AFN
10	P	p	1	ai		/ai/, /aji/
11	R	r	2	aia		/εja/
12	S	s	3	aï		/εj/
13	T	t	4	ia		/ja/
14	V	v	5	ie		/jε/
15	Z	z	6	oï		/ui/, /oi/
No16	Dîgraf		7	khoâ		/χw/
1	ch		No	Trîgraf		
2	dj		1	ngu		/ŋ/
3	ii		No	Katrîgraf		
4	gh		1	tsch		/ts/, /tʃ/
5	gu					
6	kh					
7	ou					
8	qu					
9	sh					
10	tt					
11	ue					

1.5 FONEMÊN KURDÎ YÊN PETER LERCH

Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaläer

Peter Lerch li ser xwestina beşa Fîlolojiya Akademiya Zanînê ya Împaratoriya Êris ji 7ê Adarê heta dawiya Gulana 1856an li bajarê Roslowê 11 heftan di nav hêsîrên kurd de li ser kurdî û du zarên wî, kurmancî³³ û kirmancî³⁴ kar kiriye. Di wê demê de ji bo karê xwe yê zimanzaniyê têra xwe materyal dane hev. Dema ji Roslowê veşandiyê, ji 20ê pûşperê heta 2yê tîrmeha wê salê li ser gelek aliyên kurdan raportek berfireh nivîsiye. (Lerch, 1857: III-XXX)

Peter Lerch du cîldên kitêba xwe ya bi navê *Forschungen Über Die Kurden Und Die Iranischen Nordchaläer* (Lêgerînên li ser kurdan û pêşiyên wan îraniyan keldaniyan bakurî) di salên 1857 û 1858an de li St. Petersburgê weşandiye³⁵. Kitêb ji du cîldan pêk tê. Cîldê pêşîn sala 1857an hatiye weşandin. Ev cîld tevî 11 rûpelên vala û 3 rûpelên bê nimro 156 rûpel e. Cîldê dudiyan sala 1858an hatiye weşandin. Tevî 7 rûpelên bê nimro û 7 rûpelên vala, 239 rûpel in. Her du cîldên kitêbê li ser hev 395 rûpel in.

Beşên sereke yên cîldê pêşîn:

1. Destpêk. Raporta li ser kurdên hêsîrên şer ên li bajarê Roslowê yê li ser şaredariya Smolenskê.
2. Tekstên kurdî yên li Roslowê berhevkirî li gel tercûma almanî
3. Pêvek. Tekstên kurdî yên ji Erzerom û Tebrîzê

³³Li deverên bi kurmanciya jêrîn (sorani) tê peyivîn zarê kurmancî di nav gel da bi navê kurdî tê binavkirin.

³⁴Peter Lerch navê vî zarê kurdî bi peyvên *zaza*, *zazaca*, *zazace* nivîsiye. Her çiqas di nav gel da li hinek deveran ev zar bi navên *zazakî*, *dimilî*; kesên pê dipeyivin jî bi navên *zaza*, *dimilî* bînin binavkirin jî, bi rastî navê vî zarî *kirmancî* (kirmanckî) û *kirdî* (kirdkî), kesên pê deng dikin jî *kirmanc* û *kird* in. Çimkî *Zaza* navê qebîleyek kurdan e. Ji bo malûmatên berfirehtir bn: Malmîsanij. *Kird, Kirmanc, Dimilî ya da Zaza Kûrtleri*, Deng yayinlari, 1996 Istanbul, rp. 23-24. Li ser vê rastiyê me navê kurdên bi vî zarî dipeyivin kirmanc û diyalakta wan jî kirmancî nivîsiye.

³⁵Peter Lerch eynî salê eynî kitêba xwe bi navê Пётр Лерх, 1857. *Исследования об иранскихъ курдахъ и ихъ предкахъ северныхъ халдеяхъ* (Izsedovaniya ob iranskikh kurдахъ i ikh predkakh, severnykh khaldeyakh) bi rûsî jî weşandiye.

Beşên sereke yê cîldê dudiyên ev in:

1. Destpêk
2. Vajnameya idiyomên kurmançî
3. Vajnameya idiyomên zazakî

Analîza Foneman

Li gor Peter Lerch di zimanê kurdî de 15 dengder û 30 dengdar hene. Ji dengdarên kurdî 4 fokal (faucals), 7 guttural (gutturales), 6 palatal (palatales), 8 dental (dentales) û 6 labial (labiales) in. Lerch dengder û konsonatên kurdî wisa li ser her du zarên kurdî parve kirine: Kurmançî: 9 dengder (5 dirêj, 4 kurt), 28 dengdar; li ser hev 37 fonem. Kirmançî: 9 dengder, 30 dengdar, li ser hev 39 fonem³⁶. Li gor nivîskar, kirmançî bi du dengdarên xwe ji kurmançî zengîntir e. Dengdarên *d'* û *n'* di kirmançî de hene, lê di kurmançî de tune ne³⁷.

Lerch herfên alfabeya pê bi kurdî nivîsiye ji alfabeya zimanzanî a zimanzan û misirzan (egyptologist) Richard Lepsius neqandine. (Lerch, 1857: XXIV) R. Lepsius di çapa 2an a heman kitêba xwe de di derbarê vê alfabeyê de gotiye, divêt herfên

³⁶Lerch hejmara dengderên kirmançî yê kurt û dirêj nenivîsiye. Li gor tabloya Peter Lerch 9 dengderên kurt 6 ên dirêj hene. Heke 9 dengderên kirmançî hejmara li ser hev a dengderên dirêj û kurt nebe, her neh dengder jî ên kurt bin, divêt em 6 dengderên dirêj jî bikin ser, wê gavê hejmara dengderên kirmançî dibe 15. Li gor vê rewşê di kirmançî da ne 39 deng, lê 45 deng hene. Balkêş e, nivîskar dema behsa zengîniya kirmançî kiriye ji behsa van 6 dengderan nekiriye. Dibe ku nivîskar bi şaşitî dengderên kirmançî kêm nîşan dabin. Dibe ku hejmara dengderên xwe di tabloyê da bi şaşitî zêde nivîsî be. Hejmara dengderên nivîskar nivîsîne û hejmara dengderên di tabloya nivîskar da hene hev û din nagire. Lîsta van herfan a di kitêba Lerch da wekî xwe di Pêvek 5.1 da heye.

³⁷Heta îro ji bilî Peter Lerch û hinek kesên bêyî ku liser fonolojiya vî zarê kurdî bixebitin ew referans dane ne tê da, zimanzan an jî filologên din behsa hebûna van her du dengdaran nekirine û negotîne dengên van ji yê *d* û *n* cihê ne. Bi awayekî berbiçav xwiya ye ev têngihîştineke şaş e. Lê, ev şaşitî nayê wê manê ku di zarên kurdî da dengên cihê tune ne. Bê guman di her du zarên kurdî, şêwezar û şêweyên (patois) wan da dengên ji hev cihê hene. Mesela di kirmançîya Dêrsimê da dengê /tθ/ heye; meriv dikare vî dengî bi dîgrafa *ts* binivîse. Heman deng di kirmançîya deverên din da /tʃ/ ye. Pîrsa kurmançî ya *Navê te çî ye?* di kirmançîya Dêrsimê da *Namê to tsko?* di kirmançîya deverên din da *Namê to çiko?* ye. Di nivîsa kirmançîya “standard” da ev deng nayê nîşandayîn.

Lerch **č** û **ǰ** bi herfên *č* û *ǰ* re werin guhertin. Lepsius dibêje wer xwiyaye zimanê kurdan li welatên çiyayiyên Kurdistan û Loristanê dibin pênc zarên sereke: zazakî, kurmancî, kelhurî, guranî û lorî. Dengên ku Peter Lerch bi herfên *d'* û *ń* nivîsîne di zazakî de hene, lê di kurmancî de tune ne. (Lepsius, 1863: 135-137) Wî bi xwe li ser ziman û zarên kurdî karekî zimanzanî an jî filolojîk nekiriye. Di çapa dudiyar a kitêba xwe de raman û pêşniyazên xwe yên li ser kurdî û alfabeya wî ya Peter Lerch sala 1857an li kurdî anîbûye bi kurtî anîne zimên. (Lepsius, 1863: 135-137)

Peter Lerch di heman kitêba xwe ya bi zimanê rûsî de xwendina herfên alfabeya xwe yek bi yek anîne zimên. Ji bo rind jê were têgihîştin li gel deng û herfên zimanê rûsî ji deng û zimanên ewrûpiyan, fransîzî, îngilîzî, almanî û hinek deng û herfên ebcada farisî jî îstîfade kiriye³⁸. Nivîskar ne peyvên xwe yên kurdî tenê bi van 45 herfan nivîsîne ne jî transkrîpsiyona xwe ya ji ebcada kurdî tenê bi van 45 herfan kiriye. Li dengdarên xwe tiştekî nû zêde nekiriye, lê di nivîsandina dengderan de bêpergaliyek zêde bala meriv dikişîne. Bi gelek herf û diftongan heman deng nivîsîne.

Peter Lerch bi herfên *d'*, *ǧ*, *ń* hinek peyvên kirmancî nivîsîne. Bi van herfan peyvên kurmancî nenivîsîne. Bi *d'* û *ǧ* pir kêr nivîsiye. (Lerch, 1857: 51) Dema meriv bide ber hev tê dîtin ku herfa *ń* li gor her du yên din zêdetir ji bo heman peyvê nivîsiye. Nivîskar dengê /k'/ ya kurd di hinek peyvên de bi herfa *k'* nivîsiye, lê bi piranî dengên /k/ û /k'/ bi herfa *k* nivîsiye. Çend caran peyva *dew* a zazakî bi herfa *d'* *d'ew* nivîsiye. Lê di dawiyê de ew jî rast kiriye, gotiye divêt bi herfa *d* were nivîsandin. Di heman rastkirinê de gotiye lazim e peyva *k'ir* jî bibe *kir*. Ji nivîsandina gelek peyvên wî tê têgihîştin ku nivîskar di têgihîştina van dangan û nivîsandina wan a bi dengdarên di alfabeya xwe de nîşan dane de bi ser neketiye. Dengê /h/ hema hema bi awayekî bi îstîqrar bi herfa *h'* nivîsiye. Lê yek caran dengê /χ/ jî bi vê herfê nivîsiye. (Lerch, 1858: 105) Di alfabeya wî de herfa *j* tune. Dîsa jî hinek peyvên xwedî dengê /j/ bi herfa *j* nivîsîne (Lerch, 1858: 11) Wer xwiyaye ev peyv bi şaşîfî bi tesîra zimanê almanî bi vê herfê nivîsiye. Ji ber ku di almanî de dengê /j/ bi herfa *j* tê

³⁸Пётр Лерх, *изследования об иранских курдахъ и ихъ предкахъ сьверныхъ халдеяхъ*, Санкт-Петербург 1857: 24-27.

nivîsandin. Peyvek xwe jî di şûna herfa *g* ya alfabeya roman de bi herfa *r* ya krîlî nivîsiye. (Lerch, 1857: 3) Xwiya ev şaşitiya jî ji bandora alfabeya rûsî ye. Nivîskar, hinek peyv û cumleyên kurdî yên ji kitêbên kurdzan û gerokên ewrûpî yên bi herfên roman hatine nivîsandin, herfên hempar wekî xwe hiştine yên din bi herfên alfabeya xwe ji nû ve nivîsîne. (Lerch, 1857: 3-14)

Lerch jî mîna kurdzanên berî xwe pir caran nikanibûye hinek dengên kurdî rind ji hev derbixîne. Mesela dema alfabeya Cl. J. Rich pê peyvên kurdî nivîsîne daye nîşandayîn dengên /ʔ/, /ʁ/, /h/ û /g/ li nav hev xistine. Rich bi dîgrafên *hh* û *gh* dengên /ʔ/ û /g/ nivîsîne, lê Lerch gotiye dengên /h/, /ʁ/ nivîsîne. (Lerch, 1858: 23-24)

Peter Lerch ebcada kurdî bi herfên xwe yên ji alfabeya standard a R. Lepsius re dane ber hev û fonemên kurdî careke din bi awayekî berfireh anîne zimên. (Lerch, 1858: 48-50)

Lêkolîna Peter Lerch a li ser xebatên kurdzaniyê

Peter Lerch li ser berhemên kurdzan, zimanzan, filolog û gerokên rojavayî yên berî xwe û hemdemên xwe karekî hêja kiriye. Ji Maurizio Garzoni heta Alexandre Jaba xebatên hemiyar di ber çavan re derbas kirine, berhemên wan ên di warê kurdzaniyê de bi berfirehî helsegandine. Ji berhemên van kurdzanên berî xwe herî zêde li ser *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda* ya Maurizio Garzoni xebitiye. Tekstekî di berhema Garzoni de li gel orîjînalê wê û rastkirina xwe ji nû ve nivîsiye û tercûmeyî almanî kiriye. (Lerch, 1858: 3-14)

Peter Lerch li gor kurdiya xwe tekstê M. Garzoni yê bi kurdî û tercûma wî ya bi îtalyanî bi herfên xwe³⁹ ji nû ve nivîsiye û bi almanî tercûme kiriye. (Lerch, 1858: 10-11) Ew li rastkirina şaşitiyên gramer û sentaksa Garzoni xebitiye, û bi peyv û

³⁹Peter Lerch ev herf ji ber xwe çênekirine; ji *Linguistic Alphabet* bi navê xwe yê din *Standard Alphabet* a zimanzan û misirzan R. Lepsius ji bo kurdî neqandine û pê karê xwe yê nivîs û transkripsiyonê pêk aniye. R. Lepsius dibêje, Peter Lerch alfabeya zarê zazakî amade kiriye. (Lepsius, 1863). Di rastiya xwe da, Peter Lerch ev alfabe ji bo nivîsandina her du zarên kurdî, kirmancî û kurmançî amade kiriye. Ji bo zanînek berfirehtir binihêrin: Lerch, 1857: 24-29; Lepsius, 1863: 135-137.

îdiyomên di dema karê xwe yê zimanzanî û filolojiya kurdî de hîn bûye lê xebitiye cumleyên wî ji nû ve binivîse⁴⁰.

Peter Lerch li ser nivîsandina peyv û cumleyên kurdî yê çardeh kesên ji kurdzan, zimanzan û filolog û gerokên ewrûpî yê ji 1787an heta 1857an pêk tînin analîzên berfireh kirine: bi kîjan herfan kîjan deng nivîsîne, li gor alfabeya standard a zimanzanî a R. Lepsius nîşan dane. (Lerch, 1858: 1-37) Nivîskar li ser tekstên kurdî yê ji Erzeromê ji aliye konsolosê ûris Alexandre Jaba ve ji Mele Mehmûdê Bazîdî û hinek melayên din ên Kurdistanê berhevkirî û bi navê *Recueil de Notices et Recits Kourdes*⁴¹ bi tercûma wan a fransîzî re di salên 1856-1858an de ji Akademia Împerial a Zanînan a li St. Petersburgê re şandî analîz kirine. Lerch li ser tekstên kurdî yê ji Tebrîzê jê re hatî şandin jî xebitiye. Li ser tercûma kurdî ya hinek helbestên helbestvanên farisan jî analîz kirine.

Nimûnên Axaftinê yê Bacmeister

Peter Lerch 44 cumleyên bi navê *Nimûnên Axaftinê Yê Bacmeister*⁴² ji almanî tercûmeyî kurmançî û kirmançî (zazakî) kirine. Ji bo ji fonem, deng, peyv û çêkirina cumleyên ku Lerch bi kurdî nivîsîne rindtir were têgihîştin pêwîst e meriv bi berfirehî li ser bixebite û rind bala xwe bidê. Her çiqas piraniya van 44 cumleyên kurmançî û kirmançî eynî bin jî, hinekên wan bi temamî ne eynî ne, lê ew jî nezîkî hev in; bi peyvekê an jî du peyvan ji hev diqetin. Yekcaran jî peyvên heman cumleyê di kirmançî de cihê hatine rêzkerin. Nivîskar ev cumle bi du awayî ji almanî tercûme nekirine. Dibe ku van çend cumleyên bi peyvekê du peyvan manên wan guherî, an jî peyvên wan mîna hev rast nehatine rêzkerin bala nivîskar nekişandîbin an jî zanîna

⁴⁰ Ji bo tekstê otantîk li Pêvek 5.2 binihêrin.

⁴¹*Recueil de Notices et Recits Kourdes* a Alexandre Jaba û Mele Mehmûdê Bazîdî di sala 1860î da bi heman navî li St. Petersburgê di nav weşanên Academie Imperiale des Sciences da hatiye weşandin. Heman berhem di sala 2010an da bi amadekariya Ziya Avcî li gel tekstên resen ên bi ebceda kurdî, bi tercûma fransîzî û rûsî ya Jaba û transkripsiyona bi tîpên roman a alfabeya Celadet Alî Bedirxan di nav weşanên Lîs da li Amedê bi navên *Camîeya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmançî û Adet û Rusûmatnameyê Ekradiye* hatine weşandin. Alexandre Jaba îdiyomên kurdî yê di nav tercûma xwe ya fransîzî da bi giranî bi alfabeya P. Lerch nivîsîne. Hinek jî li gor rastnivîsa fransîzî nivîsîne.

⁴² Binihêrin: Pêvek 5.3.

wî ya kurmancî û kirmancî têrî rast nivîsandîna wan nekiribe. Di vî warî de meriv dikare cumleyên 14 û 31 nimûne bide. Cumleya 14an: Kurmancî: *Ê yek dibeze, ê duduyan xwe hol dike, ê sisiyan distirê, ê çaran dikene*. Kirmancî: *Yew veriye vaz dano, ewe diyene pereno (kay keno), ewe hîrîne lawuk vano, ewe çeherîne howeno*. Tercûma almanî: *Der erste läuft, der zweite springt, der dritte singt, der vierte lacht*. (Lerch, 1857: 2) Nivîskar cumleya kurmancî ji almanî bi rêzê rast tercûme kiriye. Cumleya 31ê: Kurmancî: *Va teyra difire*. Kirmancî: *Ênoye teyr hiyêdikê fireno*. Tercûma almanî: *Dieser Vogel fliegt langsam*. (Lerch, 1857: 3) Nivîskar cumleya kirmancî ji almanî rast tercûme kiriye, ji ber ku di ya kurmancî de peyva *hêdika* tune ye; *langsam* a almanî tê mana *hyêdikê* ya kirmancî.

Transkrîpsiyona Tekstê Resen

TERCÛMA “NIMÛNÊN AXAFTINÊ” YÊN BACMEISTERS⁴³ BI ZARÊN KURDAN, KURMANCÎ Û ZAZAKÎ

	Kurmancî	Zaza
1	Xudê namire.	Ellah ne meren'u
2	Merû sal pur tenare.	Merdum 'emerê yaê qîlmu
3	Dîa kûlfetan j wan hâz dike.	Daîke eîlane (eîlekanê) xwe zaf sênen'a
4	De memikê wêda şîr pur heîye.	Çîce yaê zaf şîd estu.
5	Mêrê wê je hâz dike.	Myêrde yaê has ken'u
6	Va jînkî be hamile.	Aya cenî hemleya.
7	De şeş ruanda laukîk weledand.	Şeş roce yeu lac ard.
8	Dahe nexoşe.	Dahe ne weşa.
9	Qîza wê li cem rûniştîe digrî.	Keîna yaê het rûniştîa bermen'a.
10	Kûlfet çîçikan nagre.	Lace çîce ne wen'u.
11	Keçîk dahe nagere.	Keîna hem'a paî ne şuen'a.
12	Salîk û du mehin weledandîe.	Yeu sere di aşme bîa.
13	Va her çar laukana xweşin.	Ên'ie çehêr hem'e lacê weşê.
14	Eyek debêze, edudûan xwe xol	Yeu verîe vaz danu, eûe dîene peren'u

⁴³Hartwig Ludwig Christian Bacmeister di salên 1773an da li Petropoliyê, li Rûsyayê bi navê *Idea et Desideria de Colligendis Linguarum Speciminibus* bi çar zimanan, latînî, rûsî, fransîzî û almanî, 44 cumle nivîsîne û weşandine. Ev 44 cumle bi navê “Nimûnên Axaftinê” yên Bacmeister tînin binavkirin. Peter Lerch ew tercûmeyî kurmancî û kirmancî kirine. Ji bo tekstê resen ê ji aliyê Lerch ve hatî tercûmekirin li Pêvek 5.4 binihêrin.

	dike, esisian distere, eçaran deken'e.	(kaî ken'u) eûe ħîrîne lauk vano, eûe çeherîne ħowen'u.
15	Va merûa kû'ire.	Ên'oe merdûm çimê yaê (caê) korê.
16	Jina wî kere.	Ceniaê yaê (caê) kera.
17	Ek em debêjin nabiste.	Vengê me (Sekê ma vacê) neşna wen'a.
18	Bera'ê te dekûl'e.	Beraê tû'e pureş neiyen'u.
19	Ho'enga te ra ket.	Waê tû'e ra keûta.
20	Bavê wan êpaye.	Baûkê şima hayaû rû'eniştu.
21	Hindik duxwe veduxwe.	Tanekê wen'u.
22	Bîvil de nav rûdaye.	Zinc ħa myane sûrotide.
23	Her merûkê du lingê (ningê) wî henin, her destkê pênc bêçî wê henin.	Di lingê ma estê, hergu destê made panc êngîştê estê.
24	Por le ser serî heîşîn debe.	Gijik serede yen'u.
25	Zeman dedan de devdanin.	Dendanê zuan ha fekde.
26	Pîe raste j pîe çepe xûrtere.	Destu raşt quetu seê destê çepê.
27	Pûrtik derêje zerave.	Yeu mûye dega baryeka.
28	Xu'in sore.	Go'enî sûra.
29	Hastîan fenê kevran heşkin.	Êsteê seê kerê saxê.
30	De masîda çav heîye, goh tun'e.	Masede çimê estê, goşiyê çinê.
31	Va teîra defer'e	Ên'oe teîr hyedikê feren'u.
32	Le ser ardeda tê.	Nêşen'u ardda.
33	Le perê wê da perê reş henin.	Pelê teîrêde mû'î sîaî estê.
34	Darê perê hêşîn henin, gilê gir henin.	Darede velgo teze, gilê hişuê estê.
35	Va teîra nekûlkê wê derêj heîye, boça wê qine.	Ên'oe teîr nakure baryek esta, bo'eçe qilme esta.
36	Hêlîna wîda ħêkê sepî henin.	Halyêne wêda ħakî sepî estê.
37	Ar deşeu'ute, em tutûne, gorê, reşû debînin.	Adir veşen'u, du, qile, komur me vîen'ê.
38	De çaîda av zû dere.	En'a lade aûke leze şuen'a.
39	Hîv je êstîrkan gîrtere, j roe puçûktere.	Aşme estarera pîla, rocera qîca.
40	Do evarê baran barî.	Vizyêrê şande varan vera.
41	Îro sebêda pîşta fatman nêbîa me dî.	Eîro seba me mûndîaê aîşma fatma dîa.
42	Be şev tarîe, be ro ruanîke.	Şeu tarîu, roc roştu.
43	Em be kurmançî debên (debêjin)	Ma kalê beki zazace.
44	Hun be kurmançî zanin?	Şima zazaca zanê?

Bi Kurdiya Îro

	Kurmançî	Kirmançî
1	Xwedê namire.	Homa nê mireno.
2	Meriv sal pir tê nare.	Merdim emrê yaê qilm o.
3	Dayîk ji zarên xwe hez dike.	Daîke domananê xwe zaf hez kena.
4	Di çiçikê wê da şîr pir heye.	Çice yaê zaf şîd esto.
5	Mêrê wê jê hez dike.	Merde yaê has keno.
6	Va jinka bi heml e.	Aya cenî hemle ya.
7	Di şeş rojan da lawikek anî.	Şeş roce yew lac ard.
8	Daha nexweş e.	Daha nêweş a.
9	Qîza wê li cem rûniştiye digrî.	Keyna yaê het rûniştî bermena.
10	Law çiçikan nagre.	Lace çice nêweno.
11	Keçik daha nagere.	Keyna hema pay nêşona.
12	Salek û du meh in aniye.	Yew sere di aşme biya.
13	Van her çar lawkanan xweş in.	Êniye çêher heme lacê weş ê.
14	Ê yek dibeze, ê duduwana xwe hol dike, ê sisiyan distirê, ê çaran dikene.	Yew veriye vaz dano, ewe diyene pereno (kay keno), ewe hîrîne lawuk vano, ewe çêherîne howeno.
15	Va merûya kwir e.	Ênoê merdim çimê yaê (caê) kor ê.
16	Jina wî ker e.	Ceniaê yaê (caê) ker a.
17	Ek em dibêjin nabihîse.	Vengê ma (Sekê ma vacê) neşna wena.
18	Birayê te dikule.	Birayê toye pureş nêyeno.
19	Xwenga te raket.	Wayê toye rakewta.
20	Bavê wan ê payî ye.	Bawkê şîma hayaw rûniştî.
21	Hindik dixwe vedixwe.	Tanekê weno.
22	Bîvil di nav rû da ye.	Zinc ha miyanê sûroti de.
23	Her merivekî du lingên (ningên) wî henin, her destekî pênc pêçiyên wî henin.	Di lingê ma estê, hergu destê ma de panc êngîştê estê.
24	Por li ser serî hêşîn dibe.	Gijik sere de yeno.

25	Ziman, dedan de dev da nin.	Dendanê ziwan ha fek de.
26	Piyê rastê ji piyê çepê xurttir e.	Desto raşt quwet o seyê destê çepê.
27	Pûrtik dirêj e zirav e.	Yew mûye derg a baryek a.
28	Xwîn sor e.	Gonî sûr a.
29	Hestî fena keviran hişk in.	Êsteyê seyê kerre saxê.
30	Di masî da çav heye, guh tune.	Mase de çimê estê, goşîye çînê.
31	Va teyra difire.	Ênoye teyr hyedîkê fireno.
32	Li ser erdê da tê.	Nişeno ard da.
33	Di nav perrên wê da perrên reş henin.	Pelê teyrê de mûyî siyahî estê.
34	Darê perrên hêşîn henin, guliyên gir henin.	Darê de velgo teze, gilê hişuwê estê.
35	Va teyra nukûlekî wî yê dirêj heye, boça wî kin e.	Ênoye teyr nakure baryek esta, boçe qilme esta.
36	Hêlîna wî da hêkên spî henin.	Halyêne wê da hekî spî estê.
37	Agir dişewite, em tutûne, gorê, reşu dibînin.	Adir veşeno, du, qile, komur me viyenê.
38	Di çayê da av zû dere.	Ena lade awke leze şona.
39	Hîv ji stêrkan girtir e, ji rojê piçûkter e.	Aşme estare ra pîl a, roce ra qic a.
40	Duh êvarê baran barî.	Vizyêrê şande varan vera.
41	Îro sebê me piştî fatman nebiya dît.	Eyro seba me mûndiyayê ayşma fatma diya.
42	Bi şev tarî ye, bi roj ronik e.	Şew tarî yo, roc roşt o.
43	Em bi kurmancî dibên (dibêjin)	Ma qalê bikê zazakî.
44	Hûn bi kurmancî zanin?	Şima zazakî zanê?

Tablo 10: Bi Peter Lerch Fonemên Kurdî

No	Dengdar		AFN	No	Dengder		AFN
1	B	b	/b/	1	A	a	/ε/, /a/, /a:/,
2	D	d	/d/	2	Á	á	/ʔ/
3	Ḑ	ḑ	/dʒ/	3	Ā	ā	/a:/
4	D'	d'	/d/	4		ā	/a:/
5	F	f	/f/, /v/	5	E	e	/ɪ/, /ø/, /ε/
6	G	g	/g/	6	Ē	é	/ε/
7	Ĝ	ĝ	/g/	7		e	/ε/
8	H	h	/h/	8		e	/ε/
9	H'	h'	/h/	9		e	/ε:/
10	J	j	/j/	10		ē	/ɪ/
11	K	k	/k/, /k'/	11		ē	/ɪ:/
12	Ķ	ķ	/k'/	12	I	i	/i/, /ɪ/, /ø/
13	L	l	/l/, /ʎ/	13		I	/i/
14	M	m	/m/	14		i	/i:/
15	N	n	/n/	15		i	/ø/
16	Ñ	ñ	/n/	16		í	/ø:/
17		ñ	/n/	17	O	o	/o/, /e/
18	P	p	/p/, /p'/	18		ó	/o:/
19	Q	q	/χ/	19		o	/o/
20	R	r	/r/, /r/	20		ō	/o:/
21	S	s	/s/, /ʃ/	21		ó	/o:/
22	Š	š	/ʃ/	22	U	u	/ø/, /u/, /o/
23	T	t	/t/, /t'/	23		ú	/u:/
24	T'	t'	/tʃ/	24		ū	/u:/
25	V	v	/v/, /u/, /ø/	25		ú	/u:/
26	W	w	/z/	26		u	/ø/
27	X	χ	/χ/	27		ú	/ø:/
28		γ	/ɣ/	No	Diftong		AFN
29	Y	y	/j/	8	óe		/oi/
30	Z	z	/z/	9	oí		/oi/, /oj/
31	Ž	ž	/ʒ/	10	ua		/uja/, /uwa/
32		Γ	/g/	11	úā		/əwa/
No	Diftong		AFN	12	uá		/əwa/
1	ei		/ej/	13	úi		/ui/
2	eí		/ej/	14	xó		/χw/
3	ia		/ija/, /ije/				
4	ía		/ija/, /ije/				
5	ío		/ijo/				
6	ia		/ija/				
7	oá		/oa/				

1.6 FONEMÊN KURDÎ YÊN ALEXANDER CHODZKO

Études Philologiques Sur La Langue Kurde (Dialecte de Soléimanié)

Alexander Chodzko di nîvê pêşînê sedsala 19an de li Xorasan, Alamût, Hemedan, Gerûs, Textî Silêman, Maraga û li ber gola Şahî geriyaye, li gelek eşîrên kurdan bûye mêvan. Di vê demê de gelek îdiyomên kurdî berhev kirine. Lê berî Ahmed Xanê ji eşîra Bêbê⁴⁴ (Chodzko, 1857) ya Silêmaniyê here Parisê û wî nas bike nikanibûye bi awayekî bi rêk û pêk li ser van îdiyomên xwe bixebite. Nivîskar bi gotina xwe sala 1853an bi nasîna Ahmed Xan re dest bi nivîsa xwe ya bi navê *Études Philologiques Sur La Langue Kurde (Dialecte de Soléimanié)*⁴⁵ kiriye û salekê şûnda, di 1854an de qedandiye. Chodzko ev gotara xwe sala 1857an di kovara *Journal Asiatique* de li Parisê weşandiye. Ahmed Xan piraniya tekst di ber çavan re derbas kiriye û gelek jî bi destê xwe nivîsiye. (Chodzko, 1857) Zarê kurdî yê li ser hatiye xebitîn kurmanciya jêr e.

A. Chodzko di destpêka gotara xwe de bi berfirehî kurdan û zimanê kurdî dide naskirin. Nivîskar tekstên xwe yên kurdî pêşiyê bi ebcêda farisî nivîsîne, paşê bi tercûma lîteral tercûmeyî fransizî kirine û bi alfabeya roman tekstên kurdî transkripsiyon kirine. *Études Philologique Sur La Langue Kurde (Dialecte de Soléimanié)* ji sê beşên sereke pêk tê:

I. Etîmolojî⁴⁶: Alfabe

II. Peyvên Kurdî:

1. Nav

2. Artîkel

⁴⁴ Navê vê eşîrê yê rastîn eşîra Baban e. Li gor Chodzko dibêje, Ahmed Xan paşayê çaran ê mîrektiya Baban bûye.

⁴⁵ Xebatên Filolojîk li ser Zimanê Kurdî (Zarê Silêmaniyê). Alexander Chodzko şêwezarekî kurmancî, kurmanciya jêr (sorani), bi navê Zarê Silêmaniyê bi nav kiriye.

⁴⁶ Herçiqas Chodzko navê vê beşa etîmolojî danibe jî, tê da gotinek li ser etîmolojîyê tune. Nivîskar di vê beşa nivîsa xwe da ramanên xwe yên li ser alfabe, xwendeyî û nexwendeyiya kurdan bi kurtî anîne zimên.

3. Sifet

4. Hejmarî

5. Zemîr

6. Fêl

7. Zerf

III. Cumlezanî

1. Peyivîn

2. Helbest

Bi gotina Alexander Chodzko, Ahmed Xan bi qasî zimanê osmanî û farisî zanibûye zimanê eşîra xwe nizanibûye. Ji ber vê yekê jî nexwestiye ewqas materyalên filolojî yên Ahmed Xan jê re bi devkî gotine hema biweşîne, xwestiye di vî warî de bi hinek kesên zana bişêwîre. Ahmed Xan soz daye Chodzko de ku wî bi Molla Hêzir bi navê xwe yê mexlesê edebî Nêalî Efendî re bide naskirin. Nêalî Efendî di wan deman de gramerek erebî tercûmeyî kurdî kiriye. Nêalî Efendî li ser zarên kurdî jî serketî bûye. Lê ji nedî ve ji Constantinoplê (Stenbol) bangî Ahmed Xan kirine. Nivîskar peyvên di kitêba Maurizio Garzoni û hinek peyvên wî bi xwe ji nav kurdan berhevkirî şanî Ahmed Xan kirine. Li gor nivîskar ji ber rastnivîsa îtalyanî û cihêtiya zarê Amediyê⁴⁷ van peyvên gelekî mamostê wî Ahmed Xan xistine aloziyê; nikanibûye rind jê têbigihê. Ji ber vê yekê navê “Zarê Silêmaniyê” li nivîsa xwe zêde kiriye. Li ser çûyîna Ahmed Xan a Stenbolê, nivîskar êdî nexwestiye li benda Nêalî Efendî bimîne, nivîsa xwe wekî xwe bi rewşa xwe ya seretayî weşandiye. (Chodzko, 1857)

⁴⁷Nivîskar bi navê Zarê Amediyê qala kurmanciya jor (an jî behdîni) dike. Ji ber ku cumle, peyv û îdiyomên Garzoni bi kurmanciya jor in.

Analîza Foneman

Chodzko dibêje, kurdên xwende zimanê xwe yê maderî rind nizanin. Ji otorîtên xwe re û ji hev û din re ya bi farisî ya bi tirkî ya jî bi erebî dinivîsin. Eger yek caran neçar bimînin bi kurdî binivîsin bi arîkariya alfabeya farisî dinivîsin. Bi rastî dengdarên farisan û yên kurdan eynî ne, bi kêmasî ji bo zarê Silêmaniyê ev wisa ye, lê di vî zarî de gelek dengder û diftong hene ku ne mimkûn e meriv bikanibe wan bi rastnivîsa heyî ya farisan binivîse. Mesela di peyvên kurdî de meriv pir caran rastî diftongên *ae, ee, oo, aou, eeou, âouaoue* û *hd. tê* ku bê dengdar li pey hev rêz dibin. Ahmed Xan çawa ev nivîsîne ez dê jî wer binivîsim, tenê ez dê bi îtîna her peyvekê û hêjahiya wê ya fonetîk li gor herfên fransizî transkrîpsiyon bikim. (Chodzko, 1857)

Alexander Chodzko dengê /ʔ/ qed nenivîsiye, dengê /h/ jî tenê di peyvekê de, ew jî bi dîgrafa dengê /χ/ bi *kh* nivîsiye. Meriv nikare bibêje haya nivîskar ji van her du dangan tunebûye, di tekstê resen ê bi ebceda farisî hatî nivîsandin de ev her du deng jî hene. Dibe ku ji sebeba ev her du deng di fransizî de tune ne, nivîskar pêwîstî pê nedîtibe ji nivîsandina wan re çareyekê bibîne.

Transkrîpsiyona Tekstê Resen

INFINITIF

kirdine⁴⁸

PARTICIPE PASSE

kirde

PRESENT ET FUTUR

dekem

dekey

deka

⁴⁸Ji bo tekstê resen bn. Pêvek 6.1

dekêyne

dekêite

dekane

IMPARFAIT ET CONDITIONEL

dem kirt

dett kirt

dêyî kirt

deman kirt

detane kirt

deyiyane kirt

PRETERIT

kirdim

kirditt

kirdî

kirdimane

kirditane

kirdiyane

PLUS-QUE-PARFAIT

kirdê bûm

kirdê bût

kirdê bûyî

kirdê bûmane

kirdê bûtane

kirdê bouyiyane

IMPERATIF

dekê

beka

bekîne

bekeyît

bekent

PROHIBITIF

mekê

neka

nekîne

nekeyît

nekiyent

Tablo 11: Bi Alexander Chodzko Fonemên Kurdî

No	Dengdar		ANF	No	Dengder		ANF
1	B	b	/b/	1	A	a	/ɑ/, /ɛ/
2	C	c	/s/	2		â	/ɑ:/
3	D	d	/d/	3	E	e	/ɛ/, /ø/
4	F	f	/f/	4		é	/ɛ/
5	G	g	/g/	5		é	/ɪ/
6	H	h	/h/	6		è	/ɛ/
7	J	j	/ʒ/	7		è	/ɪ/
8	K	k	/k/, /q/, /kʰ/	8	I	i	/i/
9	L	l	/l/, /l̥/	9	O	o	/o/, /ø/
10	M	m	/m/	10		ô	/o:/
11	N	n	/n/	11	U	u	/ø/
12	P	p	/p/, /pʰ/	No	Diftong		ANF
13	Q	q	/k/, /q/	1	aï		/ai/
14	R	r	/r/, /r̥/	2	âï		/ɑ:i/
15	S	s	/s/	3	aou		/aw/
16	T	t	/t/, /tʰ/	4	âou		/ɑ:w/
17	V	v	/v/	5	ei		/ei/, /ej/
18	Y	y	/ø/	6	ia		/ja/
19	Z	z	/z/	7	oa		/øw/
No	Dîgraf		ANF	8	ou		/ɛw/
1	ee		/ɪ/	9	oue		/ow/
2	ou		/w/, /o:/	10	oï		/oi/
3	ch		/ʃ/	No	Trîgraf		ANF
4	dj		/dʒ/	1	tch		/tʃ/
5	gh		/ɣ/				
6	gu		/g/				
7	kh		/x/, /ħ/				
8	tt		/t/				

1.7 FONEMÊN KURDÎ YÊN ALEXANDRE JABA

Ballade Kurde

Alexandre Auguste Jaba, konsolosê ûris ê Erzeromê, berhema xwe ya pêşîn a ji folklorê kurdan sala 1859an bi navê *Ballade Kurde* (Hîkayeta kurdî) di hejmara 14an a kovara *Journal Asiatique* de weşandiye. Alexandre Jaba dema li Erzeromê konsolosê Împaratoriya Êris bûye ev berhema folklorîk berhev kiriye, ji ebcêda kurdî transkrîpsiyonî alfabeya roman kiriye û ji kurdî tercûmeyî fransîzî kiriye. Tekst bi zarê kurmanciya jor e. Li ser evîna Siyahmedê Silivî û Şemsa Tîmûr Paşayê Millî ye. (Jaba, 1859)

Transkrîpsiyona Tekstê Resen

HÎKAYET⁴⁹

Di weqtê Temir Paşayê Millî ku îskiyanaşî

Bûye we malêd wan havînan ji beriê

Dihatine zozanêd Bîngolê ji tayîfa

Sîlîwanêd Diyarbekrê lawekî qewî jê

Hatî we behusûn we camêr lakîn bêhal û mal

Navê Siyahamed dibêjin ew law têtên we dibite

Ûulamê Temir Paşayê Millî we mudeyekê di xîzmeta

Temir Paşa da dimîne keçke Temir Paşa jî hebûye

Şanzde hefde salî navê Şemsê qewî zêde

Xoyî husun we rind we sijiehî halê cuwaniê ye

Malûm wusa diqewume ew Siyahamedê

⁴⁹ Ji bo tekstê otantîk li Pêvek 7.1 binihêrin

Sîlîvî we Şemsê kiça Temir Paşae
Millî hez ji yekûdu dîkin we hevdu
Dihebînî eydî roj be roj evîna
Wan zêde bûyî Siyahamed dizane
Ku Temir Paşa beyxtiyarî kiça xu nadête
Siyahamedî lewranî ew kurmanc e we xulamê wî ye
We ew be xo Îskanbaşî we Paşa ye we agirê
Evînê jî def'e nabê rojekê Siyahamed dibêje (Jaba, 1859)
...

Ji Ebcada Kurdî Transkrîpsiyona Tekstê Resen

Hîkayet

Di weqtê Tîmûr paşayê Millî ku îskanbaşî⁵⁰bûye û malêd wan havînan ji beriyê dihatine zozanêd Bîngolê ji tayfa Silîwanîdê Diyarbekrî lawekî qewî jêhatî û bi husn û camêr lakîn bê hal û mal navî Siyahmed dibêjinê ew law têtin û dibite xulamê Tîmûr paşayê Millî û mideyekê di xizmeta Tîmûr paşa de dimîne. Kiçekî Tîmûr paşa jî hebûye şanzdeh hefdeh salî navî Şemsê qewî zêde xweyî husn û rind û spehî halê cuwanîyê ye m'elûm wusa diqewime ev Siyahmedê silîwî û Şemsê keça Tîmûr paşayê Millî hez ji yek û du dîkin û hevdu dihebînî êdî roj bi roj evîna wan zêde bûyî Siyahmed dizane ku Tîmûr paşa baxtiyarî keça xwe nadête Siyahmedî lewranî ew kurmanc e û xulamê wî ye û ew bi xwe îskanbaşî û paşa ye û agirê evînê jî def'e nabê rojekê Siyahmed dibêje ...

⁵⁰Ev peyv di tekstê bi ebcada kurdî da di cumleyê pêşîn da bi şaşîti *eskalebaşî* hatiye nivîsandin.

Recueil de Notices et Récits Kourdes

Alexandre Jaba sala 1860î tekstên kurdî yên li ser ziman, edebiyat û eşîrên Kurdistanê yên Mele Mehmûdê Bazîdî jê re nivîsîne, tertîb kirine, tercûmeyî fransizî kirine û bi navê *Recueil de Notices et Récits Kourdes* li St. Petersburgê weşandine. Navê vê kitêbê yê bi kurdî *Camîeya Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî* ye. Alexandre Jaba îdiyomên kurdî yên di nav tercûma xwe ya fransizî de bi fonemên fransizan û fonemên Peter Lerch nivîsîne. Peyvên kurdî yên di nivîs, jêrenot û şîrovên xwe de bi fonemên fransizî nivîsîne, yên raste rast ji tekstên kurdî yên Mele Mehmûdê Bazîdî girtine nav tercûma xwe ya fransizî, ne bi giştî, lê bi piranî bi fonemên Peter Lerch nivîsîne. Jaba ji bo nivîsandina herfên di ebceda kurdî de hene lê di ya fransizan û ya Peter Lerch de tune ne jî çareyek dîtiye. Mesela dengê /t/ ya Bazîdî bi herfa ط nivîsiye Jaba bi digrafa th nivîsiye. (Jaba, 1860: 1)

Ji Ebceda Kurdî Transkrîpsiyona Tekstê Resen

camî'eya rîsaleyan û hîkayetan

bi zimanê kurmancî

tertîb û bi zimanê frensiyeyî tercûme dikir

eskender jaba

ku qonsolê împaratorî 'ezîmê ûris di erzeromê da ye

di bajêrê peterbûrxê da

di darel teba'eta akademiayê împaratorî da

di tarîxa hezar heşt sed û şêstê î'sûsî

ku salê 1277ê hîcrî ye

evê kitabê teb'i kirin⁵¹

⁵¹ Ji bo tekstê resen ê bergê kitêba Camî'eya rîsaleyan û hîkayetan bn. Pêvek 7.2

Bi Kurdiya Îro:

Berhema peyam û çîrokên bi zimanê kurmancî

Amadekirin û tercûma bi zimanê fransizî: Alexandre Jaba, konsolosê Împaratoriya Mezina Êris, li bajarê Erzeromê.

Ev kitêb sala 1860ê zayînî, 1277ê koçî, li St. Petersburgê çap bûye.

Dictionnaire Kurde-Français

Ferdinand Justi sala 1879an *Dictionnaire Kurde-Français* ya Auguste Jaba li St. Petersburgê weşandiye. Jaba destnivîsa vê berhema xwe ya sala 1867an spartiyê Académie Impériale des Sciences. Paşê li *Vocabulaire Kurde* (Vajnameya kurdî) a xwe *Dictionnaire Français-Russe-Kurde* (Ferhenga fransizî-rûsî-kurdî) zêde kiriye û zengîntir kiriye. Ferdinand Justi peyvên kurdî-fransizî yê viyana dawîn di *Dictionnaire Kurde-Français* ya Jaba de bi cih kirine, lê ev ferheng ne li gor destnivîsa wê ya 1867, ne jî tenê li gor beşa wê ya kurdî-fransizî amade kiriye. Ji tekstên Jaba spartîne û destnivîsên gramerên Akademiyê jê re peyda kirine gelek peyv derxistine û gelek jî lê zêde kirine. Bi vî awayî jî berhemên kurdzanên berî xwe jî gelek peyv girtine û di vê ferhengê de bi cih kirine.

Bi Ferdinand Justi Nerastiya Fonemên Jaba û Bazîdî

Ferdinand Justi dibêje, Jaba di xebata xwe ya ferhengî de herfên ebceda kurdî bi herfên alfabeya fransizî transkrîpsiyon kiriye, mesela *š* bi *ch*, *χ* bi *kh*, *u* û *ū* bi *ou* nivîsîne. (Jaba, 1879: IV)

Li gor Ferdinand Justi gelek peyvên destnivîsa *Dictionnaire Kurde-Français* ya Auguste Jaba û tekstên kurdî yê Melayê Kurd⁵² şaş hatine nivîsandin. Ji ber ku Jaba hema hema qed bala xwe nedaye koka peyvvan, li ser etîmolojiya wan kar nekiriye, nikaribûye rê li ber rastnivîsa şaş a peyvên kurdî bigire. Justi xwestiye bi helsegandinek etîmolojîk hem peyvên bi ebceda kurdî hem jî transkrîpsiyonên wan

⁵²Mele Mehmûdê Bazîdî

ên bi herfên roman rast bike. Wî di 8 xalan de şaş nivîsandina peyvên Jaba û Mele Mehmûdê Bazîdî anîne zimên, û gotiye: 1. ع û ا ; 2. ط û ت ; 3. ق û ك ; 4. ز. ذ. ض. ظ û س ; 5. ظ û ص ; 6. د. ط. ض û ط ; 7. غ û ك ; 8. ح û ه. Ji ber nezaniya etîmolojiya peyvên di şûna hev de hatine nivîsandin. Justî, nimûnên peyvên rast nehatine nivîsandin û rastiya wan a li gor van heşt xalan di pêşgotina xwe ya *Dictionnaire Kurde-Français* ya A. Jaba de bi berfirehî anîne zimên⁵³.

Rastî û Nerastiya Fonemên Kurdî yên Jaba û Bazîdî

Mele Mehmûdê Bazîdî herfên ع û ا ; ط û ت ; ق û ك ; ز. ذ. ض. ظ û س ; د. ط. ض û ط ; غ û ك ; ح û ه. di şûna hev de nivîsîne. Ji ber ku dema peyvek ji zimanekî derbasî zimanekî din dibe her carê dengên xwe yên zimanê jê çûye nikare di zimanê ketêyê de biparêze, li gor dengên zimanê nû dikare biguhere û bibe xwedî dengê nû. Bi hezaran peyvên zimanên hînd-ewrûpî ji heman kokê tîn, lê di her ziman, heta di gelek zarên zimanên vê famîla zimanan de ji hev cihê tîn nivîsandin û tîn xwendin.

Li gor F. Justî divêt peyvên erebî û farisî yên di kurdî de mîna xwe werin nivîsandin, bi herfên cihê neyên nivîsandin. Ev nihêrîn ji bo peyvên telafûza wan a di zimanê peyv daye û zimanê peyv girtî de eynî be, bê guman rast e. Lê heke telafûza peyvê di her du zimanan de ne wekî hev be, wê gavê divêt ne li gor zimanê jê hatî, lê li gor telafûza xwe ya di zimanê ketêyê de were nivîsandin. A. Jaba peyva *tîr* طير nivîsiye, lê F. Justî gotiye ev ne rast e divêt تير were nivîsandin. Peyva *tîr* ji *tîgra* farisiya kevn tê. Rûbarê ku ereb jê re *dîcle* dibêjin, sasaniyan bi pehlevî jê re *ehvend* gotine bi avestî *tighri* ye. Gelo wan deman ev peyv mîna Jaba nivîsiye bi dengê /t/ an mîna Justî nivîsî bi dengê /t'/ hatiye gotin rind nayê zanîn. Peyva *tîr* bi kurmancî mîna Jaba nivîsiye tê gotin. Lê di farisî de mîna Justî nivîsiye tê nivîsandin. Gelek peyvên kurdî û farisî pir caran bi dengê ji hev diqetin. Mesela piraniya peyvên farisî yên bi dengên /d/, /z/ û /h/ tîn gotin di kurdî de bi /z/, /ʒ/ û /s/ tîn gotin.

Jaba *thirs* طرس nivîsiye, Justî *tirs* ترس nivîsiye. Ev peyv di zarê kurmancî de mîna Jaba nivîsiye tê gotin, di kirmancî de mîna Justî nivîsiye tê gotin. Pir caran dengên di zarê kirmancî de hewadar in di zarê kurmancî de nehewadar in. Piraniya

⁵³Jaba, 1879, rp. VI. Ji bo tekstê otantîk ê li ser vê mijarê li Pêvek 7.4 binihêrin.

peyvên kurmancî ji aliyê fonetîk ve bê guman ji yê kirmancî nûtir in. Dema meriv li gor nûbûn û kevnûna peyvan dengên rasttir helbisengîne û rastnivîsa wan diyar bike bê guman meriv dikare bibêje bi vî awayî nivîsandina vê peyvê rasttir e. Peyva ‘*erd* a ku Jaba *عرد* nivîsiye Justî kiriye *ارض*. Rast e ev peyv di erebî û farisî de mîna Justî tê nivîsandin û xwendin. Piraniya kurmanç û kirmancan vê peyvê mîna Jaba nivîsiye dibêjin û dinivîsin. Dengê /d^f/ ya ereb bi herfa *ض* dinivîsin ne di kurdî de ne jî di farisî de heye. Faris peyvên erebî mîna ereban dinivîsin, lê mîna xwe dixwînin; kurd van peyvan çawa dibêjin wer dinivîsin. Di kirmanciya Dêrsimê de pirraniya peyvên li deverên din bi dengê /ʔ/ tîngotin diguhere dibe /h/, ji ber vê yekê ev peyv jî dibe *hard* bi alfabeya kurdan a bi herfên ereban *هارد* tê nivîsandin. Eynî peyv di almanî de *erde*, di germaniya bilind a kevn de *erda* û di îngilîzî de *earth* tê nivîsandin. Li gor pîvana etîmolojî ya Justî divêt alman û îngilîz jî vê peyvê qed nebe *erda* binivîsin. Dîsa li gor vê nihêrînê divêt zimanên latînî gişk peyvên latînî bi rastnivîsa latînî binivîsin. Wê gavê ewê nivîsa îtalyanî, spanyolî, fransîzî, portekîzî, rûmenî û gelekên din mîna hev be. Xwiyaye meriv her dem nikare rastnivîsa zimanan li gor pîvanên etîmolojiyê diyar bike.

Di *Dictionnaire Kurde-Français* ya Auguste Jaba ya ji aliyê Ferdinand Justî ve hatiye weşandin de gelek peyvên kurdî hene; lê meriv nikare wê tenê wekî ferhengeke kurdî-fransîzî helbisengîne, ew di rastiya xwe de ferhengeke erebî-zimanên îranî-tirkî-ermenî-grekî-rûsî-fransîzî ye. Ji destpêka nivîsandina kurdî heta îro ne vajname ne jî ferhengek kurdî ya ewqasî ji zar û zimanê kurdî dûr nehatiye dîtin û ne jî hatiye bihîstin.

Analîza Foneman

Transkrîpsiyona Auguste Jaba ya di *Recueil de Notices et Récits Kourdes* û *Dictionnaire Kurde-Français* de hev û din nagire. Jaba ji 1857an heta 1860î herfa *ط* ya ebcêda kurdî bi dîgrafa *th*, herfa *ت* jî bi *t* nivîsiye. (Jaba, 1860: 1-7) Heke Ferdinand Justî çawa ku gelek peyvên Jaba û Bazîdî yê bi ebcêda kurdî li gor rastnivîsa erebî û farisî guherandine, transkrîpsiyona wan jî neguherandibe ev tê wê manê ku Jaba piştî demekê di transkrîpsiyona vê herfê de guherîn kiriye. Jaba bi herfa *y* bi piranî dengê /ø/ û di hinek peyvan de jî dengê /j/ nivîsiye.

Jaba di transkrîpsiyona peyvên ebceda kurdî de li gel fonemên Peter Lerch, bi fonemên fransîzan *à, â, é, î, j, v, w, ch, dj, gh, kh, th, ou, au, tch* û fonema almanî *tsch* û diftongên *ài, ài, ei, èi, eu, ia, oi* jî peyv, cumle û îdiyomên kurdî nivîsîne. Hêjahiya van foneman a fonetîk li gor heman rêzê wisa ye: /ɑ:/, /ʔ/, /ɪ:/, /i/, /ɜ/, /w/, /v/, /ʃ/, /dʒ/, /ʁ/ /g/, /χ/, /t/, /u/ /u:/ /ø/, /o/ /o:/, /tʃ/, /ts/, /ai/, /aɪ/ /aj/, /ɛy/, /ɛw/, /ja/, /oj/.

Tablo 12: Bi Alexandre Jaba Fonemên Kurdî

No	Dengdar		ANF	No	Dengder		ANF
1	B	b	/b/	1	A	a	/ɑ/
2	D	d	/d/	2		ā	/ɑ:/
3	F	f	/f/	3		à	/ɑ:/
4	G	g	/g/, /ʁ/	4	E	e	/ɛ/
5	H	h	/h/, /ħ/	5		é	/ɛ/
6	J	j	/ʒ/	6		è	/ɛ/
7	K	k	/k/, /kʰ/	7		ě	/ɛ/, /ø/
8	L	l	/l/, /l̥/	8		ê	/ʔ/
9	M	m	/m/	9	I	i	/i/, /ɪ/
10	N	n	/n/	10		ĩ	/ø/
11	P	p	/p/, /pʰ/	11	O	o	/o/
12	Q	q	/q/	12		ö	/ø/
13	R	r	/r/, /r̥/	13		ü	/ø/
14	S	s	/s/	No	Dîgraf	ANF	
15	T	t	/t/, /tʰ/	1	ou	/ø/, /o/, /u/	
16	V	v	/w/	2	öu	/u/, /ø/	
17	W	w	/v/	3	oū	/u:/	
18	Y	y	/j/, /ø/	4	ch	/ʃ/	
19		ÿ	/ø/	5	dj	/dʒ/	
20	Z	z	/z/	6	gh	/g/	
No	Diftong		ANF	7	ll	/l̥/	
1	ài		/aɪ/	8	kie	/kʰɛ/	
2	aï		/aj/ /ai/	9	kh	/χ/	
3	eöu		/ɛw/	10	ss	/s/	
4	ia		/ija/	11	th	/t/	
No	Trîgraf		AFN				
1	tch		/tʃ/				

1.8 FONEMÊN KURDÎ YÊN SAMUEL AUDLEY RHEA

Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District

Samuel A. Rhea, di salên ku li nav nestûriyan mîsyonerî kiriye de dest bi karê nivîsandina gramer û vajnameya kurdî kiriye. Ev xebata wî ya bi navê *Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District* (Kurteya gramer û vajnameya zimanê kurdî ya welatê Hekariyê) piştî mirina wî, sala 1880î di kovara *Journal of the American Oriental Society* de hatiye weşandin. Weşankaran diyar kirine ku wan bêyî ku tiştekî ji tekstê resen derbixin an lê zêde bikin di warê gramerê de hinekî nivîs rast kirine. (Rhea, 1880)

Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District ji sê beşên sereke pêk tê:

I. Gramer:

1. Rastnivîs: Alfabeya kurdî
2. Artîkel
3. Nav
4. Zemîr
5. Sifet
6. Hejmar
7. Fêl
8. Zerf
9. Edat
10. Konjonksiyon (conjunction)

II. Vajname

III. Nimûne:

1. Ji xwedê re dua.
2. Mesela lawê destberdayî

Analîza Foneman

Nivîsa Samuel A. Rhea ya di beşa gramerê de û ya di vajnameya wî de yekcaran hev û din nagire. Zemîrên *em* û *ez* di beşa gramerê de bi awayekî bi pergala *am* û *az* nivîsiye, lê di vajnameyê de *ãz* û *ãm* nivîsiye. Peyva *erd* di vajnameyê de *ařd* nivîsiye. Çima xalek daniye ser herfa *r* nayê zanîn. Nivîskar herfa *i* ya hinek peyvên xwe û partîklên *bi* û *ji* bi apostrofê *b'* û *zh'* nivîsiye. Dibe ku bi bandora şemala kurt (short form) a îngilîsî ev wisa nivîsîbin; lê ew peyvên din çima wisa nivîsiye nayê zanîn. Di hinek peyvên de nikanibûye /v/ û /w/ ji hev derbixîne. Dengên /k/ û /q/ her du jî bi herfa *k* nivîsiye. Rhea ji bo dengên /ħ/, /q/, /s^h/ û /t/ nişan bide xalek daniye ser herfên *h*, *k*, *s*, *t*. (Rhea, 1880) Lê ne di beşa gramerê ne jî di beşa vajnameyê de bi van herfên ser bi xal peyvên kurdî nenivîsiye.

Nivîskar zemîrê piraniyê ya kesên sisiyan *wan* a fêlên transîtif rast bi kar neaniye. Di demên niha de zemîrê *wan* di şûna zemîrê *ew* de bi kar aniye. Kurdzanê cara pêşîn diftonga dengdar *xwe* bê kêmasî li gor hêjahiya xwe ya fonetîk bi trîgrafa *khwe* rast nivîsiye bê guman Rhea ye. (Rhea, 1880) Ev gramer û vajnameya Samuel A. Rhea mîna gramer û vajnameyên kurdzanên berî xwe di tarîxa gramer û vajnameyên kurdî de xwedî hêjahiyek têra xwe grîng e. Kesên li ser gramer û leksikolojiya kurdî dixebitin dikarin jê gelek sûd bigirin.

Tekstê Resen

Lord's Prayer (Ji xwedê re dua).

Bâb-ê-ma ya b'asmânê, nâwê-ta mokadâs bît ; pādîshâhîyê-ta b'êt ; rizâyê-ta bît, weku l'asmânêya, weto l'ardê zhî , bida-ma avro nân-ê ruzhê ; zh' karêt-ma b'bora, kurang am zhî borîn kardârêt-ma ; u ma na ba l'tijerib, beli ma khûlâs b'ka zh' sherê ; sabab yê taya pādîshâhîtî, u kudset, u jelâl, ebed il ebed: amîn. (Rhea, 1880)

Transkrîpsiyona Tekstê Resen

Lord's Prayer

Babê-me-ye b'esmanê, nawê-te muqedes bît ; padîşahiyê-te b'êt : rizayê-te bît, weku l'esmanêye, weto l'erdê jî, bide-me evro nane rûjê ; ji karêt-me b'bore, kureng em jî borîn kardarêt-me ; û me ne be l'ticerib, beli me xulas bike ji şerê ; sebab yê teye, padişahîtî, û qudset, û celal, ebed il ebed: amîn.

Bi Kurdiya Îro

Lord's Prayer

Babê me yê li esmana, navê te muqedes bit: padîşahiya te bit, weku li esmana li erdê jî evro nanê rojê bide me; li karên me bibore, ku reng e em jî li kardarên xwe biborin; û me bi ti tiştî meceribîne, belê me ji şer xelas bike; sebab padîşahîtî û qudset, û celal ebed el ebed ê te ye: amîn.

Tablo 13: Bi Samuel A. Rhea Fonemên Kurdi

No	Dengdar		AFN	No	Dengder		AFN
1	B	b	/b/	1	A	a	/ε/, /ʔ/, /ɑ/
2	D	d	/d/	2		â	/ɑ/, /ɑ:/
3	F	f	/f/	3		ă	/ʔ/, /ε/, /ɑ/
4	G	g	/g/	4	E	e	/ε/
5	H	h	/h/, /ħ/	5		ē	/ɪ/
6	J	j	/dʒ/	6	I	i	/ø/
7	K	k	/k/, /k'/, /q/	7		ī	/i/
8	L	l	/l/, /ɭ/	8		ï	/i:/
9	M	m	/m/	9	O	o	/o/, /ø/
10	N	n	/n/	10		ō	/o:/, /ø/
11	P	p	/p/, /p'/	11	U	u	/ø/, /u/
12	R	r	/r/, /r/	12		ũ	/ø/, /ɑ/
13		ř	/r/	13		'	/ø/
14	S	s	/s/	No	Diftong		AFN
15	T	t	/t/, /t'/	1	ai		/ai/, /εj/
16	V	v	/v/	2	âī		/a:i/
17	W	w	/w/	3	au		/εw/
18	Y	y	/j/	4	eâ		/εɑ/
19	Z	z	/z/	5	īâ		/iɑ/, /ija/
No	Dîgraf		AFN	6	īy		/ij/
1	ch		/tʃ/	7	ōâ		/øwɑ/
2	gh		/ʁ/	8	uī		/ui/, /wi/
3	kh		/χ/		No	Dîft. dengdar	AFN
4	sh		/ʃ/	1	1	khw	/χw/
5	zh		/ʒ/				

1.9 FONEMÊN KURDÎ YÊN A. HOUTUM-SHCINDLER

Beiträge Zum Kurdischen Wortschatze

Albert Houtum-Schindler sala 1884an berhema xwe ya bi navê *Beiträge Zum Kurdischen Wortschatze* (Kêrhatinên bo gencîna peyvên kurdî) ji kovara *Zeitschrift Der Deutschen Morgenländischen Gesellschaft* nivîsiye û li Leipzigê weşandiye. Houtum-Schindler di beşa “Cumleyan” de cumleyên ji zarên goranî, kelhorî, mukrî, kurmancî hem cihê cihê, hem jî dane ber hev û tercûmeyî almanî kirine. (Houtum-Schindler, 1884) Di beşa dawîn de Ferdinand Justi ji aliyê etîmolojîyê ve analîza peyvvan kiriye. Justi gelek peyvên zar û şêwezarên kurdî bi peyvên ziman û zarên zimanên îranî, ermenî, tirkî, erebî û hd. re dane ber hev. (Houtum-Schindler, 1884)

Ev berhem ji çar beşên sereke pêk tê:

1. Vajname
2. Notên gramere
3. Cumle
4. Etîmolojîya peyvvan

Nivîskar di amadekirina vê berhema xwe de ji *Dictionnaire Kurde-Français* ya M. Auguste Jaba sala 1880yê li St. Petersburgê weşiyayî sûd girtiye. (Houtum-Schindler, 1884)

Analîza Foneman

Peyvên beşa vajnameya Schindler ne li gor rêza alfabetîk a herfên roman; lê li gor rêza alfabetîk a herfên ebcada farisî hatine rêzkirin. Schindler bi awayekî berbiçav daye diyarkirin ku wî ji Ferhenga kurdî-fransîzî ya Auguste Jaba sûd girtiye. Çima peyvên xwe ne li gor ebcada kurdî; lê li gor ebcada farisî rêz kirine û ji ber vê yekê peyvên bi /v/ ya kurdî dest pê dikin hîç yek negirtine vajnameyê nayê zanîn. Peyvên *Dictionnaire-Kurde-Français* ya Alexandre Jaba li gor ebcada kurdî hatine rêzkirin. (Jaba, 1879: 296)

Houtum-Schindler *lam* a stûr a kurmanciya jêr di alfabe ya xwe de nîşan daye, lê di nivîsa xwe de pê nenivîsiye. Ev rastî ji bo dengên di erebî de hene lê di kurdî de tune ne jî wisa ye. Hejmara dengderên nivîskar di alfabe ya xwe de nîşan dane⁵⁴ û yên pê nivîsîne jî hev û din nagirin, di nivîsa wî de dengder zêdetir in. (Houtum-Schindler, 1884)

Houtum-Schindler hinek deng bi herfên cihê nivîsîne. Dengê /ʒ/ bi du dengdaran nivîsiye. Peyva *roj* li hinek cihan *rož* li hinek cihan jî *rož* nivîsiye. Ev tevlihevî di nivîsandina dengdaran de pirtir bala meriv dikişîne. Ji aliyê din ve nivîskar di nivîsandina hinek peyvan de heman dengdar dubare kirine. Peyva *app* ji van yek e. (Houtum-Schindler, 1884)

Tablo 14: Bi Albert Houtum-Schindler Fonemên Kurdî

No	Dengdar		AFN	No	Dengder		AFN
1	B	b	/b/	1	A	a	/ɛ/
2	Č	č	/tʃ/	2		â	/a/, /ɑ:/
3	D	d	/d/	3		á	/ɛ/, /a/
4	F	f	/f/	4	E	e	/ø/
5	G	g	/g/	5		é	/ø/
6	H	h	/h/	6		ê	/i/
7	Ĥ	ĥ	/ħ/	7	I	i	/ø/
8	ǰ	ǰ	/dʒ/	8		í	/i:/,
9	K	k	/k/, /kʰ/	9		î	/i/
10	L	l	/l/	10	O	o	/o/
11	Ļ	ļ	/lʲ/	11		ô	/o/
12	M	m	/m/	12		ó	/o:/
13	N	n	/n/	13	U	u	/ø/
14	P	p	/p/, /pʰ/	14		ü	/u/
15	Q	q	/q/	15		ú	/ø/
16	R	r	/r/, /r/	16		û	/u/, /u:/
17	S	s	/s/	No	Diftong		AFN
18	Š	š	/ʃ/	1	âû		/ɛw/
19	Ş	ş	/sʃ/	2	ûe		/ûw/
20	T	t	/t/, /tʰ/				
21	W	w	/w/, /v/				
22	’	’	/ʔ/				
23	ɣ	ɣ	/ɣ/				
24	χ	χ	/χ/				
25	Y	y	/j/				
26	Z	z	/z/				
27	Ž	ž	/ʒ/				
28	Ž	ž	/ʒ/				

⁵⁴ Ji bo lista fonemên alfabe ya Houtum-Schindler bn. Pêvek 9.1

1.10 FONEMÊN KURDÎ YÊN E. PRYM Û A. SOCIN

Kurdische Sammlungen

Eugen Prym û Albert Socin kitêba xwe ya bi navê *Kurdische Sammlungen* (Berhemên kurdî), sala 1886an pêşkêşî *Académie Impériale Des Sciences* a St. Petersburgê kirine. Kitêb ji du cîldan pêk tê: Cîldê tekstan û cîldê tercûmê. *Kurdische Sammlungen* di 1887an de li St. Petersburgê di nav weşanên *Académie Impériale Des Sciences* de hatiye weşandin. Cîldê tekstan bi 3 rûpelên xwe yên vala û 2 rûpelên xwe yên bê nimro li ser hev 88 rûpel in. Di cîldê tercûmê de berhemên folklorîk ên cîldê tekstan bi almanî hatine tercûmekirin. Ev cîld li ser hev ji 107 rûpelî pêk tê.

Cîldê tekstan ê *Kurdische Sammlungen* ji du beşan pêk tê. Beşa pêşîn *Einleitung* (Destpêk) e. Ev beş 13 rûpel in. Nivîskaran di vê beşê de dengdar û dengderên alfabeya kurdî dane nasandin. Beşa dawîn, beşa bingehîn a kitêbê, ji 70 rûpelî pêk tê. Di vê beşê de 30 tekstên kurdî yên ji nav gel berhevkirî hene. Ev tekst ji 13 çîrokên pexşanî, 3 çîrokên helbestî, 1 çîroka pexşanî û helbestî û 13 stranên pêk tê. Hemî tekstên kurdî yên kitêba Prym û Socin bi zarê kurmancî ne.

Analîza Foneman

E. Prym û A. Socin dengên /h/, /h̄/, /w/ û /ʒ/ her yek bi du dengdaran nivîsîne. Yekcaran heman peyva heman metnî bi du herfên cihê nivîsîne. (Prym, Socin, 1887: 1-3) Dengên /s̄/ û /t/ di çend peyvên de bi herfên cihê nivîsîne (Prym, Socin, 1887: 1-3) Lê bi pirranî ev deng bi dengên /s/ û /t'/ re wekî hev helsegandine, bi herfên s û t nivîsîne. Nivîskaran dengên /ʔ/ û /ʔ'/ jî wekî du dengdarî helsegandine û bi du nîşanên cihê nivîsîne. Di nivîsandina dengderan de bêpergaliyek berbiçav heye. Nivîskaran pircaran heman peyv bi çend dengderên cihê nivîsîne. (Prym, Socin, 1887: 1-78) Prym û Socin gelek dengderên kurt û dirêj di nav xwe de kirine sê beş: dengderên kurt, dengderên kurttir, dengderên kurttirîn; dengderên dirêj, dengderên dirêjtir, dengderên dirêjtirîn. Ji ber vê yekê hejmara dengderan gihîştîye 47an⁵⁵.

⁵⁵ Ji bo fonemên kurdî yên Eugen Prym û Albert Socin û hêjahiya wan a fonetîk a bi pîvanên AFN li tabloya 10an binihêrin

Transkrîpsiyona Tekstê Resen

Ferhat aħa⁵⁶

Carik jîcara rehmîet lidê û-bavê guhdara, yek navê-wî hebû Kulik¹), Kulikê Madanî, aħa bû, hê bê-zewac bû, hukum dekir.

Jinek jixwera ani, guhast, jinê wî qenc-e. Salik di diholê çû, jinê-wî bihemil bû, bû wa:de çê-bibê, jînik mir. Kulik gellik xam hil-degirê, jînik veşardin.

Yek jîgundiê-wî gayê-wî wunda bû. Bû şev, gayê-xwa nedi. Çû nav tirba, lega degerê, tolekek piçûg dî lenav tirba, anî mal. Lemal danî lebin mekabbê, go emê jixwera bixwedî bekin. Subah rabû, kûçik bû zilamek mirî tavl' u-kefane²). Hişt ew roj lecem-xwe. Bû îvarî, dîsa bû kûçik. Rahişt kûçik, bir avêt nav tirba, çi dî? Kurikek degirî letirbê. Çû, got Kulik, go ya aħa, mi 'ecêbeg dî. Go çawa? Go kurikek detirbê degirî. Kulik got heka kurik-a wê bimîne subehê, u-hake tiştig dîtir-e me çi jê-ye?

Man hetta subahi, subah Kulik rabû, mêrig bir, go wera nîşanê-min beda lukuderê degri. Çûn nav tirba, kurik degri. Îbderket letirbê Kulik. Tirb vekirin, dîn kurik lecem diya-xwe lenav kefene. Kefen vekirin, kurik ibiderxistin. Kulik go kurê-min-a. Anî mal, de da'îne, mehê-va dedê u-xwarinê-va dedê. Kurik mezin bû, navê-wî danî Ferhat Aħa. Xwadê 'emir da-ê, mazin bû, kesik newêrê leber rabe.

Kulik mir, ew hukum degerêne, Ferhat Aħa. Welat jê detirsê. Tembîh kir ser welat, heçî qîzeg buxwaze, rojê buguhêzin euwul şev ew dukute û-dedê mêrê-wî, nîşaniê qîza jêra-ye. Welat aħa hev, meclîs başqa jixwera danin, gotin ev şuxul em qebûl nakin, rabin dem herin cem Sultan, em gilî lê bikin. Sultan 'emir da-wa, go herin jînav xwa ibiderêxin, lê 'emrê kuştinê nîne. Hatin yek lê rakirin, juwelêt ibderxistin.

⁵⁶Navê çîrokê di cîldê tekstan da nehatiye nivîsandin, lê di cîldê tercûma almanî da Färhat Aga hatiye nivîsandin.

Çû, bidinyaê ket. Go wa'd lemin ket, az ber hukmê Sultan namînim. Çû welatê şêra, jişêra pirsî, go hûn ber hukmê Sultan-in? Gotin erê. Go kuderê ne ber hukmê Sultan-e? Şêra gotin, go welatê kêça ne ber hukmê Sultan-e, Sultanê-wa heye.

Çû welatê kêça, lebjara Sultan pirsî. Giha bajara Sultan, navê-wî Mîr Zozan-e, lecem Sultan rûnişt xulam. Jinê Sultanê kêça Sittîa-Zîn-e. 'ecêbeg debînê, beroj melbûsê kêça luwa-ye, û-bişev melbûsê kêça jê-dekin, debin helq³). Sultan tambîh çêkir, dellal bişev ba-dekê, kasig bider-nekevê ji mala-xwe, heçî biderkeve u-nobetê bugerê, wê Mîr Zozan daine ser hazoqê, kesik jimala-xwe bider nakeve.

Sittîa-zîn Ferhat Axa heband, wêra çê-dekê bedizî, kasik nizane. Mîr zozan xeberê-wî nîne, gellik Ferhat Axa dehebêne, malê-xwe teslîmê Ferhat Axa dekê. Yek roj Mîr Zozan ibiderket nav baqça⁴), vejeria mal, hat dî Ferhat Axa ser Sittîa-Zîn, nekuşt, xist hapsê⁵). Maya du sal lehapsê. Mîr zozan newêre xeberig bêje Sittîa-Zîn. Sittîa-zîn nan û-xwarin dedê Ferhat Axa lehepsê. Yek roj Sittîa-Zîn got Mîr Zozan, go Ferhat Axa barda. Go ez ber-nadim. Go tu ber-nade, tê poşman bê. Jitirsa-xwe Ferhat Axa berda. Keçê Mîr Zozan heye, go ezê meher bekim le Ferhat Axa. Sittîa zîn qebûl nekir, bedilê-xwa debêje, azê Ferhat Axa bustênim.

Kasik nawêre bişev biderkeve, tembîh-e. Ferhat axa heçî mal keçik qenc tê heye, deçê dukutê. Nobet yek şev Ferhat Axa girt. Got mi berdin. Ber-nedan, rahişt şûr, keşand, pênc jinobetê kuşt. Gilê lê kirin cem Mîr Zozan, nabûrî. Welatê kêça hemû bihîstin, Ferhat Axa fu'lê xerab çê-dekê, gileh lê bû.

Yek şev du hesp jîtaulê biderxist, Sittîa-Zîn suwar kir ser yek, u-eu suwar ser yek, Sittîa-Zîn revand bişev, nizanê rê lekuderê-ye. Hat welatek xweş, şiklê-wa weka însana-ye u-bidavê-xwe deî nakin bişerîb, bidestê-xwe deî dekin, Hakimê-wa jinik-a. Ferhat axa bedlik mêra leSittîa-Zîn danî, çûn lecem Hakim, peya bûn. Hakim jinek qenc-e, dilê Hakim ket Sittîa-Zîn, hesab dekê mêr. Go ez vî mêrî ber-nadim, ezê jxwera çê-bikim mêr. Ferhat axa go nabe, Hakim go debê. 'eraq anîn, vexwarin. Her-sê liyek ode-ne, xera bûnbi'eraq. Hakim û-Sittîa-Zîn razan, Ferhat Axa raza jixwera, luwa dehessise, xewê-wî nayê. Hakim ji Sittîa-Zîn çêtir-e. Hakim got Sittîa-Zîn, raba bimira çêke. Sittîa-zîn rahişt destê Hakim, Leser sînga-xwe danî, dî jinek-a. Hewalê-xwe got Hakim, Hakim got Ferhat Axa. Go libê. Go wera raza jem-ma. Raza nav

her-duwa. Eu şev kêfê Hâkim anî. Hâkim goti-ê, go em her-dû pîroz bin ştera. Rojêg dîmane luwêderê hetta îvarî. Îvarî Hâkim suwar bu lehespê-xwe, û-Sittîa-Zîn suwar bû û-Ferhat Axa suwar bû, bişev revîn.

Hat welatê şêra, newêre beroj herê nav-wa. Şkevdêg dîn ⁶⁾, ketin işkevde eu u-hespê xwe. Devê şikevd girt, hetta şêr razan, suwar bûn, welatê şêra buhurdin.

Hat mala xwe, bakir mella, pişt kutanê lexwe meher ker her-du, û-hukum dîsa dan Ferhat Axa. Du jin işxwera anî, weka-wa nîne. Her-du jin tevda bihemil bûn, xwedê du kurik da-yê, salig dî xwedê du keçig da-ê. Mezin bûn, lemal lev meher kir, xwedê mala-wî zêde kir, bûn şêst nefis. Lemal jihev dizeuwicin, û-Ferhat Axa hukim degerêne. Tu şmira se⁵⁷.

Prym û socin li bin nivîsê, li ser hinek peyvên kurdî yên di çîroka jorîn da derbas dibin bi almanî û kurdî ev notên jêrîn nivîsîne.

1) S. *immer* ku:lik.

2) später tevli û-k^o.

3) P. *meist* q, S. *meist* k.

4) S. bekçe.

5) P. *immer* heps^o, S. *immer*

6) S. *immer* şkeft^o.

Bi Kurdiya Îro

Ferhat Axa

Carik ji caran rehmet li dê û bavê bavên guhdaran. Yekî bi navê Kulik hebû, Kulikê Madanî. Hêj nezewicîbû, hukum dikir.

Jinek ji xwe re anî. Guhest. Jina wî qenc e. Salek di holê re çû, jina wî bi hemil bû. Bû w'ede çê bibe jinik mir. Kulik gelek xem hildigire. Jinik veşartin.

⁵⁷ Ji bo tekstê otantik li Pêvek 9.2 binihêrin.

Gayê gundiyeke wî wenda bû. Bû şev, gayê xwe nedît. Çû nav tirban li ga digere. Li nav tirban tolek piçûk dît, anî mal. Li mal li bin meqebê danî. Got em'ê ji xwe re xwedî bikin. Sibehê rabû, kûçik bûye zilamekî mirî yê bi kefen. Wê rojê li cem xwe hişt. Bû êvar, dîsa bû kûçik. Rahîşt kûçik, bir avêt nav tirban, çi bibîne? Kurikek li tirbê digrî. Çû got Kulik, ya axa, min ecêbek dît. Got çawa? Got, kurikek di tirbê de digrî. Kulik got, heke kurik e ewê bimîne sibehê, û heke tiştêk dîtir e me çi jê ye?

Heta sibehê man. Sibehê Kulik rabû mêrik bir, got were nîşanî min bide li ku derê digrî. Kulik tirb dît. Tirb vekirin. Dîtin kurek li cem diya xwe li nav kefen e. Kefen vekirin, kurik derxistin. Kulik got, kurê min e. Anî mal, de danî, meywe didê û xwarinê didê. Kurik mezin bû. Navê wî danî Ferhat Axa. Xwedê emir dayê. Mezin bû. Kesek newêre li ber rabe.

Kulik mir. Ew hukum degerîne, Ferhat Axa. Welat jê ditirse. Tembîh kir ser welat, heçî qîzekê bixwaze, roja biguhêzin ewil şev ew dikutê û dide mêrê wê. Nîşaniya qîzan jê re ye. Li welêt axan bi hev re ji xwe re meclîsek din danîn. Gotin em vî şuxulî qebûl nakin. Rabin de em herin cem Sultan, em gilî lê bikin. Sultan emir de wan, got herin ji nav xwe bi derêxin, lê emrê kuştinê nîne. Hatin yek lê rakirin, ji welêt biderxistin.

Çû bi dinyayê ket. Got w'ed li min ket, ez ber hukumê Sultan namînim. Çû welatê şêran ji şêran pirsî, got hûn ber hukmê Sultan in? Gotin, erê. Got ku derê ne ber hukmê Sultan e? Şêran gotin, welatê kêçan ne ber hukmê Sultan e, Sultanê wan heye.

Çû welatê kêçan, li bajarê Sultan pirsî. Gihîşt bajarê Sultan. Navê wî Mîr Zozan e. Li cem Sultan rûnişt xulam. Jina Sultan kêça sittiya zîn e. Ecêbekê dibîne, bi roj kincên kêcan li wan in, û bi şev kincên kêçan ji xwe dikin, dibin xelk. Sultan tembîh kir, dellal bi şev bang dike, kesek ji mala xwe dernekeve, heçî derkeve û nobetê bigere, ewê Mîr Zozan dayne ser hazoqê. Kesek ji mala xwe dernakeve.

Sittiya zîn Ferhat Axa heband, bi dizî bi wî re çê dike, kesek nizane. Xebera Mîr Zozan nîn e. Gelekî Ferhat Axa dihebîne, malê xwe teslîmî wî dike. Rojekê Mîr Zozan ji nav baxçe derket, vegeriya mal. Hat dît Ferhat Axa di ser sittiya zîn de ye.

Nekuşt, xist hepsê. du sal li hepsê maye. Mîr zozan newêre ji sittiya zîn re xeberekê bibêje. Sittiya zîn li hepsê nan û xwarin dide Ferhat Axa. Rojekê sittiya zîn ji Mîr Zozan re got Ferhat Axa berde. Got ez bernadim. Got tu bernadî, tuyê poşman bibî. Ji tîrsa xwe Ferhat Axa berda. Keça Mîr Zozan heye, got ezê li Ferhat Axa mar bikim. Sittiya zîn qebûl nekir, bi dilê xwe xwe dibêje ezê Ferhat Axa bistînim.

Kesek newêre bi şev derbikeve, tembîh e. Ferhat Axa heçî mala keçek qenc tê de heye diçê dikutê. şevêkê nobetê Ferhat Axa girt. Got, min berdin. Bernedan, rahişt şûr, kişand, ji nobetê pênc kuştin. Cem Mîr Zozan gilî lê kirin. Pir nebuhurî welatê kêçan hemû bihîstin, Ferhat Axa kirinên xirab dike, gileh lê bû.

Şevêkê du hesp ji tewlê biderxistin, sittiya zîn li yekê suwar kir û ew li yekê suwar bû, bi şev sittiya zîn revand. Nizane rê li ku derê ye. hat welatekî xweş. Şiklên wan weka însanan e. Bi devê xwe deng nakin. Bi xerîb bi destê xwe deng dikin. Hakima wan jinek e. Ferhat Axa bedlekî mêran li sittiya zîn kir, çûn li cem hakimê peya bûn. Hakim jinek qenc e. Dilê hakimê ket sittiya zîn, mêr hesab dike. Got, ez vî mêrî bernadim, ezê ji xwe re bikim mêr. Ferhat Axa got nabe. Hakimê got dibe. Araq anîn vexwarin. Her sê li odeyekê ne. Bi araqê serxweş bûne. Hakim û sittiya zîn razan. Ferhat Axa ji xwe re raza, li wan guhdarî dike, xewa wî nayê. Hakim ji sittiya zîn çêtir e. Hakimê got sittiya zîn rabe bi min re çêke. Sittiya zîn rahişt destê hakimê li ser sînga xwe danî, dît jin e. Hewala xwe ji hakimê re got. Hakimê got, Ferhat Axa. got, libê. Got were razê li cem me. Di nav her duwan de raza. Wê şevê kêfa hakimê anî. Hakimê jê re gotiye, em her du pîroz bin ji te re. Rojek din hetta êvarê li wê derê mane. Êvarê hakim li hespê xwe suwar bû û sittiya zîn suwar bû û Ferhat Axa suwar bû, bi şev revîn.

Hat welatê şêran. Newêrin bi roj herin nav wan. şikeftêk dîtin. Ew û hespên xwe ketin şikeftê. Devê şikeftê girtin. Hetta şêr razan, suwar bûn, ji welatê şêran buhurtin.

Hat mala xwe. Bangî mella kir. piştî kutanê her du li xwe mar kirin û hukum dîsa dan Ferhat Axa. Du jinên ji xwe re anîne weka wan nînin. Her du jin tevda bihemil bûn. xwedê du kur danê. salek din xwedê du keç danê. Mezin bûn. Li mal li

hev mar kirin. Xwedê mala wî şên kir, bûn şêst nefş. Li mal ji hev dizewicin, û Ferhat Axa hukim digerîne. Tu ji min re sax.

Tablo 15: Bi Eugen Prym û Albert Socin Fonemên Kurdfî

No	Dengdar	AFN	No	Dengder	AFN
1	B	/b/	1	a	/ε/, /α/
2	C	/tʃ/	2	á	/ε/
3	D	/d/	3	ā	/α/
4	F	/f/, /v/	4	ā̄	/α:/
5	G	/g/	5	ā̇	/ε/
6	Ġ	/ɣ/	6	ā̈	/ε:/
7	H	/h/	7	ā̉	/a:/
8	ĥ	/h/	8	ā̊	/ε/, /ø/
9	h	/h/	9	e	/ø/, /ε/, /ɪ/
10	ĥ̄	/h/	10	é	/ø/
11	ĥ̇	/χ/	11	e	/ø/
12	J	/dʒ/	12	ē	/ɪ/
13	K	/k/, /kʰ/	13	ē̇	/ɪ:/
14	L	/l/	14	ē̈	/ɪ/
15	M	/m/	15	ē̉	/ɪ/
16	N	/n/	16	i	/i/, /ø/
17	ñ	/n/	17	ī	/i/
18	ñ̄	/n/	18	í	/ø/
19	P	/p/, /pʰ/	19	ī̇	/i:/
20	Q	/q/	20	ī̈	/i/
21	R	/r/	21	ī̉	/i:/
22	S	/s/	22	ī̊	/i/
23	Š	/ʃ/	23	ī̋	/ø/
24	ş	/sʰ/	24	ī̌	/ø:/
25	T	/tʰ/	25	o	/e/
26	ţ	/t/	26	ō	/o/
27	V	/w/	27	ō̇	/o/
28	v	/w/	28	ō̈	/ø/
29	W	/w/	29	ō̉	/e:/, /ø:/
30	Y	/j/	30	ō̊	/e:/
31	Z	/z/	31	ō̋	/o:/
32	Ž	/ʒ/	32	ō̌	/o:/
33	z	/z/	33	ó	/o:/
34	ʻ	ʔ	34	ō̄	/o/
35	ʻ̄	/ʔ/	35	ō̇	/o/
No	Diftong	AFN	36	ō̈	/o:/
1	ā̄ō̄	/ai/	37	u	/e/
2	Ai	/εj/	38	u	/e/
3	ā̄ī̄	/ai/	39	ú	/e:/
4	Au	/εw/	40	ū	/u/
5	Ay	/εj/	41	ū̇	/u:/
6	Īā	/ija/	42	ṻ	/e/
7	ī̄ā̄	/ije/	43	ū̉	/ø/
8	ī̄ē̄	/ijɪ/	44	ū̊	/u/
9	Ya	/je/	45	ū̋	/e:/, /ø/
10	Ye	/jɪ/	46	ū̌	/u:/
	Dift. Dengdar	AFN			
1	hw̄	/χw/			

BEŞ 2

FONEMÊN GEROKAN

2 FONEMÊN GEROKÊN EWRÛPÎ Û AMERÎKÎ

Ji 1787an ta 1887an li ser hev 6 gerokên ewrûpî û amerîkî di vajnameyên gernamên xwe de bi sedan peyvên kurdî nivîsîne û tercûmeyî zimanê xwe kirine. Ji van hinekan bala xwe dane ser folklorê kurdan û ji nav gel stran û helbest berhev kirine, wekî xwe nivîsîne û tercûmeyî zimanê xwe kirine. Piraniya gerokan bi fonemên zimanên xwe yê maderî bi kurdî nivîsîne. Lêbelê meriv ji fonemên wan ên kurdî têdigihê ku hinekên wan ji bo nivîsandina kurdî qîma xwe tenê bi herfên alfaba zimanê xwe neanîne û ji bo rasttir nivîsandina kurdî, bi qasî kurdzanan nebe jî, li çareyan geriyan.

2.1 FONEMÊN KURDÎ YÊN J. ANTON GULDENSTADT

Johann Anton Güldenstädt di cîldê 2an ê gernama xwe ya bi navê *Reisen durch Rußland und im Caucasischen Gebürge* de 228 peyvên kurdî û manên wan ên almanî, fârisî û kazaxî nivîsîne. Dengderên kurt û dirêj bi eynî foneman nivîsîne. (Güldenstädt, 1791: 545-552) Di nivîsandina dengê /ø/ da bêpergalî heye. Güldenstädt bi giranî bi fonemên almanî peyvên kurdî nivîsîne.

Tablo 16: Nimûnên Fonemên Johann Anton Gùldenstàdt

No	Fonem	AFN
1	Ch	/ç/
2	Sch	/ʃ/
3	Sh	/ʒ/, /dʒ/
4	J	/j/
5	F	/v/, /f/
6	Ss	/s/
7	S	/z/
8	H	/h/, /ħ/
9	Tsch	/tʃ/, /ts/

Di berhema Gùldenstàdt a xwedî peyvên kurdî de tesîra edîtorê kitêbê Peter Simon Pallas bi awayekî eşekera xwiya dibe. Meriv dikare bibêje ku Gùldenstàdt hinek peyvên xwe rasterast ji vajnameya *Vajnameya Komparatîva Zimanên Dinyayê* ya Pallas girtiye. Di şûna peyva *kur* de *kuramen*, di şûna peyva *keç* de *keçamen* nivîsiye. Her duyan jî peyvên *kurru* û *bitschuk* şaş tercûme kirine. Her duyan jî cihên peyvên *shinamin* û *meremen* di tercûmê de li nav hev xistine û eynî şaşitî kirine. E. Rödiger di gotara xwe de şaşitiyên Gùldenstàdt anîne zimen û ew rast kirine. (Rödiger, Pott, 1840: 21)

Tablo 17: Bi Almanî, Farisî, Kurdî û Kazaxî Çend Peyvên Gùldenstàdt

Almanî	Farisî	Kurdî	Kazaxî	Rûpel
Sohn	Psar	Kuramen	Ohlan	546
Tochter	Duchtar	Ketschamen	Kîs	547
Kind	Bedsha	Kurru	Ûschach	547
Knabe	Pasar	Bitschûk	Ohlantschich	547
Eheman	Ar	Shinamen	Erîn	547
Ehefrau	San	Meremen	Arwad	547

Tablo 18: Nimûnên Peyvên Gûldenst adt Rast Terc umey  Kurd  Nekirine

Alman�	Kurd�
Sohn	pis ⁵⁸ . Law. Kur
Tochter	Dot. Ke�. Q�z
Kind	Zar
Knabe	Kur
Ehemann	M�r� bi jin
Ehefrau	Jina bi m�r

2.2 FONEM N KURD  Y N J. HEINRICH KLAPROTH

Julius Heinrich Klaproth sala 1808an di berhema xwe ya bi nav  *Kurdisches W rterverzeichnis, Mit Dem Persischen Und K.F. Andern Ver Wandten Sprachen Verglichen Fundgruben Des Orients*, Bd. IV. De ji r pel  312an heta 321an 280 peyv n kurd  niv s ne. Ji van 20 f l, 16 hejmar, 6 zem r n  exs , 4 part kel, 35 sifet   nav hene. (Lerch, 1858: 21) Klaproth peyv n kurd  bi fonem n alman  niv s ne.

Tablo 19: Nim n n Fonem n Julius Heinrich Klaproth

No	Fonem	AFN
1	Ch	/x/
2	Dsch	/dʒ/
3	S	/z/, /s/
4	Ua	/w/
5	Tsch	/tʃ/, /ts/
6	Sch	/ʃ/, /z/
7	W	/v/

⁵⁸Her  iqas piraniya kurdan di  na *pis* da kur an j  law, di  na *dot* da ke  an j  q z dib jin j , ev peyv di rastiya xwe de nay n mana *pis*   *dot*. Mana peyv n pis   dot di ingliz  da *son*   *daughter*, di alman  da *sohn*   *tochter*, di faris  da *piser*   *duxter* e. Ev her du peyv bi kurd  re j  peyv n hempar in. Peyv n kur an j  law   ke  an j  q z di ingliz  da t n mana *boy*   *girl*. Ev her du peyv di kurd  de bi piran  wek  *pismam*   *dotmam* t n gotin. Di gotin n p  yan de *pis n pisan* derbas dibe.

2.3 FONEMÊN KURDÎ YÊN C. JAMES RICH

Claudius James Rich di cîldê pêşîn ê gernama xwe ya bi navê *Narrative of a Residence in Koordistan and on the Site of Ancient Nineveh with Journal of a Voyage down to Tigris to Bagdad and an Account of a Visit to Shirauz and Persepolis* di sala 1936an de bi edîtorîya jina wî ya bî li Londonê hatiye weşandin, li bin navê *Specimens of the Koordish Language in Various Dialects* de peyvên kurmançî, bulbassî, lorî û feylî dane ber hev û tercûmeyî îngilîzî kirine. Ji van peyvan 122 bi kurmançî, 93 bi bulbassî⁵⁹, 88 bi lorî, û 12 bi feylî ne. (Rich, 1936: 394-398) Nivîskar bi giranî bi fonemên îngilîzî peyvên kurdî nivîsîne. Peter Lerch bi berfirehî kêmasiyên fonetîk ên alfabeya Rich anîne zimên. (Lerch, 1858: 22-25)

Tablo 20: Nimûnên Fonemên Claudius James Rich

No	Fonem	AFN
1	A	/ɑ/, /ɛ/, /ɛ:/
2	Aa	/ɑ:/
3	E	/ø/, /ɛ/, /ɪ/
4	Ei	/ɪ/
5	Ea	/i:/
6	Ī	/i/, /ø/
7	Īu	/y:/
8	O	/ø/, /o/, /o:/
9	Oo	/u:/
10	U	/u/, /ø/
11	Ai	/ai/
12	Eo	/iø/
13	Au	/aw/
14	Aoo	/aw/
15	Aou	/aw/
16	Gh	/g/
17	Hh	hh /h/, /ʔ/
18	Kh	/x/
19	Sh	/ʃ/
20	Tch	/tʃ/
21	Zh	/z/

⁵⁹ Peyvên li bin navê *Li Kurdistanê û Bulbassî kurmançî ne*, lêbelê Cl. James Rich ew li bin navê du zarên çihê nivîsîne.

Tablo 21: Çend Peyvên ji Vajnameya Gernama Rich

Îngilîzî	Li Kurdistanê	Bulbassî	Loristan	Feylî	Rûpel
Mother	Dayik, Daya	Dak	Dalik	Dayeh	394
Paternel Uncle	Maam	Mummoo	Ammoo	394
Maternel ditto	Khal	Khaloo	Tata	394
Sister	Khoshk	Khushk	Khoeshk	Khowar	394
Woman, Wife	Zhin	Zhin	Zoona	394
Paternel Aunt	Poor	Mimek	Ketchi	394
Wood	Dar	Tchelek	Heimeh	396
Fire	Aghir	Aghir	Aghir	Tesh	396
Come	Wurra	Boo	Buja	397
Welcome	Bekheirhateh	Khoshhateh	397

2.4 FONEMÊN KURDÎ YÊN KARL KOCH

Karl Heinrich Emil Ludvig Koch di rûpelên 329, 331 û 422-425ên cildê 2an ê gernama xwe ya bi navê *Wanderungen im Oriente während der Jahre 1843 und 1844* de, li bin navê *Reise im Pontischen Gebirge und Türkischen Armenien* sala 1846an li Weimarê weşandiye bi qasî 30 peyvên kurdî, ermenî û tirkî nivîsîne. (Lerch, 1858: 26) Karl Koch bi giranî bi fonemên almanî peyvên kurdî nivîsîne.

Tablo 22: Nimûnên Fonemên Karl Heinrich Emil Ludvig Koch

No	Fonem	AFN
1	Kh	/q/
2	Ch	/χ/
3	Dsch	/dʒ/
4	K	/k/
5	gh	/ʁ/
6	sch	/ʃ/
7	g	/g/
8	tsch	/tʃ/
9	sz, s	/s/
10	z	/s/

2.5 FONEMÊN KURDÎ YÊN A. HENRY LAYARD

Austin Henry Layard di nivîsa xwe ya bi navê *A Description of the Province of Khuzistan* a sala 1846an li Londonê di hejmara 8an a kovara *The Journal of the Royal Geographical Society of London*, di rûpelên 83-84an de hatiye weşandin de ev helbesta bi kurdiya bextiyarî bi du variantan, bi tercûma xwe ya îngilîzî weşandiye.

Helbesta Layard Berhev Kirî û Tercûme Kirî

Ar yekî iporsî aval zêdaurun,

Flomars ser kuchir sardâr Gaurun.

Ar yekî iporsî aval Negîwand

Sad hezâr khanjar telâ beróvar úî stand

Which may be thus translated:

Should any one ask about (the wonders) around

(Answer) Flómars, with the small head, the leaders of the Infidels.

Should any one inquire about Negîwánd,

(Answer) one hundred thousand (men with) golden daggers stood before him.

Or the distich is sometimes thus varied:

Negín kih beburd daurún be daurún,

Filomars ser kuchir sardâr Gaurún

Sed hezâr khanjar telâ beróvar úî stád

Be'amal neh kih ez ráhyesh neyoftád

Who cut Negín around and around?

Filómars with the small head, the leader of the Infidels.

One hundred thousand (men with) golden daggers stood before him.

Lest he sholdd fall from his path. (Lerch, 1858: 27)

A.H. Layard dengderên dirêj ne tê de, bi giranî bi fonemên îngilîzî ev helbesta kurdî nivîsiye. Dengderên dirêj bi herfên *á, é, í, ó, ú* nivîsîne. Dengê /ʔ/ bi apostrofê ' nivîsiye. Zemîrê kesitiyê *wî* bi *ûî* nivîsiye.

2.6 FONEMÊN KURDÎ YÊN MORITZ WAGNER

Moritz Wagner di rûpelê 258an ê cîldê 2an ê gernama xwe ya bi navê *Reise nach Persien und dem Lande der Kurden* a sala 1852an li Leipzigê weşandiye de çarînek ji stranek kurdî weşandiye. Wagner ev çarîna bi kurmancî tenê bi fonemên almanî nenivîsiye, li gel wan heta jê hatî xwestiye dengên kurdî rast binivîse. Ji bo dengên kurdî yên bi fonemên almanî nayên nivîsandin çend fonem çêkirine yan jî ew ji berhemên kurdzanên berî xwe girtine. Nimûne, Wagner jî mîna Jaba dengê /t/ bi fonema th nivîsiye. Wagner ji bo dengê /ø/ binivîse fonemek peyda nekiriye yan jî pêwîstî bi nîşandayîna vî dengî nedîtîyi. (Lerch, 1858: 29)

Tablo 23: Nimûnên fonemên Moritz Wagner

No	Fonem	AFN
1	a	/ɑ/, /ɑ:/, /ɛ/
2	e	/ɛ/, /ɪ:/
3	è	/ɪ:/
4	é	/ɛ/
5	u	/u:/
6	ch	/χ/
7	gh	/g/
8	sch	/ʃ/
9	th	/t/
10	tt	/tʰ/
11	ts	/ts/
12	tsch	/tʃ/

Strana M. Wagner Berhev Kirî û Tercûme Kirî

Ghawra – mn ave thè

Bina michak, darts-chin br-pschthè

Dave mn chala surath-ta kjatté

Natschalnik as bjerdza-ma, bschanda-ma Russettè.

Mein süßes Liebchen dort an dem Brunnen steht,

Von ihrem Busen der Duft der Nelken weht.

Auf ihre Lippen möcht einen Kuss ich drücken,

Sollt' auch der Kreis-Chef mich nach Sibirien schicken.

ENCAM

Di sedsala pêşîn a kurdzaniyê de (1787-1887) li ser hev 11 kesên ewrûpî û amerîkî yên weke Maurizio Garzoni, Giuseppe Campanile û Samuel A. Rhea, August Alexandre Jaba û Aleksander Borejko Chodzko, bi pîvanên filolojiya rojavayî li ser zimanê kurdî xebitîne. Lê sedema hatina wan a Kurdistanê mîsyoneriya dînî an jî dîplomasî û sîyasî ye. Mînak Maurizio Garzoni, Giuseppe Campanile û Samuel A. Rhea keşên dînê xirîstiyaniyê ne. Her weha Aleksander Borejko Chodzko û August Alexandre Jaba diplomat in; Albert Houtum-Schindler bazirgan e. Dema karên xwe yên mîsyoneriyê, dîplomasîyê an jî bazirganîyê kirine ziman, edebiyat û kultura kurdan bala wan kişandiye. Lê di nav wan de çend kesên cuda jî hene. Mînak Peter Simon Pallas zanyar û leksîkograf e. Îlya Nîkolayevîç Berezîn mamostê zimanê tirkî ye, Peter Lerch, Eugen Prym û Albert Socin filolog in.

Ev Kurdzanên wê demê tevde bi berfirehî li ser deng û fonemên kurdî xebitîne. Ji wana bi taybetî Peter Lerch, Eugen Prym û Albert Socin bi awayekî gelek berfireh, bi detayên hûr û kûr li ser dengder û dengdarên kurdî xebitîne. Dema meriv bala xwe dide xebatên van kesan bi hêsanî dibîne ku ji kurdên dema xwe bêtir xwestine gelek dengên kurdî bi fonemên cihê di nivîsandinê de nîşan bidin.

Di nivîsandina zimanên hînd-ewrûpî yên yanzdeh kurdzanên pêşîn de li gel dengdaran gelek dengder jî hene. Bi tesîra deng û fonemên zimanên xwe yên maderî xwestine ji kurdî re jî alfabekek mîna yên zimanên xwe çêbikin. Ji ber vê yekê li gel fonemên dengdarên bingehîn yên kurdî gelek fonemên dengder jî çêkirine. Di zimanên ku bi alfabekek dengdar tên nivîsandin de dîftong hene. Lê di nivîsandinên ku ne xwedî dengder in an jî dengder kêmbin dîftong xwiya nabin. Di zimanên xwedî alfabekek dengdar û dengder de ew jî di nivîsê de tên nîşandayîn. Ji ber vê rastiyê kurdzanên wê demê gelekî giringî dane dîftongên ku di zimanê kurdî de hene. Meriv dikare bibêje ku çend filologên ku li ser leksîkografiya, tarîx û edetên kurdî xebitîne ne tê de, yên din gişkan ji bo nivîsandina kurdî alfabekek dengdar a bi herfên erebî wekî alfabeke ji bo nivîsandina dengên kurdî bêkêr helsegandine.

Bi qasî ku em ji berhemên wan têdigihên ji deh filologên sedsala pêşîn a kurdzaniyê M. Garzoni, P.S. Pallas, I.N. Berezin, G. Campanile, A. B. Chodzko û A. Jaba bi kurdî nizanibûne. Ji bo fonemên kurdî tesbît bikin ketine nav gel û li gel

guhdarî kirine; bi alîkariya tercûmanan bi gundî û bajariyên kurdan re danûstandin kirine. Kesên weke P. Lerch, S.A. Rhea, A.H. Schindler, E. Prym û A. Socin bi vî awayî kurdî hîn bûne. Ji vana Lerch, Prym û Socin li ser fonemên kurdî gelekî bi detay xebitîne.

Kurdzanên vê demê yên karên wan ên rastîn ne filolojî bûye pir caran dengên kurdî, ku di zimanên wan ên maderî de tune bûne, rast nenivîsîne. Nimûne: Garzoni gelek peyvên bi dengê /h/ dest pê dikin şaş nivîsîne: di şûna *heft*, *heşt*, *heftê*, *heştê*, *hezar* da *Ahft*, *Ahst*, *Ahfté*, *Ahsté*, *ahzár* nivîsiye. Pir caran nikarîbûye dengên /x/, /ʃ/, /q/, /h/ ji hev derbixîne. Çimkî ev deng di zimanê wî yê maderî, di îtalyanî de tune ne. Lê dîsa jî hemî dengên kurdî yên ku îro zimanzan û filologên kurdan li ser nivîsandin an nenivîsandina wan minaqeşê dikin, her yek bi fonemekê nîşan dane. Garzoni ev fonem hinek bi herfekê, hinek bi dîgraf û hinek jî bi trîgrafê nivîsîne.

P.S. Pallas jî di gelek peyvên ferhenga xwe ya pîrzimanî de nikarîbûye dengên kurdî ku di almanî û rûsî de tune ne, ji hev derbixîne. Lêbelê wî jî bi qasî M. Garzoni ji bo van her yek dengên kurdî ku bi alfabeya Celadet Alî Bedirxan nayên nivîsandin, fonemek çê kiriye. Mesela ji bo dengê /h/ û /h/ herfek li alfabeya krîlî ya rûsî zêde kiriye. Tenê ji bo dengê /ʒ/ fonem çênekiriye. Bi awayekî bi pergala nebe jî, dengên hişk û nermên (aspirant and nonaspirant) kurdî bi nîşana hişkî û nermiya alfabeya krîlî nîşan dane. Ji awayê tercûma peyvên kurdî yên di ferhenga wî de em bi hêsanî têdigihên ku Pallas bi kurdî nizanibûye. Peyivên kurdî ji devê kesên pê re xebitîne çawa derketine eynî wisa nivîsîne. Tercûma gelek peyvên kurdî vê rastiyê pesend dike. Hema hema di eynî demê de zimanê kurdî ji aliyê du ewrûpiyan ve bi herfên roman û bi herfên krîlî hatiye nivîsandin. Bi gotinek din meriv dikare bibêje ku nivîsandina kurdî ya bi herfên krîlî bi nivîsandina kurdî ya bi herfên roman re di eynî demê de dest pê kiriye.

Îlya Nikolayevîç Berezîn, bi navê xwe yê li ser kitêba xwe *Recherches Sur Les Dialects Persans* ku tê de li ser kurdî jî xebitiye, du şêwezarên kurmançî, kurmançiya Xorasanê û kurmançiya Kurdistanê bi navên *Zarê Kurdiya Rojhilatî û Zarê Kurdiya Rojavayî* bi nav kirine. Meriv dikare bibêje ku cara pêşîn panê pirkirina zarên zimanê kurdî bi Berezîn dest pê kiriye. Çimkî berî wî kesî kesî xebatek weha nekiriye. Lê em ji xebata wî ya li ser kurdî têdigihên ku wî jî bi kurdî nizanibûye.

Li gorî agahîyên ku li ser vê mijarê min bi dest xistin e, Peter Lerch filologê pêşîn e ku li ser her du zarên kurdî, kurmancî û kirmancî (zazakî, dimilî) bi pîvanên filolojiya rojavayî xebitiye. Di warê filolojiya kurdî de meriv nikare wî û kesên berî wî li ser zar û zimanê kurdî xebitîne bide ber hev. Garzoni û Campanile mîsyoner in. Pallas di rastiya xwe de kaşîf û zanyarê sirûştê ye. Berezîn mamostê zimanê tirkî ye. Lêbelê Lerch pisporê zimanên rojhilatî ye. Peter Lerch fonemên kurmancî û zazakî ji ber xwe çenekirine; li gor dengên kurdî ji alfabeza zimanzanî, a zimanzan û misirzan Richard Lepsius neqandine. Alfabeza zimanzanî a Lepsius a wê demê ji bo dengên zimanên dinyayê werin tesbîtkirin xwedî grîngiya alfabeza fonetîk a navnetewî (International Phonetic Alphabet) ya îro ye. Gelek zazacyên dixwazin kirmancan ji kurmanca cihê nîşan bidin dibêjin ku Peter Lerch gotiye zazakî zimanekî cihê ye. Peter Lerch di kitêba xwe de bi awayekî eşkera û berbiçav zazakî (kirmancî) û kurmancî bi navê du zarên kurdî bi nav dike û bi tu awayî negotiye kurmancî û zazakî du zimanên ji hev cihê ne. Peter Lerch kesê pêşîn e ku ji bo hemî dengên bingehînên (dengên manên du peyvan ji hev cihê dîkin) kurdî û ji bo gelek navdengên (allophons) kurdî fonemek peyda kiriye û xwestiye bi van hemiyan her du zarên vî zimanî bê kêmasî binivîse. Mixabin ji ber zanîna xwe ya kurdî ya têrî vî karî nekiriye nikarîbûye vê xwestina dilê xwe di nivîsandina peyvên kurdî de bi awayekî bi pergal nîşan bide. Gelek caran eynî peyv di nav eynî tekstî de yan jî di nav tekstên cihê de bi fonemên dengên nêzîkî hev nivîsîne. Ji bo kesên li ser dengên kurdî û fonemên pê ev deng hatine nivîsandin dixebitin Peter Lerch rêberekî hêja ye.

Alexandre Jaba, Konsolosê ûris ê Erzeromê, bi alîkariya melayên kurdan ên Serhedê, bi taybetî jî bi alîkariyê Mele Mehmûdê Bazîdî gelek berhemên folklorê kurdan berhev kirine, ew berhem tercûmeyî fransîzî û rûsî kirine. Nivîsandina tarîxa edebiyata kurdî ya bi pîvanên rojavayîyan dîsa bi xebata Mele Mehmûdê Bazîdî û Aleksandre Jaba dest pê kiriye. Heta meriv dikane vê bibêje, heke Mele Mehmûdê Bazîdî nebûya ewê Jaba nikaribûya wê xebata hêja ya folklorîk û filolojîk bide hev, ji Akademiya Zanînan Rûsyayê ya li St. Petersburgê re bişîne û Peter Lerch jî li wê derê li ser van xebatan û xebatên konsolosên ûris ên Persiyayê wî karê xwe yê filolojîk ê li ser ziman û edebiyata kurdan ewqas bi rêk û pêk binivîse. Pêwîst e meriv ji bîr neke ku heke Jaba nebûya ewê Mele Mehmûdê Bazîdî jî nebûya.

Giusseppe Campanile, Îlya Nîkolayevîç Berezîn, Alexander Borejko Chodzko, Alexandre Jaba û Samuel Audley Rhea di warê fonemên kurdî de tesbîtek nû nekirine. Campanile strana kurdan a di kitêba xwe de bi giranî fonemên zimanê îtalyanî nivîsiye, dengên di îtalyanî de tune ne jî bi fonemên kurdî yê Garzoni nivîsiye. Berezîn di peydakirina fonemên xwe yê bi kurdî de ji deng û fonemên zimanên pê zanibûye bixwîne û binivîse gişkan îstîfade kiriye, wate ji deng û fonemên rûsî, tirkî, almanî, îngilîzî, fransîzî û erebî îstîfade kiriye. Yanzdeh fonemên xwe yê kurdî ji dîgrafên almanî, fransîzî û îngilîzî neqandine. Berezîn li dengên kurdî yê Garzoni tesbît kirine dengê nû zêde nekiriye. Chodzko jî bi piranî bi fonemên fransîzî bi kurdî nivîsiye. Li ser deng û fonemên wî yê kurdî bandora Berezîn bi awayekî eşkera xwiya dibe. Wî jî dengê kurdî yê nû li yê berî xwe zêde nekirî, tenê hinek deng bi fonemên cihê nivîsiye. Rewşa Jaba jî di vî warî de ne cihê ye. Jaba transkrîpsiyona xwe ya ji ebcada kurdî bi fonemên kurdî yê Peter Lerch kiriye, lê peyvên kurdî yê di nav tercûma fransîzî ya tekstên kurdî de bi piranî bi fonemên zimanê fransîzî nivîsiye. Aliyê van ê hempar ew e ku bi xwe li ser dengên kurdî xebatek fonetîk nekirine. Ji xebatên kesek yan jî kesên berî xwe di astên cihê de îstîfade kirine. Rhea bi piranî bi fonemên îngilîzî bi kurdî nivîsiye. Van her pênc kesan jî mîna yê berî xwe gelekî zêde bala xwe dane ser dengder û dîftongên kurdî. Heta ji destê wan hatiye xwestine dengderên dirêj û kurt rast binivîsin.

Albert Houtum-Schindler ji bo dengê /l/ û dengê /s^s/ jî du fonem çê kirine û bi vî awayî ew deng jî nişan dane. Dengê /s^s/ di kurdî de tune. Fonema di erebî de pê ev deng tê dayîn jî tê de hemî fonemên erebî di ebcada kurdî de hene. Lêbelê ne dengê bîngêhîn ê kurdî ye. Amadekarê alfabeya kurdî ya bi herfên erebî ya îro hîna kurdên başûrî û rojhilatî pê dinivîsin, Îbrahîm Emîn Baldar, di çapa pêşîn a kitêba xwe ya bi navê *Elfûbêy Niwê* de dibêje pêwîst e kurd peyvên ji erebî ketine kurdî û xwedî dengên di kurdî de nînin wekî xwe binivîsin, wate fonemên erebî li gor telafûza kurdî neguherînin. Ferdinand Justî jî, ji ber ku peyvên ji erebî û farisî ketine kurdî li gor telafûza kurdî bi fonemên ji yê erebî û farisî cihê nivîsiye Alexandre Jaba û Melê Kurd (Mele Mehmûdê Bazîdî) bi nezaniya etîmolojîyê tewanbar kirine. Ferdinand Justî di pêşgotina Ferhenga Fransîzî-Kurdî ya Alexandre Jaba de van ramanên xwe bi berfirehî tîne zimên. Mesela faris peyvên erebî yê di zimanê xwe de mîna ereban dinivîsin, naguherînin.

Kurdzanê pêşîn Maurizio Garzoni ne tê de, ji deh kurdzanên sed sala pêşîn a kurdzaniyê yê ku ji xebatên kurdzanek yan jî çend kurdzanên berî xwe îstîfade nekiribe tune. Eugen Prym û Albert Socin ji dengên kurdî yê ji alî Lerch ve hatine tesbît kirin gelek îstîfade kirine, hinek fonemên wî yê dengdar guherandine, hinek jî ji bo hêsantir binivîsin sade kirine; lêbelê fonemên wî yê dengdar parastine û gelek jî wan bi xwe lê zêde kirine. Wan jî mîna pêşengê xwe Peter Lerch nikaribûne bi hemî fonemên xwe bi awayekî bi pergal peyvên kurdî binivîsin. Aliyekî hemparê kurdzanên vê demê jî ew e ku her çiqas xwestine bi awayekî bê kêmasî peyvên kurdî bi hemî dengên xwe binivîsîn jî qed yekî jî nikaribûye di vî warî de bigihê mirazê xwe. Prym û Socin jî eynî peyv yek caran di eynî rûpelî de yek caran di rûpelekî din de bi fonemên cihê yê nêzîkî hev nivîsîne.

Di zimanê kurdî de 45 dengên bingehîn hene. Di alfabeya kurdî ya bi herfên roman a Celadet Bedirxan de 32 fonem, di alfabeya kurdî ya krîl de 40 fonem, hene. Niha jî em binihêrîn kîjan kurdzanê ewrûpî û amerîkî di sed salên pêşîn ên kurdzaniyê de bi çend fonemên ji herfên roman û krîl bi kurdî nivîsîne: Maurizio Garzoni bi 47, Peter Simon Pallas bi 44, Giuseppe Campanile bi 33, Îlya Nîkolayevîç Berezîn bi 36, Peter Lerch bi 60, Alexander Chodzko bi 39, Alexandre Jaba bi 44, Samuel Audley Rhea bi 38, Albert Houtum-Schindler bi 44, Eugen Prym û Albert Socin bi 81 fonemî bi kurdî nivîsîne. Hêjayî gotinê ye kitêba Campanile berhemek li ser ziman û edebiyata kurdî nîne, li ser tarîx, dîn û edetên kurdan e.

Ji 1787an ta 1887an li ser hev 6 gerokên ewrûpî û amerîkî di gernamên xwe de cih dane peyv, cumle û helbestên kurdî. Her şeş gerokî jî bi piranî bi fonemên zimanên xwe yê maderî bi kurdî nivîsîne. Ji van şeş gerokan Johann Anton Güldenstädt fonemek, Karl Heinrich Koch 3 fonem, Claudius James Rich 5 fonem, Austen Henry Layard 6 fonem, Moritz Wagner 6 fonem ji bo nivîsandina kurdî li fonemên zimanên xwe yê maderî zêde kirine. Julius Heinrich Klaproth tenê bi fonemên almanî bi kurdî nivîsiye. Di nav van şeş gerokan de yê ku herî zêde xwestiye dengdarên kurdî rast binivîse Wagner e. Tenê wî du dengdarên nerm ên kurdî /t/ û /ts/ bi fonemên cihê bi *th* û *ts* nivîsîne. Meriv dikare bibêje ku Wagner li gor gerokên din ên wê sed salê xwestiye dengên kurdî rasttir binivîse.

Hêjayî diyarkirinê ye ku ji yanzdeh kurdzan û şeş gerokên sed sala pêşîn a kurdzaniyê qed yekî jî edatên zarê kurmancî *da* û *ra* bi *de* û *re* nenivîsîne.

Zimanzan û filologên kurdan yê ku hîna dibêjin, rastnivîs û alfabeya Celadet Alî Bedirxan ji alfabe û rastnivîsên din ên kurdî çêtir in, bi alfaba wî hemî fonemên kurdî tînin nivîsandin, kêmasiyek wê tune; dengên /ʔ/, /ɸ/, /ħ/ ne fonem in, /ts/, /k/, /p/, /t/, /r/, /l/ ne fonem in, navdeng (allophon) in, bi fonemên cihê nivîsandina hemî dengderên dirêj û kurt rast nine, pêwîst e hinekî li ser rastî û nerastiya ramanên xwe bifikirin; yan ev kurdzanên ji 130 sal heta 230 sal berê bi kurdî nivîsîne hemî şaş in yan jî ew şaş in. Çimkî ne mimkûn e her du alî jî rast bin.

ÇAVKANÎ

Adelung, F. (1815). *Catherinens der Grossen Verdienste um die Vergleichende Sprachenkunde*. St. Petersburg: Russisch-Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften.

Bayrak, M. (1994). *Açık-Gizli Resmi-Gayr-ı Resmi Kürdoloji Belgeleri*. Ankara: Ozge yayinlari.

Bedir-Xan, C.A. (1932) Elfabêya Qurdî, *Hawar*, Şam. 1, 2, 3, 4, 3-4; 5-6; 3-4; 4.

Bela, B., Edwards, D.D. (1851). Note on the Kurdish Language. *Journal of the American Oriental Society*, New York, London, Paris. 2, 120-123.

Berésine, E. (1853). *Recherches sur les Dialectes Persans*. Casan: Imprimerie de l'Université.

Bin Wahshih, Ahmad bin Abubekr. (856). *Şewq el Musheham fi Rumûz el Eqlam*. Şam: Destnivîs. Translated from Arabic into English by Joseph Hammer as *Ancient Alphabets and Hieroglyphic Characters Explained; with an Account of Egyptian Priests, their Classes, Initiation and Sacrifices* and reprinted in London 1806

Boyîk, E. (2012). *Çanda Kurdên Sovêtê*, Stenbol: Weşanên Deng.

Campanile, G. (1818). *Histoire du Kurdistan* traduit de l'italien par Thomas Bois (1953) 'Avant-propos de Traducteur' 1962. (2004). *Etudes Kurdes*, Paris. Hors série 1, 1-140.

Campanile, G. (1818). *Storia della Regione del Kurdistan e delle Sette di Religione ivi Esistenti*. Napoli: Dalla Stamperia de' Fratelli Fernandes.

Chodzko, A. (1857). Etudes Philologiques sur la Langue Kurde (Dialecte de Soléimanié). *Journal Asiatique*, Cinquième série, Paris. 9, 297-356.

Clément, M. A. (1866). Excursion dans le Kourdistan Ottoman Méridional de Kerkout à Ravandouz, *Le Globe*, Genève. 5, 184-295.

Daniels, Peter T., Bright, William. (1996). *The World's Writing Systems*, New York, Oxford: Oxford University Press

De Saint-Elie, A-M. (1911). La Découverte Récente des Deux Livres Sacrées des Yézidis, *Anthropos*, Wien. 6, 1-39

Fossum, L. O. (1919). *A Practical Kurdish Grammar*, Minneapolis: The inter-Syndical Ev. Lutheran Orient-Mission Society.

Garzoni, M. (1787). *Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda*. Roma: Nella Stamperia della Sacra Congregazione di Propaganda Fide.

Grevisse, M. (1997). *Le Bon Usage Grammaire française*. Refondue par André Goose. 13^e édition, 4^e tirage, Paris: Edition Duculot.

Güldenstädt, J.A. (1791). *Reisen durch Rußland und im Caucasischen Gebürge*. Theil II, St. Petersburg: Russisch-Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften.

Houtum-Schindler, A. (1884). Beiträge zum Kurdischen Wortschatze, *Zeitschrift der Deutschen Morgenländischen Gesellschaft*, Leipzig. 38, 43-155

Jaba, A. (1859). Ballade Kurde. *Journal Asiatique*, Cinquième série, Paris. 14, 153-166.

Jaba, A. (1860). *Recueil de Notices et Récits Kourdes Servant à la Connaissance de la Langue, de la Littérature et des Tribus du Kourdistan*. St. Pétersbourg: Imprimerie de l'Académie Impériale des sciences.

Jaba, A. (1879). *Dictionnaire Kurde-Français*. St. Pétersbourg: Imprimerie de l'Académie Impériale des sciences.

Justi, F. (1873). *Über die Kurdischen Spiranten*. Marburg.

Justi, F. (1878). Les Noms d'Animaux en Kurde. *Revue de Linguistique et de Philologie Comparée*, Paris. 11, 1-32..

Justi, F. (1880). *Kurdische Grammatik*. St. Petersburg: Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften.

Koch, K. (1846) *Wanderungen im Oriente Während der Jahre 1843-1844*. Bd. 2, Weimar.

Kurij, S. (2014). Xebatê Peter J. A. Lerch Derheqî Kurdolojî de. *Nûbihar Akademî Stenbol*. 1: 93-108

Lazo. (1921). *Şems*, Ecmiadzin

Lepsius, C. R. (1863). Standard Alphabet for Reducing Unwritten Languages and Foreign Graphic Systems to a Uniform Orthography in European Letters. 2nd edition. London, Berlin: The Church Missionary Society.

Lerch, P. (1857). *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaläer. Erste Abtheilung*. St. Petersburg: Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften.

Lerch, P. (1858). *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaläer. Zweite Abtheilung*. St. Petersburg: Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften.

Makas, H. (1900). *Kurdische Studien I. Ein Probe des Dialektes von Diarbekir 2. Ein Gedicht aus Gawar 3. Jezidengebete*, Heidelberg: Carl Winter's Universitätsbuchhandlung.

Malmîsanij. (1996). *Kird, Kirmanc, Dimilî ya da Zaza Kürtleri*, Istanbul: Deng yayınları.

March, D. W. (1869). *The Tennessean in Persia and Koordistan*, Philadelphia

Marogulov, I. û Şemo, E. (1929). *Xə Xə Hinbuna Xəndəna Nvisara Kırmançi*, Revan: Neşrê Dewletê Şêwrê Ermenîstanê.

Marogulov, I., Drambján, R. (1931). *Ronai Kteba Elşfbaja Kırmançi*, Revan: Neşîreta Hukmetê.

Nikitine, B. (1932). Oû en est la Kurdologie?, *Annali del Real Istituto Orientale Del Napoli*, fasc. 1, 1936. Napoli.

Nikitine, B. Shamdînân, In *Encyclopédie de l'Isam* (Vol. 4, 315). Ragihandin: Mirella Galetti. (2006). *Kurdistan and Its Christians*, World Kurdish Congress, Irbil, 6-9 September.

Pallas, P.S. (1789). *Linguarum Totius Orbis Vocabularia Comparativa Augustissimae Cura Collecta Sectionis Primae Linguae Europae et Asiae complexae Pars Secunda*. Petropoli: Typis Iohannis Caroli Schnoor

Prym, E., Socin, A. (1887). *Kurdische Sammlungen, Erste Abteilung a. Die Texte*. St. Pétersbourg: Imprimerie de l'Académie Impériale des sciences.

Prym, E., Socin, A. (1887). *Kurdische Sammlungen, Erste Abteilung b. Übersetzung*. St. Pétersbourg: Académie Impériale des sciences.

Rhea, S. A. (1880). Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District, *Journal of the American Oriental Society*, 10: 118-155.

Rich, C. J. (1836). *Narrative of a Residence in Koordistan and on the Site of Ancient Nineveh with Journal of a Voyage down to Tigris to Bagdad and an Account of a Visit to Shirauz and Persepolis*, Edited by his Widow. Two volumes, London: W. Clowes and Sons.

Rödiger, E. und Pott, A. F. (1840). *Kurdische Studien. I. Allgemeine Ansicht der kurdischen Sprache, Statistik und Litterature. II. Lautlehre, Zeitschrift für die Kunde des Morgenlandes herausgegeben*, Göttingen. 3, 1-63.

Socin, A. (1890). *Kurdische Sammlungen, Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tûr Âbdîn und von Bohtan, a. Die Texte, Zweite Abteilung*, St. Petersburg: Académie Impériale des sciences.

Şamilov, Ə'. (1935). *Şıvane Kyrmança*, Rəwan: Nəşra Hykymate.

Van Bruinessen, M. (2014). *Kurdish Studies in Western and Central Europe, Wiener Jahrbuch für Kurdische Studien*, Wien. 2, 18-96.

Wagner, M. (1856). *Travels in Persia, Georgia and Koordistan*. Translated from German by M. Wagner. In three volumes. London.

Walrawens, H. (1999). *Julius Klaproth (1783–1835). Leben und Werk*. Wiesbaden: Harrassowitz.

Лерх, П. И. (1857). *Исследования об иранских курдах и ихь предкахъ съверныхъ халдеяхъ*, Санкт-Петербург

Паллас, П. С. (1787). *Сравнительные словари всех языков и наречий, собранные десницею все высочайшей особы. Отделение первое, содержащее в себе европейские и азиатские языки Ч.1.* Санкт Петербург

PÊVEK

1. MAURIZIO GARZONI

14 GRAMMATICA ALPHABETUM PERSICUM

Latinum .			Persicum .		
باخا فرائی لائین			باخا فارسی		
1	A a	alif	ا	الیف	۱
2	B b	bc	ب	بے	۲
3	P p		پ	پے	۳
4	T t	te	ت	تے	۴
5	Ť ť	ťc	ث	ثے	۵
6	G g	gim	ج	جیم	۶
7	Ĝ ĝ	ĝc	چ	چے	۷
8	Ĥ ĥ	ĥc	ح	حے	۸
9	X x	x̄c	خ	خے	۹
10	D d	dal	د	دال	۱۰
11	Ď ě	ďal	ذ	ذال	۱۱
12	R r	re	ر	رے	۱۲

Latinum .	Persicum .
13 Żż zz ze ze	۱۳ ز ره
14 Żż ż ż żc żc	۱۴ ژ ره
15 S f sin	۱۵ س سین
16 X x xin	۱۶ ش شین
17 Ṡ ṡ sad	۱۷ ص صاد
18 Ṡ ṡ ṡad	۱۸ ض ضاد
19 Ṫ ṫ ta	۱۹ ط طا
20 Ṫ ṫ ṫa	۲۰ ظ ظا
21 E a ain	۲۱ ع عین
22 G g gain	۲۲ غ غین
23 F f fe	۲۳ ف فه
24 Q̇ q̇ q̇af	۲۴ ق قاف
25 K k kaf	۲۵ ک کاف
26 K̇ k̇ kaf	۲۶ کث کثاف

16

GRAMMATICA

Latinum.

Perficum.

27 L l lam

۲۷ ل لام

28 M m mim

۲۸ م میم

29 N n nun

۲۹ ن نون

30 h b hc

۳۰ ه هـ

31 V u vau

۳۱ و و طو

lamalif la

لام الیف لا

32 I i ic

۳۲ ی یه

1.1. Alfabeya translîterasyon û transkrîpsiyona farisî û latînî

DISCORSO

AHHKAFTINA

TRA DUE SIGNORI
MAOMETTANI

BE'IN DV AGĦA'
MUSULMA'N

Ismaele, e Mustafà

Ismael, u Mustafà.

Ism. Pace a te.

Ism. Salám āleik

Must. A te pace, e misericordia di Dio.

Must. Āléik salám, u rahhmét Allah

Ism. Buon giorno. Come stai?

Ism. Sabahh 'l Ker. Keifàta ciàva.

Must. Grazie a Dio bene. Tu come?

